# *FELSEFEYA DÎROKÊ*

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

.
.
.

**FELSEFEYA DÎROKÊ**
Weşanên SORAN e
.
2017-berlin
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-945956-01-4

.

.

**Li ser felsefeya dîrokê**

Li ser dîrokê nivîsandin wê, weke mijareka pirr zêde wê giring bê. Mirov çawa dinivîsênê, çi nivîsênê û her wusa wê çawa wê werênê li ser ziman û hwd, wê weke mijarna ku wê di vê çerçoveyê de wê di destpêkê de wê, xwe bide dîyarkirin bin. Weke van mijaran wê gelek mijarên ku mirov li ser wan bihizirê û wan fahm bike wê, hebin. Piştî nivîsandin hat kifşkirin û pêşket û pê de wê, weke mijareka nivîsendinê wê ev rewş wê xwe bidina nîşandin. Mirov çi dinivîsênê? Ew wê weke mijareka nivîsandî wê hebê. Têkiliya tişta ku ew hatî nivîsandin bi jîyanê re wê, çawa wê were danîn. Mirov dikarê wê weke wê di heman rengê de wê bibînê û wê werênê li ser ziman? Bêgûman wê weke van wê gelek pirs û mijarên ku wê di nava hevdû de û di zikhevdû de wê bi babeta nivîsandinê ve girêdayî wê hebin ku mirov li ser wan bisekinê.

Mijarên nivîsandinê wê weke mijarna ku mirov wan wê, weke ku wê li ser têgîna felsefeyê re wê werênê li ser ziman wê, li ahenga wê ya bi nivîsandinê re wê li wê bigerihê. Di nava wê rengê ahanglêgerînê de wê rewşên weke şibendinê, wekhevîyê bi ya nivîsandî û rewşa jîyanî ku ew heya û hwd, wê ew li wan wê were lêgerîn. Piştî ku nivîsandin pêşket û pê de wê, mijara têkiliya di nava ya nivîsandî û ya jîyanî ku ew heya de wê, weke mijarek sereka wê were hildan li dest bê. Wê weke mijareka têgînî a felsefeyê jî wê werê hildan li dest. Mirov, ya ku ew nivîsand wê, çendî ew bi awayekî safî û zelal wê weke ya ku ew di jîyanê de bi jîyanî û kirinî û ankû piretîkî û heya re wê weke hevdû bê. Wê çawa wê karibê wê hevdû wê werênê li ser ziman.  Mijara bi nivîsandinê hanîna li ser ziman wê, di vê çerçoveyê de wê weke ku mirov bi mijar û niqaşên felsefîkî re wê kifş dike wê, hertmî ew ew pirsgirêka rast û ankû li gorî ya ku ew heya di jîyanê de ku ew were hanîn li ser ziman bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê ev wê weke mijarekê wê xwe bide dîyarkirin.

Mijara wekehevdû hanîna li ser ziman a ya nivîsandî û ya jîyanî û ankû hebûnî wê, di vê çerçoveyê de wê weke mijareka rêbazê û ankû ´metodolojiyê´ û hwd bê. Rêbaz û ankû metodolojî wê, di rewşa nêzîkatîyê de wê were li ser ziman. Dema ku mirov vê bi têgîna dîrokê re wê hilde li dest wê, hingî wê bi **têgînî wê** bi fahmkirin û şîroveya dîrokê de wê were li ser ziman. Weke ku me kirîya navê mijar û xabata xwe jî wê bi felsefeya dîrokê re wê, wê bi şîrove û fahmkirina pêşveçûnên dîrokî re bê. Di vê

çerçoveyê de wê, bi derketina felsefeyê û hwd re wê mijare rêbazê(metodoloji) wê xwe bide nîşandin. Wê di vê çerçoveyê de wê, nêzîkatî wê çawa bê û wê çawa wê rast bê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê ev wê weke mijarna wê werê li ser ziman. Li vir, wusa tê dîtin ku wê bi rêbazê re wê giring bê ku mirov wê çawa wê dihênê li ser ziman bê.

Rêbaz, wê di rewşa nivîsandinê de wê weke aliyekî giring ê nêzîkatîyî bê. Di dema ku mirov wê, dihênê li ser ziman wê, çawa wê werênê li ser ziman wê, reng û çerçoveya wê, bi xwe re wê bide nîşandin. Nivîsandin wê, di serî de wê weke mijareka ku wê, di vê çerçoveyê de wê di nava dûalîteya rewşa nivîsandina wê rewşê û ew bixwe de wê xwediyê rengekî bê. Li vir, dema ku mirov bahse nivîsandinê dike, wê di serî de wê rewşa razberîya têgînîya rewşî wê were li holê. Mirov, dema ku bahse rewşa têgînê dikê bi nivîsandinê re wê, di serî de wê weke aliyekî razber jî wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, rewşa jîyanî a ku ew hertimî di pêvajoyek gûharînî de ya wê, çawa wê karibê wê di rewşa nivîsandinê û ya(tişta) ku ew hatîya nivîsandin de wê weke hevdû bê. Li vir, wê rewşa nivîsandinê wê, di vê çerçoveyê de wê weke aliyekê wê xwe bide dîyarkirin. Lê bi wê re jî mirov dikarê wê di vê çerçoveyê de wê werênê li ser ziman ku wê rewşa hanîna li ser ziman jî wê, ew wê weke rewşek têgînî bê. Rewşa hanîna li ser ziman wê, weke bi gotinkirina rewşê û hanîna wê ya bi wê gotinkirinê a li ser ziman re bê. Rewşa nivîsandinê wê, weke rewşek hişmendî a li ser afirandin dagerên nivîsînê re wê xwe bi awayekî di çerçoveya hanîna li ser ziman de wê bide dîyarkirin. Di rewşa hanîna li ser ziman de wê, ev wê xwe bide dîyarkirin.

Rewşa nivîsandinê, wê bi têkilîya a nava dagerên weke bi gotinî û rewşa jîyanî de ku ew têkiliya wan li ser hiş re wê were danîn bê. Piştî ku nivîsandin pêşket û pê de wê, di vê çerçoveyê de wê weke rewşek teybet wê xwe bide dîyarkirin. Di rengên nivîsandinê de wê, weke jiçavkanîyê nivîsandin, bi meşandina aqil re nivîsandin û bi aqilê felsefeyê û ji wê sûdgirtinê re nivîsandina dîrokê pêş dikevê. Di çerçoveya jîyane civakê de wê kirin, serborî û rewşên wê yên ku ew jîyan dike û ankû jîyankirina wan hanîna li ser ziman bê. Mirovê weke dîroknivîs û ankû dîrokzan ku ew dinvîsênê, şert û mercên ku ew di wê de mazin bûya, rewşa gîyanî û ankû rûhî wê xwe di rewşa pênûsa wî û nivîsandina wî de jî wê bide dîyarkirin. Di rewşa dem(zaman) û cîwar(mekanê)ê de wê, ya ku wê salixkirinê di wê de wê bide çêkirin wê, tiştên ku ew hena, rewşên ku ew dibin û bûyînên ku ew dibin bin.Bi vê re wê, ew dem û cîwar jî wê hebê. Dem û cîwar, wê her tişt wê di nava wan de wê rûbide. Wê bibê. Di vê çerçoveyê de wê

weke aliyekî ku mirov wê bi teybetî wê hilde li dest wê dem û ciwar wê, weke aliyekî giring ê ku mirov wê hilde li dest bê.Di rewşa rûdayînê de wê, her tişta ku ew rûda wê, di demekê de bê. Salixkirina wê tiştê wê, bi xwe re wê, hinekî jî wê salixkirina wê rewşa demî û ciwarî jî bê. Di vê çerçoveyê de wê, tişt dibê û rewşa ku ew rûdide wê, weke aliyekî giring ê bi xwe bixwe re jî bê. Wê ji du aliyan ve wê salixkirinê wê bi xwe re wê bikê. Aliyê pêşî wê bi hebûna xwe bi xwe re bê. Aliyê duyem jî wê bi hebûna wê dema ku ew di wê de bûya û ciwarê ku ew di wê de bûya re wê, ew bibê bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa demê û cîwarîyê wê di vê çerçoveyê de wê weke aliyekî giring ê ku mirov wê hilde li dest bê. Di çerçoveya têgîna dîrokê de wê, di çerçoveya hanîna li ser ziman de wê, xosletên xwe wê biafirênê. Her wusa xosletên têgîna dîrok wê, weke bi nerîn, rêbaz û hwd re wê, xwe bide dîyarkirin. Nivîsandin wê, yek ji amûrên dîrokê ên bi wê xwe afirandinê jî bê. Hizirkirina bi dîrokê re wê, di vê çerçoveyê de wê weke rewşek têgînî, têgihiştinî û zanînî a afrîner jî bê. Bi nivîsandinê re wê rewşa têgînîya rewşê wê biafirê. Li vir, ew rewşa ku ew ji wê hat nivîsandin û ankû ew bi nivîsandin bû û pê de wê, piştre wê gûharîn wê di wê de wê, bibê û wê bi demê re wê rewşek nû a darêjkî wê bi xwe re wê bistênê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê weke aliyekî giring bê ku mirov wê bi teybetî fahm bike bê.

Nivîsandin wê, weke têgînna bê. Rastîya nivîsandinê wê bi aqil, xêv û hêza xiyalkirina mirov re wê pêşbikeve û wê hebê. Weke ku mirov bi demê re dibînê û kifş dike wê, her dem wê li gorî ast û radaya wê pêşketî wê, xwediyê rengê nivîsandîya xwe ya dîrokî bê. Dîroka demên berî şariştanî ên civakî, dîroka destpêka şariştanîyê, dîroka pêşketina olê, dîroka aqil, dîroka felsefeyê, dîroka dema aqil, dîroka dema kevnera, dîroka demên navîn û hwd, wê her dem wê bi rengê xwe re wê xwediyê dîroka xwe ya ku ew li gorî rastîya wê were dîtin, fahmkrin û nivîsandin bê. Her dem wê çendî ku wê bi ast û rada xwe re wê xwedîyê rengê pêşketina xwe ya ku ew wê bi wê re wê werê li ser ziman bê wê, bi heman rengê wê weke rastiyekê wê ew xosletên wê yên demkî wê çerçoveya wê rastîya wê jî bin. Her wusa wê li ser dagerên dengî ên yên ku wan dengan dihênina li ser ziman re wê, werê li ser ziman. Pêşî wê ew dager wê bi demê re wê hevbeş bibin. Wê bi wê re wê, nivîsandin wê, weke aliyekî wê, di jîyanê de wê weke rewşek giştî a civakî wê di destpêka xwe de wê pêşbikeve. Li ser wê re jî wê, piştre wê li ser têgînên wê yên ku ew dihên hanîn li ser ziman re

wê êdî wê werê hizirkirin. Hizirkirina ku mirov wê, bi teybetî wê werênê li ser ziman wê, weke têgînna wê were li ser ziman. Bi wê re wê, hizirkirin wê xwe bide dîyarkirin. Di rewşa hizirkirinê de wê, pirr zêde wê ya ku wê werê li ser ziman wê dîtina mirov bê. Dîtin wê, weke aliyekî giring ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê were li ser ziman. Her tişta ku mirov, ew hanî li ser ziman wê, weke rewşna nerîna mirov jî wê werê li ser ziman.

Di nava nerînê û dîtinê de wê, rewşa razberkirina bi têgînî wê hebê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê rewşa nerînê a ji dîtinê wê, weke rewşeka têgînî a ku mirov wê di serî de wê hilde li dest û fahm bike bê. Fahmkirina wê, wê bi wê re wê weke aliyekî giring bê. Di nava rewşên jîyanî de wê, hertimî wê rewşa hanîna li ser ziman wê, weke nerîneka bi dîtinî wê xwe bide hanîn li ser ziman.

Nerîna ji dîtinê mirov dema ku ew hanî li ser ziman wê, bi wê re wê ev jî wê weke aliyekî giring wê xwe bide dîyarkirin û salixkirin ku wê tişta ku ew heya û ankû bûya û yan jî ku wê rûdaya mirov wê dihênê li ser ziman. Bi gotineka din mirov wê, weke li ser têgîna ´mejûyê´ re wê dihênê li ser ziman. *Mejû* wê, di demê de wê jîyankirin û bûyîna di demên bûhûrî de jî bê. Ev jî wê weke mejû bê. Dema ku mirov, têgînek bi gotina *´mejûyê´* re hanî li ser ziman wê, hingî wê di farqe wê de wê ew wê bê ku mirov tiştekî di *dema bûhûrî* de wê dihênê li ser ziman. Di kurdî de gotina mejû wê, weke gotineka ku wê temen û koka wê, li ser rewşa ya ku *ji mej ve hatî dîtin* bê. Di têgîna morfolojikî de wê têgîn a*´ji mêjê ve´* wê, weke têgîna hîmî û ankû bigihînî a gotina mejûyê bê. Her wusa dema ku mirov got ´ji mêr ve´ mirov wê hingî wê qastî tiştekî dembûhûrî bê. Ji mej vê´ wê, weke rewş û têgînekê bê di gotina mejûyê de. Wê bi wê re wê weke rewşek têgînî wê were li ser ziman. Gotina *mejûyê*, wê weke gotina rewşa demên bûhûrî n ku ew hatina jîyankirin bê. *Tiştekî ku ew ji mej ve ew hatîya jîyankirin* û hwd, wê ew were qastkirin. Gotina *´mejûyê´* wê di vê çerçoveyê de wê weke gotineka hîmî a têgînî bê. Gotina mejûyê wê, di vê çerçoveyê de wê bi wateya ku ew li wê hatîya lêkirin re wê xwediyê rewşeka têgînî wa wateyî û têgînî bê. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê, ya ku ew di dema mirov ku ew di wê de dijî ku ew berî wê demê bûya û hatîya jîyankirin wê, ew bi wê re wê werê hanîn li ser ziman.

Di vê çerçoveyê de wê gotina mejûyê, wê weke gotineka ku ew bi têgînî wê rewşa têgînî û têgihiştinî a di hûndûrê gotina *´dîrokê´* de ku ew, wê dihênê li ser ziman jî bê. Dîrok, wê gotineka ji kurdî bê û wateya wê, *serborîyên demên bûhûrî ên ku ew hatina jîyankirin* bê. Temen û koka

gotina dîrokê wê di kurdî de wê li ser *´dî´* û *´ro´* û ankû *´rokê´* bê. Her wusa rewşa *´dî´*yê wê di wateya tiştek, nerînek, hebûnek, rewşek û hwd de ku ew hatîya dîtin wê, bahs û qaste wê bike. Di vê çerçoveyê de wê tiştekî ku ew hatîya jîyankirin wê ew wê bi xwe re wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de em, divê ku di dewame mijarê de rewşa têgîna gotina dîrokê bi kok û navaroka wê re wê, baş li ser wê bisekin û wê werênina li ser ziman.

Gotina dîrokê wê, weke gotineka ku wê weke ku ew di roja me de jî ew bi wê dihê hanîn li ser ziman wê, serborîyên demên bûhûrî wê werênê li ser ziman. Serborî, weke tişta ku ew hatî jîyankirin di demek bûhûrî de bê. Li vir, ji ya ku ew hatîya jîyankirin wê gotina dîrokê wê hîmê xwe wê bigirê. Wê bi wê re wê were hanîn li ser ziman.

Tişta ku ew hatîya jîyankirin wê weke ya ´rast´ jî mirov dikarê wê di çerçoveya têgîna dîrokê de wê werênê li ser ziman. Lê weke ku me hinekî li jor jî hanî li ser ziman wê, piştî ku wê nivîsandin wê pêşbikeve û pê de wê, rewşa nivîsandina dîrokê wê weke mijareka sergirtî û ankû servekirî wê hertimî wê xwe di nava jîyane mirov a bi nivîsandinê re de wê bide dîyarkirin. Di roja me de em, li ser pêşveçûnên zanînê, civakê û hwd re wê dihildina li dest. Her wusa, rêbazên weke lêkolînê, lêgerînê û hwd wê pêşbikevin weke şêwayna nivîsandinê. Şêwayên nivîsandinê wê di serî de wê, weke rewşa li ser temenê wê yê rast ku ew hertimî li gorî ya ku ew hatî jîyankirin ku ew were hanîn li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa nîşanak, çavkanî, jêdêrî û hwd jî wê, weke rewşna ku wê bi wan wê bê xwestin ku wê bi awayekî lêkolînîkî ku ew têkilîya di nava ya hatî jîyankirin û ya ku ew wê dihênê li ser ziman weke hiş bi nivîsê û hwd re wê dênê bê.Li vir, di mantiqê wê bi birhankirina bi rewşa nîşanak, çavkanî, jêdêrî û hwd re jî wê, têgîna lêgerîna *´rastîyê´* wê hebê. Li vir, ev gotina rastiyê ku mirov wê bahse wê dike em, bi gotinekê jî wê li vir wê bahse wê bikin. Ew jî wê, di wê çerçoveyê de wê, weke hevhevdûbûn û ankû lêhetinîyeka weke hevdû ku ew hatîya çêkirin di nava rewşê û nivîsê de wê, di temenê wê gotina rastiyê de bê.

Di rewşa fahmkirina rastiyê de wê, li vir wê, were hanîn li ser ziman. Li vir, çendî ku ew aqil pêş dikeve û pê de wê, hertimî wê zanîna mirov jî wê pêşbikeve. Mirov wê, di rewşa nivîsandinê û hanîna li ser ziman de wê, lêgerîna ku ew bi wê întîbaya gotina ´rastiyê´ re wê di çerçoveya dana bawerkirinê de wê bikarbênê. Li vir, dema ku rewş ev bê, wê hingî wê di rewşa têgîna gotina rastiyê a vê rewşê de jî wê hinekî xişiqîn wê bi wê re wê bibê. Yan jî mirov, dikarê bêjê ku wê hinekî şiqitîn wê di wê de wê

were çêkirin. Ev jî wê, li vir, wê weke gotineka ku wê dema ku wê ew nivîsandin ku ew hat nivîsandin wê ji rastiyê zêdetirî wê li rewşa dana bawerkirinê wê were lêgerîn. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, têgîna gotina rastiyê´ wê ji rastîya wê dûr wê di vê armancê de wê were bikarhanîn.

Di rewşa fahmkirinê de wê, hertimî ya ku mirov ew fahmkir wê çendî wê karibê ya rast ku ew bûya wê werênê li ser ziman? Ev jî wê weke pirseka ku mirov wê dikarê wê li vir wê bipirsê bê. Ya ku mirov ew fahmkir wê li vir, wê çendî wê karibê wê ew wê rastîya rast ew di xwe de wê werênê li ser ziman? Li vir, di aslê xwe de wê, pirsgirêka fahmkirina nivîsên ku ew hatina nivîsandin wê, di vê çerçoveyê de wê, weke rewşekê wê hertimî wê gûmaneka ku wê têgîna demê wê di bin wê de wê de wê bi xwe re wê biparêzê. Di rewşa têgîna fahmkirina serborîyên demên bûhûrî de wê, mirov ne xwediyê wê derfetê bê ku mirov di hundûrê demê û cîwarê de wê rêwîtîyê bike û herê wê demê û wê bibînê û bi dîtina xwe re wê êdî wê werênê li ser ziman. Ya ku mirov wê dibînê wê, piştî wê serborîyê re wê bi xiyalkirina bi aqilê mirov re wê li ser zanînên wan deman re bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê ew wê weke rewşeka hanîna li ser ziman bê. Têgînên weke lêkolîn, lêgerîn û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê, ya ku ew hanîna li ser ziman wê di çerçoveyeka bi nîşanak, çavkanî, jêdêrî û hwd, wê werênê li ser ziman.

Di rewşênên fahmkirina têgîna dîrokê de wê bi demê re wê gelek dîrokên ku wê derkevina li holê wê hebin. Di roja me de wê, têgînên di derbarê dîrokê de ên mengiwerî, pêzawerî û hwd wê, hebin. Ev jî wê, di nava xwe de wê, li gorî têgînên zanînî, bîrdozîkî û hwd wê gelek hizrên di derbarê dîrokê de wê derxê li holê. Minaq, di rewşa têgîna aqilê mengîwerî de ku mirov wê bi wê re wê bihizirê wê rengên têgînên we têgînên di derbarê dîrokê de ên weke metafîzîkî, olî û hwd wê derkevina li pêş. Ev têgîn jî wê weke têgînna ku wê koka wan li ser têgîneka ku wê, bi wê re wê werênina li ser ziman ku wê, her tişt di kifşkirin û dîyarkirina wê de wê, vînek wê hebê. Ew vîn wê weke *´vîna xwûdê´* wê werê hanîn li ser ziman. Ev rengê hanîna li ser ziman a dîrokê wê temenê wê, li ser têgîna baxtê dirûnihê û bi wê re dihê hanîn li ser ziman.

.

**Dîrok, hert tişta ku ew bûhûrî û di demên berê de rûdaya.**

Li gorî vê têgînê wê her tişta ku ew di demên bûhûrî ku wan rûdaya wê di temenê wê de wê baxt wê hebê. Di destpêkê de wê çi bibê ew, hatîya dîyarkirin û ew hatîya nivîsandin. Li vir, dema ku wê mirov bahse baxtê

bike, mirov divê ku vê yekê jî wê ji bîrnekê ku wê têgîna nivîsandinê wê li vir wê, bikarbênê. Di awayekî bi hişmendî de wê were hizirkirin ku wê her tişt ew hatîya nivîsandin bê. Mirov wê, li gorî ya ku ew hatîya nivîsandin wê bijî. Di vê çerçoveyê de wê, ew weke ya ku mirov *´pêwîsta ku wê bijî´* wê, di rewşekê de wê were hanîn li ser ziman. Ya ku mirov pêwîsta ku wê bijî wê, weke ya ku mirov nikaribê xwe ji wê bide alîkî û ji wê biravê. Wê ew her demê wê bi kirinê me re bê. Dema ku mirov kirinek kir û ew da nîşandin ew kirin wê, li gorî mantiqê vê têgînê wê weke kirineka ku ew ji berê ve ew kirina wê hatîya kifşkirin bê. Di vê çerçoveyê de wê li ser wê re wê were hizirkirin.

Di rewşa hanîna li ser ziman a serborîyên mirov ên ku ew dihên jîyankirin de wê, di vê çerçoveyê de wê, rewşek teybet wê bi têgînî wê xwe bide dîyarkirin. Ev jî wê ew bê ku mirov wê dema ku wê tişta ku ew jîyankirîya wê, weke ku ew di dema ku mirov wê jîyankir ew, weke rewş û ankû kirineka ku me kirî ku ew li pêşîya me bê. Li vir, kirin wê, di vê çerçoveyê de wê li ser rewşa darêjka wê re wê were hizirkirin. Her wusa em li vir, dema ku vê rewşê wê rewşa darêjkê wê, bi awayekî wê hildina li dest wê, di vê çerçoveyê de wê têgînekê wê bide me. Aqilê mirov wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê ku ew bi çerçoveyek darêjkî dihizirê û dihênê li ser ziman bê. Her wusa ev rewşa darêjkî ku mirov di dema aqilkirin, hizirkirin û hanîna li ser ziman a zanînê de jî wê, ew di temen de wê hebê. Ew weke hişmendiyeka me ya ku ew di mejiyê me de ew hebê bê. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê bi têgîna darêjkê de wê ew hişmendîya me ya ku ew weke aqil, hiş û ankû zanînê ku ew dihê li ser ziman wê, di derbarê wê de jî wê hişek wê biafirê. Ev rewşa hişmendîya di derbarê wê hişê me yê pêşî ê weke aqil û ankû zanînê de wê, bi demê re wê li ser têgîna darêjkê re wê bigihijê wê ast û rada afirandinê. Di vê çerçoveyê de wê, bidest afirandinê wê bikê. Mejiyê mirov wê, di vê çerçoveyê de wê li ser wê hişê re wê li pêşîya aqil û ankû zanîna xwe ya ku ew di mejiyê xwe de wê dihizirê, wê weke ku ew li pêşîya wê bihizirê. Kirinek ku ew nehatîya kirin wê, ew têgîna wê bi darêjkî wê di mejî de wê biafirê. Lê heta ku ew nebê û di nekeve çalakiyê de wê ew têgîn û ankû darêjk wê, weke rewşek têgînî wê bi mirov re wê bimênê. Çendî ku ew neketibê çalakiyê de jî wê, ew weke *hizrekê* wê hebê. Di vê çerçoveyê û rewşê de wê, aqilê mirov wê, rewşa xwe ya afirandinê û rewşa têgîna piretîkê û hwd de wê, xwediyê rewşekê bê. Têgîna kirinê û ankû piretîkê wê, di aslê xwe de wê weke têgîneka ku wê, weke gavekê li pêşîya wê hizirkirina me ya ku wê hizir dikin bê. Her wusa wê, ew kirina

ku ew weke encama wê hizirkirina me ya, wê di vê çerçoveyê de wê, piştî ku ew bû û pê de wê weke kirinekê û anku rewşekê wê hebê. Wê xwediyê heyînekê bê.

Têkilîya di nava wê rewşa aqil û kirinê de wê, li vir, wê bi hişmendîyekê wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa ev hişmendî jî wê, xwe bi vîn û ankû rewşek din a aqilê mirov a bi mirov re wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, hişmendî ji xwe wê, di rewşek vînî a mejîyî de wê bi aqil wê hatina li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê û rewşê de mirov dikarê wê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa aqilê mirov wê, wê di vê çerçoveyê de wê bi têgîna vînê re jî wê xwediyê wateyekê bê. *Dayîna bîryara kirinekê û kirina wê kirinê* wê, di vê çerçoveyê de wê xwe pêşbikeve. Dayîna bîryara rewşekê û kirina wê rewşê wê, di vê çerçoveyê de wê weke rewşek hizirkirinî bê. Mirov, piştî bi hişbû û pê de wê, kirinên xwe wê bihiş wê bikê. Her wusa wê kirinên xwe wê çawa wê bikê wê, li wê bihizirê. Minaq ku mirovek dihizirê ku *ewê herê nêçîrê, wê sawalê nêçîrê bike û wê nêçîra ku wî kir wê were malê, wê ji w nêçîrê wê ji wan re wê xwarin wê were çêkirin û ew jî wê ew wê bixwûn*, wê di vê çerçoveyê de wê weke hizreka berî çûyîna nêçîrê ku mirov wê di mejiyê xwe de wê bihizirê bê. Dema ku ew çû nêçîrê û ev pêvajo weke ku wî hizirkir û hanî li cih wê, ew weke ku wî hizirkirî ku wî kirî wê bibê. Di vê çerçoveyê de wê piştî ku ew kirin bû û pê de wê, hizirkirina weke *ewê herê nêçîrê, wê sawalê nêçîrê bike û wê nêçîra ku wî kir wê were malê, wê ji w nêçîrê wê ji wan re wê xwarin wê were çêkirin û ew jî wê ew wê bixwûn* wê, piştî ketina çalakiyê de wê, rewşa wê hizirkirinê a piretîkî wê weke ku wê pêşbikeve. Lê li vir, di rewşa wê piretîkê û wê hizirkirinê de mirov çawa dikarê wê têkiliyê dênê? Di aslê xwe de mirov, vê yekê jî li vir dikarê wê hinekî bike berpirsînê û li wê hizirê û wê werênê li ser ziman.

Di rewşa kirinê û ankû piretîkê û têkiliya wê ya bi aqil re de wê, li vir wê weke aliyekî giring wê derkeve li pêşîya me. Ya ku mirov re nivîsand, têkiliya wê ya bi rewşên kirinê, hebûnî û jîyanî û hwd re ku mirov wê dênê wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa mirov divê ku vê yekê jî wê, werênê li ser ziman wê, tişta ku ew hat nivîsandin û têkilîya wê ya di nava rewşa heyî û ankû bûyî a jîyanî de wê, çawa wê werê danîn. Li ser mantiqê têgîna gûharînê re ku mirov wê binerê wê, ya ku wê bi aqil (yanî fahmkirina me re) re wê xwe bide dîyarkirin wê, ew bê ku wê ya ku ew hatî nivîsandin wê, weke binetereka bi serê xwe bê. Her wusa wê, rewşa fîzîkî a jîyanî wê weke xwe wê nemênê. Wê ew wê hertimî wê di wê de wê gûharîn wê bibê.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşa aqilê mirov wê, xwe di vê çerçoveyê de wê bide dîyarkirin.

Di rewşa fahmkirina têgîna hizirkî a dîrokî de wê, her wusa wê li vir wê ya ku wê derkeve ber me, wê di vê çerçoveyê de wê, weke rêbazê wê xwe bide dîyarkirin. Wê di vê çerçoveyê de wê, xwe bide dîyarkirin. Di destpêka pêşketina nivîsandinê de wê, hin bi hin wê pêşî wê gotin û ankû hin dager weke wêne û hwd wê werina dîtin. Piştre wê, ew wê bi gotin bibin. Piştre wê, weke ku em di pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê de wê kifş dikin wê ew gotin wê bi vegotin û ankû vebêjin wê bibin. Piştre jî wê, ev vegotin û ankû vebêjiin wê, di rewşeka ku bi aqilî de wê, çawa wê bi ast û pîvan wê werina pêşxitin wê xwe bide dîyarkirin. Aqil, wê hertimî wê, di rewşek razber de wê xwe bide dîyarkirin û pêşxistin. Di vê çerçoveyê de wê xwe pêşbixê. Di şîroveya li ser gotinan re de jî wê, rewş wê bi vê rengê bê. Wê her wusa wê, aqil wê li ser hiş re wê, vê rewşê wê bi xwe re wê pêşbixê. Dema ku mirov di rewş û nerîna hiş re dinerin em wê dibînin ku wê, weke her tişt weke ya ku ew hatî hizirkirin bê. Ev rewşa ku wê xwe bi têgînê re wê bide dîyarkirin wê, hişê weke ardnîgarîyekê wê xwe re wê bikarbênê û wê li ser wê re wê bide hanîna li ser ziman bê.

Di rewşa fahmkirina wê de wê, bi demê re wê rewşa hanîna li ser ziman wê, weke ku mirov di serdemên pêşketina felsefeyê de em dibînin wê, di awayekî hizirkî de wê, pêşbikeve. Wê rengê vegotinê wê bi razberî wê pêşikeve û wê ji wan vegotinên destpêkê û ankû ên weke *´rîwayeta´* û hwd wê derbas bibê. Ev jî wê, bi têgînên felsefîkî ên weke mantiqê û hwd û bi pêşketina wan re wê xwe bide dîyarkirin. Wê di vê çerçoveyê de wê, têkiliya rewşan wê bi hevdû re wê were danîn. Wê vegotinên dirêj wê bi razberî wê werina pêşxistin. Wê di vê çerçoveyê de wê, ji têgînên felsefîkî û hwd wê sûd wê were girtin. Her wusa, têgîna dîrokê wê di vê çerçoveyê de wê, di çerçoveya têgînên felsefîkî de wê bidest pêşketina xwe ya bi hizir wê bike. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna dîrokê wê, di rewşa fahmkirina rewşa jîyane xalk û ankû civakên ku ew pêş dikevin ve wê weke wateyekê bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, rewşa jîyane wan, serborîyên wan, bi hebûna wan re wê, bê xwestin ku ew were fahmkirin. Li vir, dîrok wê, di vegotinên wê de wê gûharîn wê pêşbikeve. Wê ast û pîvan wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa vegotina hizirkî wê, derkeve li pêş ji ya vegotinan û hwd. Di rewşa fahmkirina dîrokê de wê, li ser aqil re wê destûr, zagon û rêgezên wê yên ku wê, ew di dema nivîsandinê de wê li wan wê werê nerîn wê pêşbikevin.

Her wusa, rastbûn, wekehevdûbûn bi rengê jîyan û ankû serborîyê re, ji xiyalkirinê zêdetîrî bi ya ku ew hatî jîyan ve girêdayînbûn, di dema nivîsandinê de têkilîya rewş û deman bi hevdû re danîn û di wê çerçoveyê de di çerçoveya pêşveçûnên jîyanî de pêşxistina wê ahenge vegotinî a hizirî û hwd, wê derkevina li pêş. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê bi demê re wê, di rewşên fahmkirina bi felsefîkî de wê, destûr, zagon û rêgezên nû wê li van wê zêde bibin. Minaq, weke rastîtîyê û ankû realîsmê mantiqê û hwd. Ev jî wê, bi demê re wê weke têgînna ku wê reng bidina hanîna li ser ziman a bi nivîsandinê re bin.

Di rewşa fahmkirina rewşa dîrokê de wê, her wusa wê di vê çeçroveyê de wê ya ku wê derkeve li pêş, wê ew bê ku wê di rewşa hanîna li ser ziman de wê, bi têgînî wê werê hanîn li ser ziman. Li vir, di çerçoveya nivîsandinê de ku mirov bihizirê, her wusa ew binetera nivîskî a ku ew hatî nivîsandin wê, bi awayekî serbixwe dema ku mirov wê hilde li dest wê, di çerçoveya xwe wê, têgîn û çerçoveyek çawa wê bihzirkî wê bide me. Hinekî jî wê têgîna dîrokê a felsefîkî wê ji xwe re wê bike weke kar û xabatekê ku wê fahm bike. Weke binetereka nivîskî û ankû metneka nivîskî tenê bi serê xwe hildana wê li dest wê, wê bi xwe re wê di çerçoveya wê binetera nivîskî de wê, di wê çerçoveyê de wê hizreka me wê di serê me de wê çê bibê. Her wusa wê, binetera ku ew hatî nivîsandin wê, bi pêşî di çerçoveya wê û navaroka wê de wê, ahenge wê ya ku ew heyî fahmkirina wê, têgîneka wê bi şêwayê wê re wê fahmkirin û her wusa wê, piştre wê, di çerçoveyekê hizirkî de wê, têkiliya wê bi rewşên jîyanî re danîn û hwd, wê li vir wê weke şêwayna têgîna dîrokê wê derkevina li pêşbin.

Têgîna ku ew hat hanîn li ser ziman weke dîrokê wê, di çerçoveya wê de ku mirov dihizirê wê, têkiliya wê bi rewşên serborî re mirov çawa dikarê wê dênê? Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê bi wê mirov wê çawa wê karibê, wê dema wê fahm bike. Pêşî wê bi wê nivîsê wê ew dema ku ew di wê de eww hatî nivîsandin wê were fahmkirin.

Dîrok dema ku ew dihê nivîsandin wê, her wusa wê, hertimî wê şert û mercên ku mirov di wê de dijî û hwd wê, bandûra wê li ser şêwayên nivîsandina mirov wê hebin. Ev wê, ji rewşa ast û pîvane pêşketinê û hwd, wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Di rewşa fahmkirinê de wê, di rewşên aqil û nivîsandinê de wê, ev weke şêwayna wê xwe bidina dîyarkirin. Nivîsandina ku ew hat kirin û pêde wê, ew nivîsandin wê weke nivîsandineka bi têgînî bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, her gotinên ku ew hatina nivîsandin wê, çendî ku ew bi

serê xwe wê werina fahmkirin wê, bi têkiliya wan ya bi hevdû re jî wê, werina fahmkirin. Di vê çerçoveyê ew tûra têkiliyan a ku ew pêşdikeve di nava jîyane civakî de wê, hinekî jî wê, temenê afirandina hizirkirinê û nivîsandinê bi xwe jî bê. Mirov çi kir û nekir, çi dît û nedît, çi fahmkir û nefahmkir û hwd, wê ev wê xwe bidina dîyarkirin. Di vê rewşê de wê di rewşa hanîna li ser ziman de wê, ew wê weke aliyekî giring wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşa fahmkirinê wê xwe li vir wê weke aliyekî giring wê li ser wan rewşên têkiliyan û afirîna wan re wê bide dîyarkirin. Mirov, di dema danîna têkiliyekê de wê, bi çi armancê û hwd wê, ew wê bike? Di vê çerçoveyê de wê, ev wê xwe bi wê re wê bide dîyarkirin. Di rewşa fahmkirinê de wê, rewşên têkiliyan wê, weke rewşna giring ên ku mirov wan hilde li dest bê.

Li vir, divê ku em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, di rewşa nivîsandinê de wê, du alî û ankû rewş wê bi awayekî bi bandûrî wê hertimî wê xwe di rewşa nivîsandinê de wê bi bandûr wê bidina nîşandin. Yek wê, di rewşa gûharîna demê de bê. Weke ku me, hinekî li jor hanî li ser ziman wê dem wê, hertimî wê di pêvajoyek gûharînê de bê. Ev rewşa ku mirov wê nivîsand, wê dema ku ew hat nivîsandin û pê de wê, piştre wê gûharîn wê ji wê rewşê û demê û pê de jî wê bibin. Bi wê re jî wê, ew binetera nivîsandînî a ku ew hatîya nivîsandin bi nivîskî wê weke binetereka di dest de ku ew, bi serê xwe wê bimênê. Ew rewşa ku mirov wê, weke wê bi şibehênê hevdû wê bi wê gûharînê re wê ji holê wê rabê. Ev jî wê, weke aliyek bê. Aliyê din jî wê, ew bê ku wê dema ku mirov demek bûhûrî a jîyane mirov û ankû civakê nivîsand wê, piştre mirov wê li wê bihizirê. Li vir, wê dema ku ew hat nivîsandin wê, çendî wê weke ku ew rewş bûya û qawimîya û hwd wê, ew wê were nivîsandin? Li vir wê, ev rewş wê weke pirsekê wê hertimî wê xwe di mejiyan de wê, biparêzê. Di vê çerçoveyê de jî mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa nivîsandinê wê, xwe wê bi awayekî wê rewşek nivîskî a ku ew piştre hatîya pêşxistin bê. Wê di vê çerçoveyê de wê, di rewşa wê rewşa bûyî û ankû qawimî û nivîsandina wê de wê, xwe wê weke rewşekê wê bide dîyarkirin. Li vir, ev rewşa nivîsandinê, wê weke rewşek teybet a bi demê re bê. Li ser têgîna dem û cîwarê re mirov, divê ku wê bi berdewamî hinekî din jî wê fahm bike û werênê li ser ziman.

Bêgûman, divê ku mirov wê yekê wê werênê li ser ziman ku wê, her tişt wê di demê û mekanê de wê, bibê. Di rewşa tişta ku ew bûyî de wê, ew wê weke tiştekî ku ew heyî bê. Li vir, em dema bahse dîrokê bikin wê, bi wê

re wê di serî de wê rewşên jîyanî ên mirovî û civakî û hwd ku ew dihên jînkirin wê, xwe bidina dîyarkirin. Bi wê re mirov divê ku vê yekê wê werênê li ser ziman ku wê tişta ku ew bûya, ber çi bûya û sedema wê çî ya wê, bi wê re wê têgîna sedem û encamê wê bixwe re wê werênê li ser ziman. Rewşên ku ew bûna mirov wan dixwenê. Her wusa tişta ku ew bûya wê, weke heyîna rewşek fîzîkî a bûjenî a zêhnî wê xwe bide dîyarkirin. Tişta ku ew bûya wê, ew hebê. Di vê çerçoveyê de wê li ser wê hebûna wê re wê ew were hanîn li ser ziman. Di rewşa hanîna li ser ziman a wê de wê, rewşa têgîna wê tişta ku ew jîyanbûya wê weke rewşek ku ew heya wê xwe bide dîyarkirin.

Mirov, di jîyanekê de dijî ku ew jîyan wê weke rewşekê wê bi rewşên xwe yên bi pêşketina xwe re wê biafirênê bê. Mirov, dema ku bahse têkiliyên nava mirovan dikê wê, bi wê re wê, ew rewşên têkiliyî ku ew bûna wê, weke rewşek bûyî wê xwe bidina dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de piştî ku ew bûna ku mirov, li şûn xwe dinerê û wê dibînê û wê dikê ku wê werênê li ser ziman wê, ew weke mejû û ankû dîroka wê rewşê bê.

Di rewşa dîroka civakê de jî wê wusa bê. Mirov di nava civaketîyê de dijî. Têkiliyan didênê. Diçê deveran û ji deveran di vegerihê. Her wusa wê, di wê rewşê de wê, her kirinên mirov ên ku mirov wan dike wê, bi armancekê û ankû sedemekê wê hebin. Wê werina kirin. Wê dema ku ew hatina kirin wê, di wê çerçoveyê de wê, weke tiştekî ku ew li gorî wê têgîna armancê û hwd wê, weke têkiliyek û ankû gavek ku ew bê kirin û ankû avêtin bê. Yanî li vir wê, têgîna sedemê, wê di wê demê de wê, weke kirdeyek vêşarî wê têgîna pêwîstînîyê wê li gorî wê rewşê wê xwe bide hawandin. Minaq, dema ku mirov birçî dibê, divê ku mirov xwarinê bixwê. Wekî din mirov, wê nikaribê bijî û ankû jîyane xwe bide domandin. Li vir, wê têkiliya xwarin û jîyanê a bi hevdû afirandinê re wê, di vê çerçoveyê de wê yek encam û ya din sedem bê. Lê li vir wê, di vê çerçoveyê de wê, ev têgînên ku ew hatina kirin wê, di wan de wê hertmî wê têgînên vêşarî wê bi vê rengê wê hebin. Ev jî wê, rewşa wê ya bi kirin, tevgerkirin û xûyan û dana nîşandina wan re wê xwe bide dîyarkirin. Mirov, î ro di wê rewşê de wê di zanê ku wê mirov, dema ku mirov tiştekî baş kir wê ew weke başî wê were pênase kirin. Bi heman rengî wê vajî wê jî wê rast bê. Lê li vir, mirov dixwezê û di xwe de wê pêwîst dibînê ku ew ya rast bikê. Ber ku ew bi wê bawer a ku ew rast, dûrûst û ya baş a. Di vê çerçoveyê de wê, aliyê ku mirov wê berê xwe bidiyê de bê. Di vê çerçoveyê de mirov, dema ku wî, kirinek baş kir wê bi wê ya başîyê re wê were li ser ziman. Lê dema ku ew bi başî nekê wê, weke ku ew ne baş wê were li ser ziman.

Têgîna baş û nebaşîyê wê weke rewşek nirxî a darazî bê. Her wusa mirov, di vê çerçoveyê de wê bi şêwayekê hişmendî wê mirov wê kifş bike û wê werênê li ser ziman.

Li vir, mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, dîrok wê bi têgîna xwe ya ku em wê li vir bi wate dikin wê, ji rewşa rastîya jîyankirî wê temen û rastîya xwe ya wateyî wê bistênê û wê were hanîn li ser ziman. Minaq, têgînên weke destan, çîrok û hwd wê, ew tenê wê weke vegotinna ku ew ji xiyale mirov bin. Wê di rewşa wan ya şenber û ankû bûyîn di wê de wê, weke rewşna ku wê mejiyê mirov wê bi çerçoveyê wê biafirênê bê. Lê di aslê xwe de wê, di temen û rastîya wan de wê, ezmûn û fêrbûnên mirovî û civakî ên jîyanî wê hebin. Mirov dikarê wê di vê çerçoveyê de wê werênê li ser ziman. Di roja me de em, dema ku bahse dîrokê dikin û wê dihênina li ser ziman wê, li ser serborîyên ku em ji wê biêmin ku ew hatîya jînkirin û ankû bûya re wê, dihênina li ser ziman. Di kurdî de gotina ´dîrokê´ wê, di vê çerçoveyê de wê, xwedîyê wate û kirdeyekê a bi xwe re û di xwe de bê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li wer ziman ku wê dîrok wê, weke têgîneka ji ya ku ew hatî jînkirin bê. Mijara fahmkirina wê rewşa ku ew hatî jînkirin wê, ew weke rewşeka ku wê pirr zêde wê li ser wê aqil wê werê meşandin bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku ew rewşa ku ew hatî jînkirin wê, weke rewşek mejûyî ku ew hatî jîyankirin û ankû bûya wê, were dîtin. Li vir, em dema ku bahse têgîna demên bûhûrî û ankû serborî û jîyankirinên demên bûhûrî dikin wê, ya ku ew hatî jînkirin wê weke têgîn û kirdeyekê wê di gotina me de wê, xwe bide dîyarkirin. Bo vê yekê ku mirov li ser wê re bahse mejûyê û ankû dîrokê bike wê, li vir wê li ser wê ya jîyankirî a fîzîkî a bi zêhnî û ankû bi hebûnî û hwd re wê ew were hildan li dest. Di aslê xwe de wê, têgîna dîrokê wê, di vê çerçoveyê de wê, weke têgîneka felsefîkî ku wê ji ya ku ew heya wê, gavê bi havêjê bê. Ya ku ew hatî jînkirin wê, wê weke rewşek fîzîkî a bêî hacm wê, di rewşek dîtbarî a heyînî ve wê, ew hebê. Bûjenîya wê, wê bi jîyankirina wê re wê hebê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, weke rewşeka ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman bê. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman wê têgîna bi têgîneka heyînî, hebûnî û bûjenîya wê re wê li ser ya ku ew hatî jîyankirina re wê xwediyê wateyekê bê. Li vir, dîrok dema ku ew li gorî aslê xwe de ew hat nivîsandin wê, di vê çerçoveyê de wê weke ku ew xwediyê wateyekê bê.

Têgîna dîrokê wê, di vê çerçoveyê de wê ji ya ku ew hatî jîyankirin wê, xwediyê têgîneka dîrokî bê. Ya ku wê, têgîna dîrokê ji ya vegotin, destan,

çîrok û hwd wê cûda dike wê, rewşa wê ya jîyankirî a di rastiyê de ku ew hebê bê. Di vê çerçoveyê de wê dîrok wê, weke rewşek teybet bê. Di rewşa fahmkirinê de wê, rewşa jîyankirinê wê, xwe weke rewşek dîyarkirin wê bide dîyarkirin û wê bide hanîn li ser ziman.

Li vir, divê ku mirov wê werênê li ser ziman ku wê, dema ku mirov dîrokê dinivîsênê wê li ankû civakek wê li ser ên serborîya wê re wê were nivîsandin. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de keseyet, komek û ankû civake wê, bi rewşên xwe yên jîyanî ên yekane û ankû tekane û giştîyî wê werênê li ser ziman. Mirov jî wê weke her tişta ku ew heya wê, xwediyê dîroka xwe bê. Her tişta ku ew heya wê, xwediyê dîroka xwe bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê dîrokê wê werênê li ser ziman.

Li vir, têgîkiliya di nava fîzîka zêhnî û ya bi hebûnî ku ew heya de mirov dikarê li vir wê gotinekê wê werênê li ser ziman. Di rewşa salixkirinê de wê mirov, weke hebûnekê wê taqabûlî wê rewşa fîzîkî a hebûnî wê bikê. Ew bi hebûnî heya. Mirov dikarê destlêbide û wê bidest zant bikê. Her wusa rajiyê de. Ev weke fîzîkîya bi hebûn a. Lê rewşa fîzîkîya bêfîzîk (bi bêfîzîkê re qastî hebûna weke deng ku ewne xwediyê rewşa fîzîkî ya) weke deng û hwd wê ew hebê. Lê mirov wê, nikaribê wê, bi bidest wê bigirê, destlêbidest û wê rajiyê de. Mirov vê rewşa fîzîkî a bi hebûnî û ne bihebûnî wê dikarê di rewşa mirov de jî wê, fahm bike. Minaq, mirov bihebûna xwe re ku ew heya wê weke hebûnek fîzîkî bê. Lê rewşa jîyane wî ya ji destpêka bûyîna mirov û heta dawîya jîyane mirov ku ew mirîya wê, weke jîyankirnek ku ew hatî jîyankirin û bûya wê hebê. Li vir, mirov wê nikaribê wê jîyankirinê bidest bigirê. Lê mirov wê karibê mirov bidest bigirê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, rewşa têgîna dîrokê wê weke ku em di kurdî de ji wê gotina wê û wate û kirdeya gotina wê, fahm dikin wê taqabûlî wê rewşa jîyankirinê û hebûnê wê bike. Tiştek heta ku ew nejî wê mejûya wê jî wê nebê. Wê ne xwediyê şûnpê û ankû paşaroj bê. Paşaroj û pêşaroj wê, her wusa wê li ser wê rewşê re wê hebê û wê xwe bide dîyarkirin. Wê li ser rewşa heyînî û pêvajoyên jîyankirina hebûnê re wê bibê. Dîrok wê, di vê çerçoveyê de wê bi jîyankirinê re wê xwedîyê temenê xwe yê darêjkî ê bi heyînî bê. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê dîrok wê mejû bê. Yanî ya ku ew hatîya jîyankirin bê. Her wusa mirov dikarê wê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê rewşa ku ew hatîya jîyankirin ew, çawa û bi çî rengê ew hatîya jîyankirin, wê dema ku wê jîyankirin wê çi pêvajo bi çi rengê jîyankir û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê mijareka fahmkirina têgîna dîrokê bê. Ji xwe dîrok, wê weke ku mirov wê, ji gotina wê fahm bike wê xwediyê dîtînê ku ew bi ´dî´

re dihê li ser ziman û mejûyekê ku ew bi ´rokê´ û ankû bi ´ro´yekê re dihê li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de her tişta ku me jîyankir wê, ew hebê. Her tişta ku me ew jîyankir wê, li şûn me bimênê. Ber ku mirov ew jîyankirîya. Wateya ´mirov ew jîyankirîya´ wê, ew bê ku mirov ew jîyankirîya û ji wê derbas bûya. Yanî mirov wê bi jîyankirinê re wê li şûn xwe hiştîya. Tişta ku mirov ew li şûn xwe hiştîya jî wê dîrok bê.

.

**Dîrok, wê dema ku mirov wê jîyankiriya. ..**

Dîrok wê dema ku mirov wê jîyankirina wê, weke bineterekê wê didênê li berçavên xwe û wê, dike ku wê fahm bike mirov, wê bi wê re wê di vê çerçoveyê de wê bi darazî wê nêzîkatîyê wê li wê serborandinê wê bikê. Têgîna *dîroketîya rexnegir* wê, di vê çerçoveyê de wê bi li gorî têgînekê bi başî û nebaşî, rast û ankû ne rast û hwd ku wê, li ser têgîna darazê re wê were hanîn li ser ziman. Yanî bi gotineka din bi têgîna ji hevdû vaqatandina ya ´baş û nebaş´ re wê ev bibê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê bibêjê ku mirov, ku wê li gorî têgîna dîrokatîya rexnegir dihizirê mirov wê, heta demên gûtî, hûrî û mîtannîya jî wê karibê wê herê.Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, di van deman de wê têgîneka hanîna li ser ziman a mejûyê wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, weke rewş û têgînîyekê wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna dîrokê wê, di van deman de wê dema ku wê were li ser ziman wê di şêwayekî vegotinî û ankû vebêjin ku wê di rengê çîrokan de wê were li ser ziman bê. Wê di vê çerçoveyê de wê xiyalkirin wê, tevlî ya ku ew hatî jîyankirin wê were kirin. Biafsûnî wê werê hanîn li ser ziman. Têgîna afsûnê wê, di aslê xwe de wê bo wan demên destpêkê ên şariştanîyê wê, weke têgîneka vegotinbar a vegotinî û hanîya li ser ziman bê. Mirov wê, di mejiyê xwe de wê wê lêpirsînê bike ku ew ji kûve tên, ber çi hatina û dijîn, jîyan ber çî ya, wê mirov piştî mirinê wê herê kûderê û ankû wê çi ji mirov wê werê û hwd wê, di çerçoveya lêgerîna van pirsan û pirsên weke van de wê, xwe mihtacê hanîna vegotinekê bibînê. Di vê çerçoveyê de wê ew jî wê, êdî wê li ser wê re wê bihizirê û wê ew wê, werênê li ser ziman. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê têgîna afrîneryê jî wê ku ew li ser têgîna ´xwûdê´ re bê û ankû têgîneka din re bê wê, di vê çerçoveyê de wê were hanîn li ser ziman. Mirov, wê bi aqilê xwe wê, ne di wê astê de bê ku ew karibê hertiştê fahm bike. Ber vê yekê wê têgînên afsûnkar wê, di vê çerçoveyê de wê, xwe weke rewş û têgînek giring a ku mirov wê werênê li ser ziman bê.

Têgîna afsûnê wê, di aslê xwe de wê, di destpêkê de wê, weke têgînekê û ankû hewldaneka ku wê bi wê ew destpêka dîrokî û ankû a mirovî û jîyanê ku wê, bi wê bê xwestin ku ew werê hanîn li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de wê, ev rewş wê weke rewşek teybet wê, xwe bide dîyarkirin. Afsûn û têgîna afsûnê wê, di vê çerçoveyê de wê di mejiyê mirov de wê afrînerîyekê di çerçoveya hanîna li ser ziman û ankû pêşxistina vegotina bi li ser mejûya derbasbûyî re bê. Her wusa wê, dema ku mirov mîtolojiyên dema sûmerîyan û piştre ya gûtî, qasît, hûrî û mîtannîyan û heta ku wê bigihijê ya babil û medîya û hwd wê, di wê de wê, di vê çerçoveyê de wê rewşekê bide nîşandin. Her wusa mîtolojî wê weke şîroveyek dîrokî ku ew hilm û bêhna ji serborîyên jîyanî digirê û bi afrînerîya mejiyê mirov û xiyalîya mirov re wê, bi hevdû re wê di çerçoveyekê de wê werênê li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de wê çendî ku wê di nava wê rengê hanîna li ser ziman de wê, şêwayekî pirr zêde weke ´mubalaxa´ wê hebê jî lê wê, bi wê re wê di hanîna li ser ziman de wê, bi vegotinî wê werênê li ser ziman. Di vê demê de wê, rengê hanîna li ser ziman a mîtolojiyê wê, bide nîşandin ku mejiyê mirov wê, karibê êdî ew di çerçoveyekê de bi vegotinî biafirênê û wê werênê li ser ziman. Ev vegotinên ku ew dihên pêşxistin wê, piştre wê li ser wan re wê sererastkirin wê werina kirin. Her wusa wê, di demên piştre ên felsefeyê û hwd de wê ev bineterên nivîskî wê, werina şîrovekirin. Wê ji wan wê, li ya hatî jîyankirin û pêşketî wê were lêgerîn. Li vir, çendî ku wê di nava wê çerçoveya mîtolojikî de wê, bi xîyalî û hwd wê werê hanîn li ser ziman jî lê wê, mirov pirr zêde bi baldarî wê kifş dike ku wê li ser *´têgîneka jîyankirî´* wê, werê hanîn li ser ziman. Dema ku mirov wê, têgîna mîtolojikî dixwênê wê, di wê de wê li ser têgîna *´kirinê´* û ankû *´hatîkirin´* re wê werê hanîn li ser ziman.Herwusa wê, di vê çerçoveyê de wê, di çerçoveya têgîna serborîyê û ankû mejûyî de mirov wê, rengekî hizirkirinî ê mîtolojîkî wê hebê.Di nava wê de wê têgînên ku ew weke yên ku *´wê, werina jîyankirin´* jî wê, di çerçoveyek têgînî ku ew hatîya hizirkirin ku ew werina kirin û pişte ku ew hatibina kirin û ne hatibibina kirin û hwd de wê, ew werina hanîn li ser ziman. Yanî, li vir, di çerçoveyekê de wê, ew rewşa aqil û hizirkirinê wê di çerçoveyek têgînek mejûyî û dîrokî de wê, xwediyê rengekî hanînîya li ser ziman bê.

Di nava aqil de wê têgîna ´hizirkirî´, ´hizirkirinê´, ´hizirkirîbû´ û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê weke afrînerîyna bi çalakî ên di mejî de bin. Her wusa ev di mejî de bûna û li ser wan dem bûhûrtina. Piştre mirov wan di nava rewş û çerçoveyna vegotinî ên weke bi destanî, çîrokî û hwd de ew dihê hanîn li ser ziman.

Di rewşa hanîna li ser zimn a têgîna dîrokê de wê weke aliyekî giring wê xwe ji destpêkê ve wê, bi dîroka mirov û ya civakê re wê bide nîşandin. Her wusa dîroka mirov, wê di pêvajoyên ku ew derbaskirîya de ku ew derbasbûya wê, bi wê re wê dîroka wê werê li ser ziman. Di vê demê de wê mirov wê biafirê. Her wusa pêvajoyên peresendina mirov wê çendî demek dirêj wê bi xwe re wê bibin? Ev dem bi pêvajoyên jîyanî ên nava wê re wê, weke mejûyek wê were li ser ziman. Mirov dikarê wê bi gotin mejiyê re wê werênê li ser ziman. Têgîna ´mejûyê´ wê weke têgîneka ku wê di hundûrê dîrokê de wê di xatekê de wê ji destpêka bûyînê û heta wê kêlîka ku mirov di wê de dijî wê, were. Di vê çerçoveyê de wê, weke ku mirov dikarê wê weke şûnpêyê jî wê werênê li ser ziman.

Mejû wê, di nava xate herîkîna dîrokê de wê xateka dîrokî bê. Wê bi dîrokê re wê were li ser ziman. Wê dîrok wê, li ser mejûyê re wê were nivîsandin. Minaq, mejûya mirov, mejûya civakê û hwd. Her tiştên ku ew weke ku ew bi zindî di jîyanê de ew hena wê şûnpêya wan wê, bi têgîna mejûyê re wê were li ser ziman. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, bi demê re wê xwe bide dîyarkirin. Di rewşa fahmkirina dîroka civakê de wê, pêvajoyên wê yên ku ew hatina jîyankirin wê, weke pêvajoyna ku ew wê çawa wê werina jîyankirin bin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê, werênê li ser ziman bê.

Di dewama têgîna dîroka civakê de wê têgîna dîroka şariştanîyê bi pêvajoyên wê re wê werina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, bi jîyan û rewşên xwe yên jîyanî re wê, dîroka wê, wê were nivîsandin. Her wusa wê bi wê re wê, weke têgînekê wê were li ser ziman. Dîroka şariştaniyê wê bi xwe re wê, di vê çerçoveyê de wê pêvajoyên ku ew di nava xwe de wê bide destpêkirin wê hebê. Her wusa weke têgîna dîroka aqil ku ew bi wê destpê dibê bê. Her wusa wê li vir, wê têgîna dîroka aqil wê, bi pêvajoyên xwe re wê bi çerçoveya jîyana civakî û a mirovî de wê xwediyê temenekî pêşketinê bê. Dîroka aqil, dîroka hizirkirinê, dîroka bi destpêka nivîsandinê û hwd wê, bi wê re wê xwe bidina hanîn li ser ziman. Di nava çanda mesopotamîkî de wê, çandaka giring a şariştanî a nivîsandinê wê, pêşbikeve. Her çendî ku wê di van rojê de wê, ev çend wê bi şêwayekî wê weke ku ew ji herêmê hatibê barkirin û dûrkirinê jî lê wê, ew li herêmê wê bi kok û dîrok wê pêşbikeve.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê dîroka aqil, wê di navaroka xwe de wê bi dîroka hizirkirinê re wê, rewşa têgîna dîrokê û felsefeya wê, bi xwe re wê bidest afirandina wê bikê. Lê têgîna dîrokê wê bi felsefeya wê re wê li ser temenekî bûyî û pêkhatî re wê were

li ser ziman. Yanî weke ku me hinekî li jor jî hanî li ser ziman wê ya li ser bûyî û pêkhatî re wê were li ser ziman. Li vir, em vê jî bi gotina pêkhatinê re wê werênina li ser ziman ku wê, rengê pêkhatinê bi çi cûreyê bê, ew wê weke mijareka din a têgînî û fahmkirinê bê. Lê destpêka wê, wê her wusa wê, wê li vir wê weke aliyekî ku em li vir di çerçoveya mijara xwe de wê werênina li ser ziman bê.

Li vir, ku em li ser navarokê wê bihizirin wê, bi wê re wê were dîtin û fahmkirin ku wê, bi hizirkirinê têkilîdanîna li ser sedem(jiberçîya wê)ê û hwd re wê were li ser ziman. Dîrok, di dema ku ew hat nivîsandin wê, di rewşa têgîna sedemê de wê, li ser kirinên mirov re wê bihizirê. Li vir, têgîna sedemê wê, weke têgîneka dîtbar wê, li vir wê weke rengekî hişmendî ê li ser wê têgînê re ku mirov bi mejiyê re wê bigihijiyê de bê. Li vir em vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê têgîna sedemê wê bi têkilîdanîna dîrokê a weke ya rewşan a bi hevdû re wê, weke ku mirov wê fahm dike bê. Têkilî û sedem wê, bi hevdû re wê di rewşa hanîna rewşê û ankû rewşan li ser ziman de wê, çerçoveyekê wê biafirênê. Danîna têkilîya rewşan a bi hevdû re wê, weke rewşek teybet a hanîna li ser ziman bê. Em di jîyaneka ku wê di wê de wê, her tişt wê bi awayekî di dewame hevdû de û bi hevdû ve girêdayî wê were li ser ziman. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, tişta ku mirov weke sedem hanî li ser ziman wê di çerçoveya dîtbarîya wê de wê, rewşa têkiliyê ku ew diafirê û ankû dihê danîn wê, bi wê re wê ji aliyekî ve wê temenê xwe wê dênê. Mirov, ku xwarinê nexwê wê nejî. Li vir, têkiliya jîyanê bi xwarin xwarinê re danîn wê xwarinê wê weke sedemê wê bi xwe re wê werênê li ser ziman. Jîyan jî wê di rewşek weke ya encamê de bê.

Têgîna dîrokê wê, li vir wê weke ku mirov wê dibînê wê bi awayekî wê xwe di çerçoveya wê heyîna jîyanî a ku ew hebûna xwe didomênê de wê bi rewşên têkiliyên jîyanî re wê, rewşa têkiliyê û encamê wê bi xwe re wê di rewşa encamê de wê hinekî têgînên ên vêşarî ên weke armancê û hwd jî wê bi xwe re wê bike ku ew werênê li ser ziman. Dema ku mirov xwarinê dixwê, mirov armanc dikê ku bijî. Li vir, di aslê xwe de wê, di vê çerçoveyê de wê rewşa wê, wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, li ser rewşên ku ew bûyîna û pêkhatîna wê demê hanîna li ser ziman wê, rewşên ku ew hena wê weke hinek dîyarde wê xwe bi awayekî vekirî wê bidina nîşandin. Di vê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de wê dîrok wê weke rewşeka ku wê encama fahmkirina dîyardeyan jî bê. Yanî, wê weke têgîneka ku wê temenê wê li ser heyîn û hebûna dîyardeyan bê. Ber ku wê ya ku ew jîyankirîya wê li

wê bihizirê û wê ew wê, werênê li ser ziman. Tiştekî ku ew ne hatî jîyankirin wê, hatina wê ya li ser ziman jî wê nebê.

Di vê çerçoveyê de wê demê wê, tişta ku ew hatî jîyankirin wê, xwediyê hebûneka dîyardeyî bê. Mirov wê, li ser w hebûna wê re wê, weke rewşek dîyardeyî wê karibê wê hilde li dest. Ber ku wê li gorî têgîna dîyardeyê ku ew tişta ku weke dîyarde ku mirov wê hilde li dest wê ew hebê, wê demê ew tişt û ankû rewşa ku ew bûya jî ew heya û êdî ew ber ku ew heya wê weke dîyardeyekê wê karibê ew were hanîn li ser ziman bibê.

bi şîroveyî ku mirov ji xiyalkirina xwe wê, tiştekî karibê tevlî bike wê, di ya dîyardeyî de wê, ev nebê. Wê çi bûbê wê ew wusa weke wê were hanîn li ser ziman. Ber vê yekê wê têgîna dîrokî a dîyardeyî wê, weke ku ew dihênê li ser ziman wê, bi gotinî bi dîmenkirina rengê ku ew rûdaya û bûya û ankû ew hatîya jîyankirin wê werê hanîn li ser ziman. Di vê rewşê de wê, têgîna dîroka dîyardeyî ku ew bi wê re ew dihê li ser ziman wê, weke aliyekî giring ê ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman bê. Dîrok wê, dema ku ew bi dîyardeyî wê re ew hat hanîn li ser ziman wê li weke ku ew bûya ku ew were li ser ziman wê li wê were lêgerîn. Li vir, wê ev jî wê di vê xalê û nûqteyê de wê, hertimî wê were lêpirsîn ku ew dîroka ku mirov ew hanî li ser ziman wê çendî wê weke ya ku ew jîya ya. Yan jî ew dîroka ku mirov ew hanî li ser ziman ew çendî ji xiyalkirin, şîrove û vegotinîyê dûr bi tamî weke ya ku ew jîyaya bê. Li vir wê, di vê çerçoveyê de mirov wê dema ku wê dihênê li ser ziman ev hizir di serê mirov de çê dibê mirov, dikarê weke ku ew jîyane bi tememî weke di reng û dîmenê wê de di nivîsandinê de dîrokê werênê li ser ziman. Gelek dîrokzan wê, dema ku ew dihizirin wê werênina li ser ziman ku mirov nikarê weke ya ku ew jîyaya wê werênê li ser ziman. Lê gelek jî wê, werênina li ser ziman ku mirov wê karibê weke wê, dîrokê werênê li ser ziman.

Di dîroka bi rengê vegotinî de wê, weke serborîya kes, keseyet, civak û hwd wê bi vegotinî wê weke ku ew dihê zanîn di mejî de ku ew were hanîn li ser ziman bê. Vegotinên weke bi destanî, wêjeyî û hwd ku ew pêş dikevin wê, ew aliyekî wan ê bi rengê *dîroka bi vegotinê* re heya ku mirov wê werênê li ser ziman wê hebê. Li vir wê, vegotin wê, dema ku ew hat hanîn li ser ziman wê, weke ku mirov di demên bûhûrî de mirov, weke ku bi *´destana gilgamêş´* û hwd de dibînê wê, weke vegotina keseyetan û serborîya wan bê. Wê tişta ku ew hatîya serê wan û ankû di serê van de ew derbasbûya bê.

Di rewşa fahmkirina dîrokê de wê rêbazên weke yên bi vegotinê re wê, di demên destpêkê de wê pirr zêde wê pêşbikeve. Her wusa wê, dîroka vegotinê wê dema ku ew dîyardeyên xwe yên ku ew xwe bişipêrê ku ew di nava xwe de dihênê li ser ziman wê, li ser tevgerên ku ew hatina jîyankirin û hwd re wê hebê. Di nava dîroka vegotinê de wê, têgîna dîyardetîyê wê, temenê wê li ser mejûtîya wê bê. Wê were zanîn ku ew vegotin di demek bûhûrî de ew bûya. Wê newê zanîn ku ew kengî bûya. Yan jî wê were zanîn ku ew kengî bûya. Lê wê, di çerçoveyek dervî demê de wê bi rengekî vegotinî wê were hanîn li ser ziman. Dîroka vegotinî wê, di vê çerçoveyê de wê weke bi destan, helbest û hwd re wê bide pêşxistin.

Ev rengên vegotinê wê destpêka wan wê weke bi serborîyan re wê pêşbikeve. Piştre jî ew wê bibê malê girseyê. Dema ku ew bû malê girseyê wê, êdî wê ew xwe weke têgîneka bûya malê girseyê wê xwe bide nîşandin.

Di serdemên berê de wê, weke ku em di dema hûrî û mîtannîyan û heta ku piştre em di dema medîya de wê, kifş dikin wê rengekî dîrokê ê bi vegotinê wê hebê ku wê dîyartîya wê di nava wê de wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, di nava wê vegotina weke bi mejûyê re ku ew dihê kirin de wê, gelek qat û ankû piç wê werina hanîn li cem hevdû wê bi hevdû re wê ahengek wê di nava wan de wê were çêkirin. Di vê çerçoveyê de mirov wê kifş dike ku wê li ser rengê dîroka vegotinî de wê li ser levhanîna xosletan re wê wê ew ahenge wê, wê bi têgînî wê were çêkirin. Avêsteya ku wî(zerdeşt) nivîsandî wê, di vê çerçoveyê de wê, weke binetereka wê di vê çerçoveyê de wê têgîneka pirr baş wê bide me bê. Her wusa gelek bineter û nivîsên mîtrayîyan ku ew bi vegotinî ew di nava civake kurd de ew heta roja me jî ew dihên hanîn li ser ziman mirov, ku ew reng û şêwayê wan ên hatî afirandin weke vegotinê ku mirov li wê dinerê mirov, wê bi wê re vê rewşê bi awayekî pirr zêde vekirî wê kifş bikê.

Dîroka bi vegotinî wê, di aslê xwe de wê, di vê çerçoveyê de wê di destpêka xwe de wê, weke ku wê şêwayekî vêşarî ê weke kirdeyî ya dîyardeyî ew di xwe de dihawênê. Her wusa şêwayê dîrokê ê dîyardeyî, şîroveyî û vegotinî wê, xosleta wan ya hevbeş wê ew bê ku ew mejû na. Yan jî bi gotineka din wê, dîrok bin. Yanî wê, di demên bûhûrî ên berê de wê hatibina jînkirin bin. Yan ku wê wan bike weke têgîneka dîrokî jî wê, di aslê xwe de wê ev bê. Di rewşa dîroka şîroveyî de jî wê, gotinên rêzimanî û zimanî ên ku ew bi rengê dema bûhûrî dihên avakirin û lêkerkirin wê werina bikarhanîn. Di vê çerçoveyê de wê, hertimî wê şendayekê li ser têgînên gotinan re wê ji demên berê re wê bê şandin. Di rewşa vegotina de wê, têgîna dîrokê wê li ser rewşa mejûya wê re wê were hanîn li ser ziman. Li vir, rengê li hevdû hûnandina gotinan a di çerçoveya dema bûhûrî de wê, têgîneka dîrokî a pêwîstînî a dema bûhûrî jî wê bi xwe re wê biafirênê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê wê, werênê li ser ziman wê, vegotina dîrokê wê, weke hişmendîyeka ji rewşên têgînî ên fîzîkî ên demên bûhûrî bin. Di vê çerçoveyê de wê di rengekî têgîna bêja û kirdeyê, wate û gotinê, hebûn û hişmendîya wê û hwd de wê bi dualiteyekê wê were dîtin.

Têgîna dîrokê a vegotinî wê, bi xwe re wê, weke rewşeka ku ew serborî bê. Şîrove jî wê, weke aqil meşandina li ser mejûyê re bê. Her wusa wê di

vê çerçoveyê de wê têgîna dîyardetîyê wê, di navarok û temenê herdû alî û rengên şîroveyên dîrokî de wê, bi rengên din ên ku wê pêşbikevin re jî wê, xwe bide bicihkirin.

Di rewşa fahmkirina têgîna dîrokê de wê, li vir weke aliyekî giring wê, weke ku em wê li vir kifş dikin wê dîyardeyî wê weke têgîneka hîmî wê hebê. Têgîna dîyardetîya dîrokî wê weke rewşên ku ew hatina jîyankirin û li şûn mana wê, li ser wê re wê xwe bi wateyî wê werênê li ser ziman. Dîrok wê têgîna wê ya felsefîkî wê, her wusa wê dema ku mirov wê li vir di vê çerçoveyê de wê hilde li dest wê, minaq weke li ser rewş û pêvajoyên dîrokê hanîna li ser ziman hizra xwe û ankû nerîna xwe wê, weke aliyekî giring ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê fahm bike. Nerîna li ser dîrokê wê di temenê wê rewşa wê ya bi fahmkirinê a gelemperî de bê.

Mirov, dema ku wê li ser dîrokê dihizirê wê, her wusa wê, çawa wê werênê li ser ziman wê, li ser wê re wê bike ku ew pêşî xwediyê hizirekê bê. Ev jî wê, weke têgîneka ku wê taqabûlî rêbazê û şêwayê hanîna li ser ziman bikê. Şêwayê hanîna li ser ziman wê, hertimî wê weke aliyekî wê yê wê giring bê. Li vir, ya ku wê dîrokê bi vegotin, şîrove û her wusa rewşên wê yên din ên nivîsandinê ên weke bi dîyardeyî û hwd re ku wê biawayekî gerdûnî wê bide nîşandin û dîyarkirin wê, pêşî rengê jîyanekirina wê dîrokê, pêvajoyên wê yên civakî ên ku ew hatina jîyankirin û her wusa zanîna wê bê. Di vê çerçoveyê de wê, dîrok wê di rastîya xwe de wê temenê xwe yê hanîna li ser ziman wê di herîkîna wê jîyane civakî de wê werênê li ser ziman. Mirovekî ku ew ji têgîn û çanda civake xwe ku ew dûr a, wê ti tişt ji wî re ne weke wê bêwateya ku ew dirabê û dîroka wê civakê dike ku ew binivîsênê bê. Di serî de mirov, bo ku wê binivîsênê di çerçoveya gihiştina zanîn, ziman û têgîna wê civakê û li wan aliyan serdest û serwaxtbûnê re wê, hanîna wê ya li ser ziman wê temenê wê biafirê.

Li vir em vê jî wê bi gotina gîyane dîrokê re wê werênina li ser ziman. Ya ku wê temenê wê fahmkirina gîyane dîrokê wê biafirênê wê rewşa têkilîyî a di nava fahmkirinê û rewşa jîyanê a ku ew bi hevdû re di ahengekê de bin. Li vir, di serî de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, gîyane dîrokê wê weke têgîna wê ya ku mejûyî wê xwe bide dîyarkirin.

Di rewşa fahmkirina wê dîrokê de wê aliyekî ku wê wateyê bide wê dîrokê, nivîsandina wê û vegotin, şîrove û bi çavkanî û hwd hanîna li ser ziman jî wê, ew gîyanîya wê ku ew ji mejûyîya wê diafirê bê. Di serdemên kevnera de wê, di şêwayekî vegotinî de wê têgîna dîrokê a bi şîroveyê û çavkanîyê jî wê werê li ser ziman. Her wusa wê, dema ku wê bi vegotinî

wê were hanîn li ser ziman wê, weke ku mirov di nava civatên kurdan de wê, kifş dikin wê pirr zêde wê di şêwayekî de wê li koka wê vegotinê wê hertimî wê pirseka wan ya ku wê li yê ku ew divebêjê bê. Bi wê re wê, bixwezin ku wê fahm bikin ku ew ji kûderê tê. Ev jî wê, bi têgîna ka ew rast a û ankû ne rast a wê, were kirin. Di çerçoveya têgînek lêpirsînî de mirov dikarê wê pirs pirsîna wan fahm bikê.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman wê, dîrok wê di vê çerçoveyê de wê rastî û nerastîtîya wê, di aslê xwe de wê were kirin berlêpirsînê de. Ev rewş wê, piştre wê temenê de pêşketina têgîna dîrokî a rexnegir jî bê. Têgîna dîrokî a rexnegir ku wê di çerçoveya têgîna gelemperîya vegotinî de wê, rastîtî û bawerîtîya wê were lêpirsîn ku ew rast û bûya û ankû ne tenê weke hinek gotinên ku ew hatina li levhanîn bin. Di vê çerçoveyê de wê têgîna dîrokê a rexnegir wê, di aslê xwe de wê, di şêwayekî rast de wê karibê şîrove, vegotin û hanîna li ser ziman a dîrokê a bi tendûrûst ew bi xwe re pêşbixê. Li vir ji têgîna dîrokê a rexnegir mirov wê di serî de wê çi fahmbike, ew giring a ku mirov wê hilde li dest. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna dîrokê a rexnegir wê, di fahmkirina mirov a dîrokê de wê, ku mirov bi şêwayekî rast wê ne hilde li dest wê, karibê dîrokê vegûharênê tenê li vegotinna ku ew di demên bûhûrî de hatina jîyankirin ên zûwa. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku mirov wê dihilde li dest wê, mirov dikarê wê jî bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê dîrok wê, bi şêwayekî gelemper û giştîbûna wê re wê were li ser ziman.

Di rewşa nivîsandina dîrokê û rewşên yên dîyardeyî ên bi jîyankirinê re de wê, bi hişmendîya xwe re wê xwediyê rastîya xwe jîyanî bê.Dîrok wê, dema ku ew hat li ser ziman wê, teybetîya wê nivîsandina wê, ji ya têgînên din ên bi nivîsandinî û hwd wê cûdatir wê ew bê ku wê, hertimî wê rewşek zindîyî wê bi xwe re wê bi temenê xwe yê civakî ku ew dijî re wê biparêzê bê û ankû wê bi xwe re wê werênê li ser ziman.

Dîrok, wê bi xwe re wê weke ku wê xwediyê rewşek têgînî, gîyanî û pêşketinî bê. Bi dîrokê û pêşketinên wê re wê, mirov çawa jîyane wê, ew di wê de wê werênina li ser ziman. Xwe hanîna li ser ziman a mirov wê bê malê dîrokê. Têgîna bi gotina bûyîna malê dîrokê wê, di aslê xwe de wê bi dîrokê re hanîna li ser ziman re wê xwediyê wateyekê bê. Di dîrokê de wê, hertimî wê rewşên nû wê xwe bi demê re wê bi xwe hanîna mirov a li ser ziman re wê bidina dîyarkirin. Wê ew jî wê mohra xwe wê li dîrokê wê bixin.

Minaq di dema mîtannîyan de weke ku wê çawa wê ´key tuşrata´ ku ew weke nîşanaka gîyaneka nû û serdema wê bê, wê biheman rengî wê di dema medîya de wê dîyaqoş wê bi heman rengê wê xwediyê wê gîyanê û rengê bûyîna malê dîrokê bê. Di dîrokê de wê, tişt wê, werênina li ser ziman. Hatina li ser ziman jî wê, di wê de wê weke rewşeka afirîna wê bê. Her hatina li ser ziman wê, wekw afirandina dîrokê bê. Li vir em, divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê dîrok wê di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rengekî bi wateyî bê. Dîrok wê navê hanîna me ya li ser ziman û mejûya me ya ku ew hatî jîyankirin bê.

Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê dîrok wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rengekî bi wê re hanîna li ser ziman bê. Dema ku mirov tiştekî dihênê li ser ziman ew, weke ku ew hatî pêşkêşkirin jî wê were hanîn li ser ziman.

Dîrokê, em ku di çerçoveya roja me de wê bi wê re wê gotinekê wê dikarin wê werênina li ser ziman. Her wusa wê dîroka popûler ku ew derdikeve li pêş wê tenê wê weke ji aliyekî ve nerînê wê bi xwe re wê werênê li ser ziman. Dîrok, wê hinekî fêr û ezmûn bê. Bi dîyardetîya wê re wê cerb jî bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rengekî bê. Ya ku wê fêr û ezmûnê bi xwe re wê dide çêkirin jî wê hebûnên zindîyî ên weke mirov ku ew dikarin bihizirin bin. Em nikarin bêjin ku wê, rewşek weke ya hikimetî, sazîyî û hwd wê ew xwediyê wê fêrbûnê bê. Yê ku wê fêrbûnê di wê de jî wê karibê bide çêkirin wê mirov bê. Li vir wê dema ku mirov di roja me de em, li rewşên weke yên rêveber, hikimet û ankû desthilatdarîyan dinerin em, bi wê re wê dibînin ku ew hertimî wê di çerçoveya rewşeka ku ew hatî kifşkirin de wê bijîn bin. Wê întîbayê didina me ku ew ti fêr û ezmûnê ji dîrokê dernexin. Her wusa bi vê rengê jî wê, xwandinê bi dîrokê re ew nakin. Dîrokê mirov, nikarê wê tenê weke rewşek mejûyî a bûhûrî wê werênê li ser ziman. Mirov dikarê wê, ji wê zêdetir jî wê weke rewşeka têgînî a ku mirov wê fahm bike û wê di temenê kirinên xwe de wê, fahmbike bê. Mirov, dema ku weke kes û ankû sazîyek mazin û an jî piçûk ku mirov tiştek kir mirov wê, li mejûyê binerê ku ew çawa baş a. Her wusa ya ku ew hatîya jîyankirin wê, ew wê bi rengê ku ew jîyanbûya re wê, weke fêrekê bê ji mirov re. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê dema ku mirov dîrok hilda li dest wê, bi wê re wê jîyanek bi hemû serborî û jîyankirinên di wê de re wê were li ser ziman. Di rewşa hanîna li ser ziman a dîrokê de wê, bêgûman wê rewşa wê ya ku ew hatî jîyankirin wê, li gorî rewşa wê pêşî wê were dîtin û fahmkirin. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê

dîrok civakan wê bi wê re wê bi jîyane wan re wê fêr û ezmûnên wan ên bi wan re wê bi me wê bide fahmkirin. Her wusa wê, bi me wê bide fahmkirin. Em dema ku wê civakê wê hildina li dest wê, ji hemû aliyên wê ve wê dihildina li dest. Her wusa wê, hemû serborîyên wê, wê weke mejû wê werina ser ziman. Wê di dewame wê pêşketina wê de wê, ew weke aqil jî wê pêşbikeve. Aqil wê, weke rewşek dîrokî wê bi mejûyîya xwe re wê pêşbikeve. Piştî ku ew pêşket û pê de wê, li jîyanê wê hin bi hin wê serdest bê. Di vê çerçoveyê de wê, aqil wê bi pêvajoyên pêşketina xwe re wê pêşbikeve û wê serdest bibê. Pêşketina aqil wê ji aliyê dîroka civakî û gerdûnî ve wê, wateya wê li ser hizirkirin û aqil û pêvajoyên wê yên weke felsefeyê re wê, hebê.

Afrînerîya bi aqil re wê bi demê re wê pêşbikeve. Bi demê re pêşketina wê, di aslê xwe de wê, nîşanaka wê jî bê ku ew weke wê, bi demê re wê li gorî destûr, zagon û rêgezên mejûyê wê bi demê re wê xwe bi afirandinê re wê biafirênê jî. Di vê çerçoveyê de wê, afirandin wê, girêdayî destûrên dîrokî jî bê. Aqil wê, di çerçoveyek afirandinî a bi pêşnûmayî de wê weke xiyalkirinê bê. Lê di aslê xwe de wê, ne tenê wê xiyalkirin bê. Wê pêşnûmaya heyîna hebûnîya ji jîyanê a jîyanî jî bê. Di vê çerçoveyê de wê, her tişta ku ew hat û jîya wê, ew bi xwe re wê, weke rewşek heyînî, bi darêjkî û bi hebûnî wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Lê her tişt wê, tabî destûreka mejûyî a dîrokî a gûharînê bê. Her tişt di hundûrê dîrokê de pêktê. Wê di vê çerçoveyê de jî wê, her tişt wê bi dîrokê re wê hebê. Di dirokê de wê, tişt wê di demekê de wê hebê. Yanî wê ji destpêka bûyîna xwe û heta dawîya mirina xwe wê hebê. *Destpêk û dawî,* wê bi hebûnê re wê bi wate wê hebin. Li ser hebûnê re wê hebin. Destpêk û dawî, wê tiştekî din jî wê bi xwe re wê werênê li ser ziman. Ew jî wê rewşa dîrokî a bi mejûyî bê.

Di nava kurdan de wê gotineka pirr kevn û dîrokî wê hebê. Wê hertimî wê bibêjin ku ”wê, her tişt di mejûyê de vêşarî bê.” Ya ku ew di mejûyê de vêşarî ya ku mirov bihebûnî ew jîyankiriya û li şûn xwe hiştîya bê. Di vê çerçoveyê de wê di aslê xwe de wê, ev rewşa mejûyê ku ew di wê de hertişt vêşarîya wê, weke rewşek, têgînek û heyînek fîzîkî a zêhnî jî wê karibê xwe bide dîyarkirin.

Em dîrokê, bi dem û çîwarê re wê dikarin wê salix bikin.Tişt wê li deverekê wê bijî. Wê di çîwareyekê de bê. Di rewşa têgîna cihê û mekanê de wê, dem wê xwe bi wê serborîyê re wê bide nîşandin. Dema ku mirov wê jîyankirinê wê li wir kir wê, bi wê re wê hem wê ew dem wê weke ku wê salixkirinek wê bi wê deverê re wê li wê were û bibê û hem jî wê ew

dever jî wê bi demê re wê di rewşa wê ya ku ew bi wê di demê de ew heya wê xwediyî hebûna weke mejûyî bê. Di vê çerçoveyê de wê, têkilîya dem û cîwarê û ankû deverê wê, di rewşa hevdû bi têgînî afirandinê de wê xwe bi wate bikê re wê hebê. Em li vir wê jî wê, divê ku wê werênina li ser ziman ku wê dema ku jîyankirin nebûba wê dem wê nekarîba were salixkirin. Yanî wê, bi gotineka din wê hevdû bi hevdû wê salixkirin wê bibê. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa salixkirinê wê weke rewşek têgînî a ku wê têgîna cîwarê û ankû deverê wê di temenê xwe de wê bi hawênê bê. Cih û dem wê, bi hevdû re wê salixkirina wan wê li ser serborîyê re wê hebê. Di cihê de ew, serborîya ku ew bû wê, di demekê de wê ew bibê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, bi hevdû re wê bibin. Em dema ku dîrokê dihênina li ser ziman em, bahse hebûna xalk û civakan û dema wan a ku ew di wê de jîyane dikin. Ew dema ku ew di wê de jîyane ku em bahse wê dikin ew, dema ku ew di wê de ew salixkirî na û hena em, wê dihênina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, di çerçoveya cih, hebûn û demê de wê rewşa wan ya dîrokî wê bi dema wan ya bûhûrî, î ro û ya demên ku wê bijîn ên ku wê werina re wê dîroka wan wê were li ser ziman. Em li vir divê ku vê yekê wê werênina li ser ziman wê têkilîya demê û cihê wê bi hevdû ve wê, pirr zêde wê hebê. Emê nikaribin bêî yekê li ya din bihizirin bin. Wê bi hevdû re wê hebin. Her wusa dem û cih wê, bi jîyane ku ew li wê dihê jîyankirin re wê dîroka wê ya di demê de wê bi mejûyî wê hebê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, dem û cih wê di vê çerçoveyê de wê bi hevdû ve wê girêdayî wê hebin. Têkilîya demê û cihê wê, bi jîyankirinê re wê bi têgîna mejûyê re wê hebê. Mejû jî wê, dema bûhûrî û ankû wê dîrok bê. Dema bûhûrî wê, weke mejûya mirov wê dîrok bê. Mejû wê bi navê ya dema bûhûrî wê dîrokê wê bi xwe re wê werênê li ser ziman. Her tişt wê dîroka wê hebê. Her tişta ku ew bi heyînî heya û bi hebûna ew heya wê , ew bibê û ankû hebê. Bi bûyîna wê re wê, destpêka wê bibê. Piştre jî wê bijî. Piştî wê re jî wê, were dawîya jîyane xwe û wê bimirê. Lê ew dema ku ew ji destpêka xwe û heta dawîya jîyane xwe ku ew jîyaya wê, ew weke mejû û ankû dîroka wê, wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê têgîna dîrokê wê li ser tevger, kirin, xûy, heyînê, hebûnê û hwd re wê xwediyê rewşek xwe ya afirandinê bê.

.

**Dîrok û têgînên teorîkî ku ew pêş dikevin.**

Têgîna dîrokê wê çendî ku wê her pêşketina ku ew hebûna wê bi demê re xwe dide domandin wê dîroka wê hebê, her wusa wê bi heman rengî wê,

ew di çerçoveyeka dîrokekê de wê hebê. Em nikarin têgîna dîrokê weke hizreka felsefeyekê ku wê ew pêşxistîya û ew pêşketina wê dide kifşkirin wê werênina li ser ziman. Di çerçoveya têgînek gerdûnî û gelemper de wê têgîna dîrokê wê xwediyê rengekî xwe yê têgînî û felsefîkî bê. Lê wê di nava wê de wê weke ku mirov bi têgînî û felsefîkî wê kifş dike wê rengên hildana li dest û nêzîkbûnê ên weke bi mengîwerî(*îdealîsmê*)yê û pêzawarîyê(*metalyalism*) û hwd re wê hebin. Bi wê re em dikarin bahse rengê têgîna dîrokê a rasttîtîyê(´realîsmê´) jî bikin. Di vê çerçoveyê de di herîkîna mijarê de em divê ku van aliyan jî di nava mijara têgîna fahmkirina dîrokê de bi reng û şêwayê wan re hildina li dest û fahmbikin.

Li vir, dema ku mirov dikeve mijare têgînên dîrokî ên weke mengîwerî, pêzawerî, rastîtîyê û hwd de wê, hingî wê dîrok wê li vir wê nîqaşên li ser têgîna dîrokê wê bi awayekî xwezayî wê, li ser hebûn û nebûna dîyardetîyê re jî wê bimeşê. Li vir, di rewşa fahmkirina dîyardetîyê de wê, rewşa wê xwe li ser wê heyîna ku ew heyî re wê weke dîyardeyekê wê bide nîşandin. Tişta ku ew weke dîyardeyî ew heya wê, weke rastîyekê jî wê xwe bide nîşandin. Wê di vê çerçoveyê de wê, bi hebûnî wê xwe bide dîyarkirin. Lê her dîyarde ku em minaq mirov di dîrokê de wî bi wê re wî hildina li dest wê, bê dîtin ku wê bi mirov re wê pêşketin, pêşveçûn, gûharîn û hwd wê, bibin. Ev jî wê, weke rewşna ku em wan li ser têgîna dîrokê re wan bi têgîna dîyardeyî re wan fahm bikin bin.

Fahmkirina pêşketinê, pêşveçûnê û gûharînê û hwd, wan bi dîrokê re wê ev rewş wê di serî de wê li ser têgîna rastîtîya dîyardeyî re wê bin. Bi wê re wê têgîna dîyardeyî wê, weke rewşên ku ew gûharîn, pêşketin û pêşveçûn bi wan re çê dibin wê xwe bidina dîyarkirin. Li vir, di rewşa fahmkirina rewşên weke pêşketinê, gûharînê, pêşveçûnê, armancê û hwd wê, weke têgînna darazî ên ku wê ew bi hişmendîya me re wê werina pêşxistinbin bin. Di vê çerçoveyê de wê, ev weke hişa hişmendîyî û ankû hişê li ser dîyardetîyê re ku ew xwe dide dîyarkirin û mirov wê fahm dikê bê. Di dema ku wê dîyardetî wê were hildan li dest de wê, çawa wê were hildan li dest wê, yê ku ew wê dihênê li ser ziman wê destûr, zagon û rêgezên xwe yên fahmkirin, nêzîkbûn û hwd jî wê bide dîyarkirin. Minaq, dema ku mirov weke ´rastîyekê´ têgîna metafîzîkê wê bi dîrokê re wê hilde li dest û wê bikê ku wê fahm bikê wê, ew fahmkirin me ya bi metafîzîkê re wê çawa bê û wê di çi rengê û awayê de wê xwe bide dîyarkirin wê, her wusa wê ew di dema hanîna li ser ziman de wê, xwe bide dîyarkirin. Li vir, em divê ku di nava rewşa têgîna dîyardetîyê de bahse qatagorîyên dîyardeyî bikin. Di serî de wê di rewşa qatagorîkirina dîyardeyan de wê,

dema ku em li ser mejûbûnê û ankû dema bûhûrî re wê bihizirin emê wê, dîyardeyê weke ya ku mirov wê bidest bigirê û ya ku mirov wê nikaribê bidest bigirê wê xwe bide dîyarkirin. Ev jî wê, weke dû aliyên sereka bin. Lê çendî ku mirov bi wê re pêde diçê wê her wusa wê rengên qatagorîkî ên din jî wê bi têgîn û hişmendîyê re wê xwe bidina dîyarkirin.

Dema ku mirov li ser dîyardetîyê re li wê dihizirê wê, têgîna dîyardeyî wê weke rewşeka ya ku ew xwe dide dîyarkirin ku mirov wê bibînê bê. Her wusa li vir wê her dîyarde wê, ji aliyê têgîna dîrokê ve wê, weke zanînekê bê. Wê di vê çerçoveyê de wê were hildan li dest bê. Her dîyarde wê weke weke zanînê wê bi fahmkirinê re wê were dîtin. Yanî bi dîtinê re ya ku em qast dikin jî wê, rohnîkirin bê. Di dema fahmkirina rewşek dîrokî û ankû dîyardeyek wê de wê, bê gotin ku ´em, divê ku vê rewşê rohnî bikin.´ Li vir rohnîkirin wê, di wateya fahmkirin, têgihiştin û gihiştina wateya wê de bê. Her wusa rohnîkirina bi gotina dîrokê re wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê wateyekê bê.

Di nava têgîna dîrokê de mirov, divê ku vê yekê jî wê, bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê, her dîyarde wê weke zanînê wê di dîrokê de wê xwe weke fahmkirinekê wê bide nîşandin. Di çerçoveya têgîna heyînî a ontolojîkî de wê têgîna dîyardetîyê wê, weke hebûnê wê temenê fahmkirinê ê bi dîrokê re wê biafirênê. Hertişt wê, li ser rewşa hebûnê û lêkolînkirina wê re wê, xwe bide pêşxistin. Têgîna felsefîkî a ontolojikî ku ew têgîna wê ji hebûna bûjenî hat girtin û ew hizirkirina wê pêş dikeve wê, bi pêşketina aqilê felsefîkî ê razber re wê, li xwe vegerihê û wê afirandinê bi hebûnî wê bide pêşxistin. Di vê çerçoveyê de wê, têgîna hebûnî a dîyardeyî a dîrokî wê ji vê aliyê ve wê weke bi hizirkirina felsefeyê re wê afrînerîya wê, xwe bide dîyarkirin. Aqilê şenber ê destpêkê wê bi demê re wê bi razberî wê pêşbikeve. Pêşketina aqilê razber ê felsefîkî wê, nîşanaka afirandina bi aqil re jî bê. Bi gotineka din wê aqil wê, bi dest afirandinê wê bikê. Aqilê ku ew ji ya afirî û heyî ku ew pêş dikevê wê piştre bidest heyîndinê(afirandinê) û pêşxistinê wê bikê. Têgîna dualîteya aqil û hebûnê wê, bi dîrokê re wê weke felsefeyeka bi dîyardeyî bê. Mirov di çerçoveya fahmkirinê de wê, serî li wê dixê. Wê fahm bike. Her fahmkirina di dîrokê de wê weke têgînekê wê xwe bide dîyarkirin ku ew heya. Her pêşketina di dîrokê de wê, weke dîyardeyek objeyî wê xwe bide dîyarkkirin. Ji xwe, dema ku em li ser têgîna dîyardeyê re wê hildina li dest wê, weke têgîneka objeyî a têrkerî wê xwe bide dîyarkirin. Ber ku wê rewşa dîrokî wê di çerçoveyek bûyînî wê ew hebê. Ew wê weke têgînekê jî wê hebê. Di dîrokê de wê, dema ku mirov wê bi felsefe û ankû zanîna dîrokê re wê dihilde li

dest wê, bi aqil re wê were hildan li dest. Ev jî wê, rewşa dîrokê wê di çerçoveyek têgînî a aqil û hişmendîyî de wê bike ku ew were hildan li dest. Zanîna dîrokê, wê pirranîya pêşveçûnên bi aqil re wê bikeve nava xwe de. Mirov dema ku dixwezê ku wan fahmbike wê demê mirov serî li dîrokê û fahmkirina dîrokê dixê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, bi dîrokê re wê werina fahmkirin. Dîrok wê weke xate wê ya pêşketî û ankû pêşketinî bê.

Di çerçoveya zanîna dîrokê de wê, dema ku mirov wê dihizirê wê, demê wê li ser aqil re wê li ser darêjkê re wê, bi wê re bi şûn ve çûyîn û fahmkirina wê, xwe weke aliyekî ku mirov wê hilde li dest bê. Şêwayên pêşketina bi hizra dîrokê, şêwa, rêbaz, sazûmanî, nepenîyên ku ew hena wê weke wan her beş û ankû têgînên weke bi wateyî wê xwe bidina dîyarkirin wê, weke qadna ku mirov wan bi aqil bike mijarên lêkolînê bê. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku mirov wê li hundûrê têgîna dîrokê wê binerê wê, di serî de wê bi têgîna zanîna dîrokê re wê, dîrok çawa pêşket, di kîjan pêvajoyên pêşketinê re derbasbûya, li kîjan dem û devera wê, çi pêşketin rûdaya, bi aqil beşên weke stêrzanîyê, felsefeyê, metafîzîkê û hwd ku ew di kîjan rewş û pêvajoyê de bûyîna û hwd wê, bi awayekî qatagorîkî wê çendî ku wê bi serê xwe wê weke mijarekê wê werina li ser ziman wê bi heman renî wê weke mijarên lêkolînên bi zanîtîtîya dîrokî bin. Têgîna zanistîtîya dîrokê wê her wusa wê, dîrokê bi hemû dîyarde û pêşveçûnên wê re wê hilde li dest wan hem bi serê xwe wê fahm bike û hem jî wê di dewama hevdû de wê, bi hevdû ve girêdayî wê fahm bikê. Li vir, di fahmkirinê de wê têgîna dîrokê wê weke aliyekî giring ku wê, di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin bê.

Di demma fahmkirinê de wê dema ku mirov wê tgîna dîrokê wê bi dîyardeyîya wê re wê dihilde li dest wê, her wusa wê bi têgîna dîrokî a objeyî re wê ew were hildan li dest. Ji xwe ew, weke heyînekê wê hebê. Ber ku ew bûya. Bi wê re wê, dema ku mirov wê bi dest fahmkirina wê were kirin wê were kirin bê kirin wê, hingî wê bi wê re wê têgîna şûbjeyî a dîrokê wê bi aqil û ankû hişmendîya wê re wê xwe bide dîyarkirin. Li vir wê têgîna objeyî û şûbjeyî a dîrokê wê weke têgînna dîrokî wê bi demê re wê temenê pêşveçûnên ku ew bi nerîna ji aliyê ve jî bin. Minaq, têgîna şûbjeyî a dîrokê wê bi demê re wê li ser aqil re wê weke ku mirov bi têgînên mengîwerî û hwd re wê kifş dike wê, her destpêkê wê bi aqil wê ji deverekê û tiştekê wê bide destpêkirin. Têgîna bawerîya xwûdê û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve. Li vir, li gorî w têgînê wê dema ku mirov wan dîyardeyan wan dihilde li dest wê, hingî wê ew jî wê weke ´têgînna ku ew

afirîna´ wê werina hanîn li ser ziman. Dema ku mirov weke têgînna ew dîyarde ew hildan li dest wê, demê wê ew weke ku ew tenê bi hizirkirina me û aqilê me re ku ew hebin wê di rewşekê de wê xwediyê têgînekê bin. Bi wê rengê re wê, werina hanîn li ser ziman. Ji aliyê din ê dîyardeyî ve ku mirov dinerê wê, di serî de wê dîyardeyê weke bi heyînî herêkirina hebûna wê, weke aliyekî giring ku wê were kirin bê. Hingî wê têgîna dîyardeyê wê, weke hebûnekê ku ew heya wê xwediyê aqilê xwe jî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê ew weke aqilekî jî wê bi ji wê biriqîna têgîna wê, wê hebê.

Di nava jîyanê de wê, çûnûhatin, kirin û tevgerên mirovî û xûyên mirovî ku mirov wan dide nîşandin jî wê hebin. Her yekê wê, di vê çerçoveyê de wê bi bûyîna wan re wê weke dîyardeyekê wê xwediyê wê rengê fahmkirina wê bê. Lê li vir wê, dema ku mirov wan dihilde li dest wê demê mirov, wê çawa wê hilde li dest. Li vir, wê çi wê, wê kirinê, çûnûhatinê, tevger û xûyan û hwd wê bide dîyarkirin. Hêzek ku ew berê wê bi me dide kirin wê hebê? Her wusa wê ev jî wê, weke mijareka têgîna şûbjeyî ku wê bi wê re wê bi mengîwerî wê derkeve li pêş bê. Wê li ser wê re wê were hizirkirin bê.

Çi wan kirina dide kirin? Yan jî ew dîyarde ew çawa bûya û ji kûve afirîya û heya? Di vê çerçoveyê de wê, nîqaşên ku ew li ser wê koka wê bi felsefîkî ew dibin wê, li vir wê di rengê hizirkirina têgîna dîrokê û ankû pêşketina rengê şêwayên wê yên nivîsandinê û hwd de jî wê kifşkarîyek wan wê hebê. Di rewşa fahmkirina dîrokê de wê demê ku mirov wê dihizirê wê, ew weke aliyekî girin wê, xwediyê wateyê bê. Her tişt ku ew destpêkek wan hebê wê, hingî ew destpêka wan wê ji kû û kûderê wê destpê bikê? Wê çawa destpê bikê? Nîqaşên di çerçoveya fahmkirin û bi armanca gihiştina encamê de wê di vê çerçoveyê de wê derkevina li pêş. Wê rengê hizirkirinê wê bidina dîyarkirin.

Di rengê fahmkirin û nêzîkatîya li dîrokê de wê, bêgûman wê şêwayên fahmkirinê ên weke li ser mengîwerîyê û pêzawerîyê re wê hebin û wê pêşbikevin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de jî wê, ew wê weke aliyna nerînî ên giring bin. Di rengê têgîna dîrokî a di nava civake kurd de ku mirov wê, dihizirê wê, li vir wê di rengekî şêwayê ku wê herdû aliyan jî wê aliyekî weke aliyê hizir ku ev taqabûlî aliyê mengîwerîyê dike û aliyê ku ew taqabûlî aliyê pêzawarîyê dikê ê weke li ser dîyardetîyê re wê ji hevdû diafirin wê hildina li dest. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku ”wê, hertişt wê aliyê wê hebûnî wê hebê û bi wê re wê aliyê wê yê hizirkirinî jî wê hebê.” Ev wê, weke aliyekî têgînî

bê. Di serdemên Mîtannî û medîya de mirov wê bi têgîna Mîtra a li dema mîtannîyan û ya Zerdeşt a di dema medîya de ku wî bi avêsta re bi awayekî vekirî daya nîşandin wê di çerçoveyek têgînî a rastîtîyî de wê xwediyê çerçoveyek giştî bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê bi hevdû re wê hilde li dest. Bi gotineka din wê di çerçoveyek dûalîteya têgînî a rastîtî de wê têgîna dîrokê wê were hildan li dest. Li vir, wê ev herdû alî wê, weke aliyê hebûnî û têgînî wê ji hevdû dûr wê newina hizirkirin. Heta ku wê bi hevdû re wê, ew werina hizirkirin. Têgîna dîrokî a Zerdeşt wê, weke têgîneka rastîtî bê. Em jî bi wê bi hizra xwe ya bi vê xabata me re emê têgîna rastîtîyê bi asta wê ya pêşketî a roja me re wê weke têgîneka li ser herdû alîyan weke a giştî emê, wê werênina li ser ziman. Ber ku ev yek wê, weke aliyekî giring bê. Dîrok wê nêzîkatîyeka giştî ku wê karibê di temenê hemû aliyan de ew were li ser ziman bê. Wê giştî bê. Wê pirralî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê ji aliyê hebûnî û têgînî ve wê bi hevdû ve girêdayî wê di ahengekê de wê hilde li dest. Ya ku em wê, di vê çerçoveyê de wê, heta roja me wê, bi weke şêwayekî hizirkirinê jî wê, het roja me wê, di nava civake kurd de wê, kifş dikin wê ji vê rengê û şêwayê wê ne dûr bê.

Têgîna dîrokê wê, bi aliyê wê yên hizirkî ve ku mirov wê dihilde li dest wê, weke aliyekî hişmendî wê wê xwe bide dîyarkirin. Li vir wê dema ku mirov wê aliyê hiş û dîyardeyî wan ji hevdû dûrbike û her yekê bi serê xwe wan bike rengekê hizirkirinê ê dîrokê wê, hingî wê ev wê weke rewş û rengekî ku mirov wê ji wê aliyê wê dîrokê wê hilde li dest bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, weke têgînekê wê xwe bide dîyarkirin. Di çerçoveya têgîna wê ya dîyardeyî de ku mirov wê têgîna dîrokê wê dihilde li dest wê, hingî wê weke têgîneka ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê bigiştî wê fahm bike wê hilde li dest bê. Dîyarde û têgîn wê, di vê çerçoveyê de wê di awayekî têkilîya wan ya bi hevdû re wê, bi hişmendî wê di fahmkirinê de wê hevdû wê biafirênin. Her wusa wê, dema ku mirov kirinek kir wê, ew kirin wê weke rewşek û têgînek heyînî bê. Li vir ew kirin wê, weke dîyardeyekê bi serê xwe wê weke heyînêkê wê hebê bê. Lê ji aliyê din ve jî wê, weke aliyekî ku wê, bi têgînek darazî jî wê karibê wê ew were hildan li dest. Dema ku mirov ew kirin kir wê, ew kirin wê bi armanc û têgînekê wê were kirin. Di vê çerçoveyê de wê têgîna darazî a wê dîyardeyê wê, bi têgînî wê weke rengekî din ê hişmendî wê xwe bide dîyarkirin.

Li vir em divê ku wê jî li ser têgîna dîyardeyê û hebûnîya wê re wê bi têgînî wê werênina li ser ziman ku wê, her tiştê ku ew di demên bûhûrî de

ew jîyane de wê weke mejûyê wê ne bêwate bê. Di serî de wê, wateya wê, wê ji wê rengê bûyîna wê ya bûyî wê bibê. Li vir mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, bi demê re wê gelek rengên têgînî ên dîrokî wê derkevina li holê. Em î ro, dema ku em li şûn xwe dinerin em wê dibînin ku wê ji demên bûhûrî û heta roja me wê, hertimî wê weke tekoşîneka ku ew li ser hizir re bê wê di nava têgînên mengîwerî û pêzawerî re bê. Minaq, li dijî hizrên Hegel û ankû li ser wan re wê, hizrên marks wê werina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê weke dû aliyan û ankû du qûtûban wê werina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê du qûtûb wê piştî ku wê felsefe wê pêşbikeve û pê de wê, derkeve li pêş. Minaq hizrên ku wê li ser têgîna olzanîyê û ankû teolojîyê û hwd re wê werina li ser ziman wê, di çerçoveyeka têgînî a mengîwerî de wê, werina li ser ziman.

Hatina hizir li ser ziman wê, di vê çerçoveyê de wê, temenê pêşketina nerîn, dîtin û hizrên mirovî ên ku ew wan biafirênê û wan werênê li ser ziman jî wê biafirênê. Hizir wê têgînê û ankû hişmendîyê wê pêşbixê. Bi wê re wê, çendî ku wê hizir wê zêde bibê wê çerçoveya nerîn û fahmkirinê jî wê berfirehtir wê bikê. Li ser wê re jî wê, were li ser ziman. Lê hizrên felsefîkî wê weke hizrên razber bê. Her têgînên felsefîkî wê, weke têgînna razber bin. Her çendî ku wê, bi têgînîya şenber jî wê werina li ser ziman û wê werina hanîn li ser ziman jî bin, lê wê weke hizirna razber bin. Di vê çerçoveyê de wê felsefe wê, biawayekî wê rengekî hizirkirinê bi aliyekî ve wê ku ew ji jîyanê qût jî bê.

Lê li vir wê, ew têgînên razber wê, weke nerînna ku ew çerçoveya nerîn û dîtina mirov a li rewş, fahmkirin û hwd didina dîyarkirin jî bin. Di vê çerçoveyê de wê rewşa felsefeyê wê, weke rewşek teybet bê. Mirov dikarê ji destpêka bûyîna têgîna felsefeyê weke bi hatina hizrên wê re wê di çerçoveyeka dîrokê de wê bicih bikê û wê werênê li ser ziman. Lê hizrên wê yên ku ew weke hizrên razber ku ew dihên hanîn li ser ziman wê, weke ku ew ne tabîî demê bin. Di vê çerçoveyê de wê felsefe wê, xwediyê reng û rewşekê bê. Felsefe wê, li ser têgînên weke olê û hwd re wê hizrên xwe wê werênê li ser ziman. Di aslê xwe de wê, hizrên ku wê dem bi dem wê, bi rengên ´weke felsefeyê ne dîtina olê´ û ankû ji hevdû hizirkirina wan wê, hinekî wê di vê çerçoveyê de wê temenekî wan wê hebê. Ber ku wê, hizrên felsefîkî ên razber ku ew werina daxistin li jîyanê wê dem û pêvajoyek wan ya serborîyî ku ew bûhûrîya wê nebê. Di vê çerçoveyê de wê pirsgirêka kirinê û ankû ´piretîkê´ a felsefeyê wê bi têgîna felsefeyê re wê xwe bi awayekî wê bide dîyarkirin. Ev rewş wê, di rewşa fahmkirina wê ya bi dîrokê re jî wê weke rewşeka biheman rengî a bi pirsgirêk bê.

Rewşên dîrokê ên ku em wan weke rewşên têgînî û ankû ên ku ew hatina têgihiştin ku em wan dihênina li ser ziman wê, weke rewşna ku ew hatina jîyankirin bin. Temenê têgînên dîrokê wê bi mejûyê re wê hebê. Temenê têgînên mejûyê jî wê, bi serborîyên jîyankirî ên demên bûhûrî re wê hebê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê rewşeka wê ya teybet a ku mriov wê fahm bike wê hebê. Li vir, di aslê xwe de wê rengê têgîna felsefeyê a bi gotina dîrokê re wê, di vê çerçoveyê de wê ji ya têgîna razber a felsefîkî wê cûda wê hebê. Têgîna hizrî a dîrokî wê di vê çerçoveyê de wê li ser esas û temenê serborîyên ku em wan weke dîyarde ku em li vir piştê bidina wan û dîrokê şîrove bikin wê hebin. Di nava farqe têgîna dîrokê a têgihiştinî û ankû felsefîkî û ya felsefeyê bi xwe wê ev cûdahî wê di nava wê de wê hebê. Ber vê yekê wê rewşa têgîna dîrokê wê weke rewşek teybet bê ku mirov wê divê ku wê li vir wê hilde li dest bê. Dîrok wê temenê wê li ser têgînên mejûyî ên ku ew hatina jîyankirin bin. Jîyankirin wê li gorî rewşên têgînî ên destûrên fîzîkî wê xwediyê temenekî têgihî ê ku em li vir wê karibin wê fahmbikin bê. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna dîrokê wê weke têgîneka ku mirov wê dikarê wê di vê çerçoveyê de wê hilde li dest û wê fahmbikê bê. Têgînên dîrokî wê di vê çerçoveyê de wê hebê.

Li vir, em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê bi mengîwerî û hwd re wê têgînên olzanî wê, bi felsefîkî wê pêşbikevin. Li vir, wê têgînên olî wê, weke têgînên bi hizirkî ên ku ew hatina pêşxistin bin. Her çendî ku wê, di çerçoveya nekirinîya û ankû bêpiretîkîya felsefîkî de wê, bi şêwayekî razberê wê hebin.

Hizra xwûdê wê, weke hizreka ku wê di aslê xwe de wê, dema ku mirov dibêjê ku´ew,heya´ wê, temenekî wê, ya bi gotina ´ew, heya´ wê bi serborîyên ku ew bi wê re hatîya salixkirin û hatîyan hanîn li ser ziman re wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê reng û şêwayekê wê, ku mirov wê dikarê wê bi dîrokê re wê fahm bikê wê hebê. Dîrok wê, dema ku mirov wê dihizirê wê, mirov wê çawa wê li wê bihizirê. Her wusa wê, dema ku mirov wê li wê dihizirê mirov, wê ji rewşê bûyî wê bihizirê. Mirov wê, dîyardeyên xwe yên têgînî wê kifş bike û wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, têgîna dîrokê wê werê hanîn li ser ziman.

Di rewşa dûalîteya Zerdeşt de mirov wê kifş dike ku wê, ya ku wê were dîtin wê ew bê ku ew ji hevdû cudakirineka li ser zêhn û fîzîkê, laş û gîyanê û hwd re wê bikê bê. Ev jî wê weke ku wê were şîrovekirin wê bi aliyê fîzîk(di kurdî de wê ji fîzîkê re wê ´pêza´ û ankû ´pêzawa´ jî wê were gotin)î û laşî re wê bi reng û awayê pêzawerîkî wê were şîrovekirin û hanîn

li ser ziman. Bi aliyê zêhnî û gîyanî ve jî wê, li ser têgîna mengîwerî û hwd re wê, werê hanîn li ser ziman. Bi wê re wê dema ku ew hat hanîn li ser ziman wê li ser wê re wê şîroveyên wê bi hizirkî û piştre wê bi felsefîkî û hwd wê werina pêşxistin. Li vir wê, li ser wê re wê şîroveyên bi ´destpêkê´ hwd re wê werina pêşxistin. Her tişt wê, weke ku wê were hanîn li ser ziman wê, dîrokê de wê li ser rewşa hebûn û heyînê re wê destpêk û dawîya wê hebê. Her wusa ev wê di rewşa jîyane mirov de jî wê wusa bê. Minaq mirov, dibê, mazin dibê, kal dibê û piştre dimirê. Wê van pêvajoyan wê bi xwe re wê derbas bikê. Di vê çerçoveyê de wê mirov wê, van aliyan hemûyan wê bi xwe re wê werênê li ser ziman. Mirov wê di vê çerçoveyê de wê, bi rewşa *bûyîna xwe* re wê di mejiyê xwe de wê bigihijê têgîneka *´destpêkî´*. Wê bi rewşa *mirina xwe* re jî wê bigihijê têgîneka *´dawîyê´* û hwd jî. Ev hemû wê bi hevdû re wê werina li ser ziman. Di vê rewşê de jî wê dema ku mirov li feze, gerdûn û hwd jî wê bihizirê wê ev têgîn wê weke têgînna ku wê rengê hizirkirinên me wê, bi xwe re wê bidina dîyarkirin bin. Destpêka fezeyê ku weke ku ew dihê hanîn li ser ziman ´ ji xal û ankû nûqteyekê daya destpêkirin wê bibê. Di vê çerçoveyê de wê di şîrove û fahmkirina wê xal û ankû nûqteyê de wê, weke mijareka ku wê mejiyê mirov wê li ser wê bisekinê bê. Her wusa wê ew destpêkê çawa bûya û ku ew rast destpêkek bi vî rengî hebê, berî wê destpêkê wê çi hebê? Ev jî wê weke aliyna têgînî ku wê mirov wê mejiyê xwe wê li ser wê bi wastênê bê. Hizra zanîna berî xwe, dema xwe ya ku ew di wê de dîjî û demên ku wê werin wê, di mejiyê mirov de wê hertimî wê hebê. Minaq rêmildarên mîtrayî ên mîtannîyî û piştre ên medî weke mecûsî û û ankû ´magû´yî wê pirr zêde wê serî li ser wê biwastênin. Wan hertimî wê, xwestin ku ew bikin ku wê rewşna weke ´nîşanak´ ku ew ji wê karibin wê serborîyan fahmbikin û zanibin û demên ku wê werin ku mirov wê rastî çi wê were û ankû wê çi li pêşîya mirov bê ku mirov wê bijî û hwd wê, serê xwe wê pirr zêde wê li ser wê biwastênin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewş û têgîneka ku mirov wê, dikarê wê fahmbike û wê werênê li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de wê, têgîna *´baxtê´* wê were hanîn li ser ziman. Têgîna baxtê wê, weke têgîneka ku wê bi wê, wê were bawerkirin ku wê ji destpêkê û heta dawîya jîyanê wê, hatibê kifşkirin ku mirov wê çi bijî bê. Di vê çerçoveyê de wê bê gotin û bawerkirin ku mirov, çi bijî û çawa bijî wê ew hatibê kifşkirin. Wê jîyan wê, di wê de wê çi hatibê jîyankirin wê, ew hatibê nivîsandin ji pêş ve. Têgînên weke *pêwîstînîyê* û ankû *´determînîsmê´* û hwd wê, wê li ser wê re wê werina hanîn li ser ziman. Tiştên ku mirov wan karibê û wê bikê, yên ku wê mirov

nikaribê wan bikê û wê ti carî wê wan nekê û hwd wê werina hanîn li ser ziman. Minaq, şînorê mirov ê jîyanê wê, were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, aqilê mirov wê li ser wê bihizirê. Tiştên ku wê werina hanîn li ser ziman wê, li ser wan wê werê hizirkirin. Di demên sûmerîyan de wê, di mîtolojiya wan de wê hanîna li ser ziman a weke têgînekê ku wê çûyîna dervî dûnyê û di gerdûnekê de bi serwerî jîyankirin wê, temenê wê çi bê? Her wusa wê ev hizir wê, çi wê bide hizirkirin. Mirov ku ew di wê demê de ew neçûya fezeyê wê, di mejiyê xwe de wê bihizirê ku ew çûya fezeyê. Wê li ser fezeyê, stêr û rêwîtîya li fezeyê û hwd wê hizrên xwe wê werina li ser ziman.

Li vir em, bi vir ve girêdayî tiştekî din jî wê werênina li ser ziman û derbas bibin. Ew jî wê ew bê ku têgîna dîrokê ku mirov wê dihilde li dest bê. Di aslê xwe de ev dikarê xwe weke *şêwayekê* jî ew bide nîşandin. Di dema hildana dîrokê de wê, dema ku mirov wê dihizirê wê bi dîyardeyên wê re wê dihilde li dest wê, bi wê re wê aliyê wê yê têgînî û yê dîyardeyî wê xwe bide hanîn li ser ziman. Ji van aliyan ve bi *têgîna dîrokê a mengîwerî* û *têgîna dîrokê a pêzawarî* ve me hinekî li jor hanî li ser ziman. Di çerçoveya dîyardeyekê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman wê, her tişt wê, hem ew bi hebûnî wê hebê weke fenomenekê û hem jî wê hişmendîya wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê xwediyê awayekê ku mirov wê werênê li ser ziman bê. Lê li vir wê, di nava van herdû aliyan de jî wê weke ku ew wê ahengeka ku mirov wê li vir wê kifş bike wê, xwe bide dîyarkirin. Em nikarin hebûnê bêyî hişmendîya wê, li wê bihizirin. Her wusa em nikarin hizirkirinê jî wê bêî hebûnê wê bikin. Wê li vir wê, her yekê ji aliyê xwe ve wê di vê çerçoveyê de wê di awayekî hoyandî de wê xwe werênê hanîn li ser ziman bê. Ev jî wê, di vê çerçoveyê de wê, têgîhiştina aqil û hebûna tiştî a ku ew bi fîzîkî di jîyanê de heya wê bi hevdû re wê bide pêşxistin. Têgînîn dîrokî ên weke yên mengîwerî, pêzawarî, metafîzîkî, teokratîkî û hwd wê, tenê weke hizirna bin. Bi xwe ku ew hatina hildan li dest wê, tenê ji aliyekî ve wê awayekî dirbî û ankû formelî wê rengekî pêşketinê wê bi xwe re wê werênin. Wê fahmkirina li ser wan re wê, ne temem bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, her yekê wê ji aliyekê xwe ve wê, nerîna xwe wê pêşbixê.

Di vê çerçoveyê de wê ev wê weke aliyekî giring ê ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman bê. Her wusa divê ku mirov wê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, li vir wê çerçoveyek dîrokî a ku ew bi hişmendî û dîyardeyî ku ew li hevdû hoyandîya wê pêwîst bê. Di vê çerçoveyê de em dikarin wê li ser dûalîteya hiş û dîyardeyê re wê werênina li ser ziman. Ev

çerçova jî wê, weke çerçoveyeka rastîtî wê xwe wê werênê li holê û wê bide dîyarkirin Di çerçoveyek dîrokî a rastîtî de wê çerçoveya ku ew derkeve li holê wê, temenê wê wê di vê çerçoveyê de wê bi rengê xwe hanîna li ser ziman re wê, bide dîyarkirin. Ew jî wê, minaq wê weke ji dîyardeyê bi ber hizirkirinê ve ku ew li hevdû hoyandî na û hevdû dihênina li ser ziman bê. Hebûna dîayrdeyê wê, weke fenonemek heyî a ku ew bûya mirov wê herê bike û wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê bi têgîna wê ya giştî a rastîtî re wê hilde li dest. Wê hingî wê rengekî hildana li dest a bi çerçoveyî wê, xwe bide dîyarkirin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê rewşa fahmkirinê wê, di vê çerçoveyê de wê bi giringîyekê wê derkeve li pêş. Her wusa mirov dikarê wê jî wê, bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê, fahmkirin wê di çerçvoeya têgîna dîrokê de wê ji dîyardeyê bi ber hizir ve wê xwediyê şêwayekî hanîna li ser ziman bê. Rewş û rengê hanîna li ser ziman wê, bi hişmendî wê xwe bide dîyarkirin. Di çerçoveya têgîna dîrokê de wê, bi hizirkî wê, piştî ku wê aqilê felsefeyê wê pêşbikeve û pê de wê, temenê afirandinê wê bi hizir jî wê biafirê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê aqil wê, weke aliyekî giring bê. Pêvajoya aqilê felsefîkî a destpêkê ku mirov wê dikarê weke pêvajoya aqilê xwezayê jî wê werênê li ser ziman wê, zêdetirî wê li ser esasê rewşa bûjenîyê û bihişbûna wê re wê bimeşê. Di vê çerçoveyê de wê teherek, şêwayek û rêbazekê pêşketina aqilî a bi fahmkirinê û dîtinê a ji derve ve wê, xwe bide dîyarkirin. Bi gotineka din wê, ev rengê hizirkirinê a wê jî wê, di çerçoveyek ´şenber´ de wê, were hanîn li ser ziman. Yanî tişta ku mirov li wê dihizirê, wê fahm dikê û bi hizir wê dibînê wê ew kifş û dîyar bê. Wê li ser wê re wê ew were fahmkirin. Li vir, wê mejî û aqil wê di wê destpêkê de wê bi wê ve wê, girêdayî bimênê ku ew tişt û hebûna ku ew bi aqil hat dîtin ku ew *weke xwe* ew were dîtin û têgihiştin. Di pêvajoyên piştre ên aqil de ku wê aqil wê hin bi hin wê bidest afirandinê wê bike wê, ev pêvajo wê weke pêvajoyna ku wê aqil jî wê, bi ber pêvajoyek ´razber´ ve wê herê bê. Wateya têgîna razberîyê a bi pêşketina aqil re mirov wê, dikarê bi gotinekê jî bê wê, li vir wê werênê li ser ziman. Ew jî wê, di vê çerçoveyê de bê ku mirov wê dibînê ku wê çendî ku ew razberî wê pêşbikeve wê aqil wê ji xwezayê û dîtina wê, êdî wê derbas bibê. Wê bi wê re wê bi sînor nemênê. Wê bi dest afirandinê bikê. Di vê çerçoveyê de wê, hin bi hin wê ziman pêşbikeve û wê bi têgihiştin bibê. Wê li ser wê re jî wê bi şêwayên fahmkirinê re wê, were hanîn li ser ziman. Pêvajoyên felsefeyê ên dema kevnera ên weke ya dema medîya û hwd wê, weke pêvajoyek ku wê hem

aliyê felsefeya xwezayê a şenber û ya bi aqil a razber wê di nava hevdû de wê di zikhevdû de wê pêşbikevin bin. Pêvajoyên têgîna mengîwerîyê ên vê demê ku wê li ser esasê têgîna ´xwûdê´ û hwd re wê bidest pêşketinê wê bikin wê, nîşanaka pêşketina aqilê razber bin. Di vê demê de mirov, dikarê bihizirê, xiyal bikê, di xiyale xwe biafirênê û hwd. Ev hemû jî wê, weke aliyna ku mirov dikarê di dewame mijarê de wan bi wê re werênê li ser ziman bin.

Nepenîya bi gotina ´xwûdê´ re wê, di aslê xwe de wê xosletek ji wan xosletên aqilê razber jî bê. Mirov dikarê wê, di vê çerçoveyê de wê hilde li dest û wê fahm bike. Her wusa mirov, di vê çerçoveyê de wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, rewşa aqilê mirov ê razber ku ew pêş dikeve wê, xweza wê hin bi hin wê bikeve ast û rewşa duyem de. Wê bi wê re wê, aqil wê, derkeve li pêş. Wê gotinên aqilê razber ku ew di wan de wê têgîna armancê, sedemê û encamê wê bi hevdû re wê di xwe de wê bihawênê wê, bi wê re wê temen û çerçoveya afirandinê wê li ser rewşên hiş ên weke bi ´şenber´ re wê pêşbixê bê. Di dema wê de mirov dikarê vê yekê jî wê bi aqil re wê, werênê li ser ziman ku wê pêvajoyên aqilê razber wê, di rengê bi pêşxistina kirinê(piretikê) re wê bi ber pêvajoyek ´şenber´ a ku ew dixwezê wê pêşbixê ve wê herê. Di destpêkê de wê dema ku wê tişt wê were bihişkirin wê, ji ya tê dîtin û li berçav weke bi hebûnî wê bi ber hiş ve wê çûyîna bi razberî wê hebê. Lê wê piştre wê, ya ku wê di çerçoveya aqilê razber de wê derkeve li holê wê vajî wê bê. Wê ji rewşa aqilê razber ku ew bi ber kirinê û ankû piretîkê ve dikê ku ew pêvajoyekê pêşbixê bê. Têgîna weke ´kirina jîyanê´ û ankû ´piretîzekirna wê´ wê, di vê çerçoveyê de wê, rastiyekê wê bi xwe re wê werênê hanîn li ser ziman.

Her tişt wê, di nava xwe de wê, bi têgînî weke ku mirov wê bi aqil kifş dike wê hem yek bê û hem jî wê gelek bê.Ev jî wê,minaq weke rewşa rewşa hebûna civakekê bê.Bi gotina *´civakê´* re wê, her tişt wê weke ku ew yek bê. Em dema ku bahse civakê dikin em bahse yekê dikin. *`Civakek´* wê yekê wê werênê li ser ziman. Gelek civak, wê bahse pirr civakan wê bikê. Di vê rewşê de wê, têgîna gotina civakê wê weke gotineka qatagorîkî wê xwe bide dîyarkirin. Lê di aslê xwe de ev têgîna wê her tişt di xwe de hem yekbê û hem jî pirrbê mirov wê, dikarê di çeçroveya gotina civakê de jî wê hilde li dest. Di serî de mirov dikarê vê werênê li ser ziman ku wê cihê gotina ´civakê´ wê di dîrokê û di çerçoveya têgîna dîrokê de wê, çi û çawa bê? Mirov bi wê re wê jî dikarê hinekî serî li ser wê bi wastênê û wê fahm bikê. Civak wê bi hebûna xwe re wê, ji gelek endamên wê ku em wan weke kes û ankû mirovan wan werênina li ser ziman wê biafirê. Di vê çerçoveyê

de wê, civakek wê, di nava xwe de wê gelek kes û ankû mirovan wê bihawênê. Di vê çerçoveyê de wê civak û mirov wê, hevdû wê biafirênin. Ji gelek mirovan wê civak pêkwerê. Her wusa wê mirov û ankû kes jî wê, bi çerçoveyên nirxî, darazî û têgihiştinî û hwd ên civakî re wê bijî. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku wê jî di nava rewşa têgîna dîrokê de wê hilde li dest û wê fahmbikê.

Di rewşa fahmkirina rewşa civakê bi dîrokê re wê, dîroka civakê wê bi wê re wê were hildan li dest. Civak, wê weke rewşeka ku ew bi jîyane komî re wê pêşbikeve bê. Çerçoveya wê, temenê wê û têkilîyên wê yên navxweyî û hwd wê, bi wê re wê weke aliyna ku mirov wan dikarê hilde li dest bê. Her civak wê, ji endamên wê mirovan wê pêşbikeve. Di nava civakê de wê, rewşên ku wê hevdû temem bikin wê hebin. Minaq mirov wê, di nava jîyane malbatî de wê, bijî. Ew bi girêdanaka xizmî û bîolojikî ve wê bi malbatê ve girêdayî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê bi rewşa civaknasî, derûnî û hwd ve jî wê di rewşa jîyane ku ew dijî de wê were girêdan.

Di rewşa jîyane mirov di nava wê jîyane civakê de wê, bi çerçoveya giştî wê di nava civakê de wê bijî. Bi wê re jî wê bi çerçoveya tang wê di nava malbatê de wê bijî. Wê temenê xwe hanîna li ser ziman wê di nava wan de wê bijî. Wê rewşên jîyankirinê wê, dema ku ew bûn û pê de wê, weke dîyardeyna ku ew hebin bin. Her tişta ku ew hat jîyankirin wê weke dîyardeyan wê hebê. Mirov dikarê dîyardeyan bi serekeyî di bin sê serekan de wan werêninê li ser ziman. Pêşî weke dîyardeyên ontolojîkî bi heyîbûnê re wê hebê. Yanî wê tişta ku ew heya û bihebûna wê bahse wê bikê. Aliyê duyem wê tişta weke zindîya û dijî mirov dikarê weke aliyekî wê werênê li ser ziman. Her wusa di vê çerçoveya ontolojikî de wê hişmendî wê di rewşa dîyarker de wê xwe di nava têkilîyan û rewşa dîtin û dîyarkirina têkilîyan de wê xwe bide dîyarkirin bê. Ji aliyê din ê sêyem jî wê, bi serborî pêkhatîbûnê, ya bûyî, ya çêbûyî û hwd ku ew bûyîna û ankû pêkhatina, lê mirov nikarê wan weke bi cism û hacm werênê li ser ziman û bidest zant bike û destlêbide bê. wê. Di çerçoveya hizirkirinê de jî mirov dikarê wê hilde li dest. Tişta ku mirov hizirî û ew pêkhanî wê hebê. Hizirkirinek ku ew bû wê ew weke ku wê pêkhatibê bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê ew hebê. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê di çerçoveya aliyê sêyem de bahse têgînên weke yn menewîyetê û hwd jî bikê. Lê têgînên weke menewîyetê re ew, weke mijareka bi serê xwe jî mirov dikarê di bin vê serekeyê de wê, hilde li dest.

Di rewşa fahmkirina têgîna dîyardeyê de wê, dîyarde wê weke aliyekî giring wê hebê. Di nava civakê de wê, dema ku mirov bahse serborîyên wê dike wê, ew jîyankirinên ku wê jîyankirina û weke mejûya wê, li şûn wê mana mirov wê, bahse wê bikê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, ew weke aliyekî giring wê ew hebê. Mirov wê karibê wê hilde li dest. Wê fahm bikê. Têgîna ya pêkhatî weke minaq bi rewşa mejû û ankû dema bûhûrî a jîyanê re ku ew hatîya jîyankirin û derbasbûya ya wê, weke aliyekî giring wê xwe bide dîyarkirin bê. Her wusa mirov li vir wê yekê jî wê dikarê bahse wê bike. Di rewşa jîyane civakê de wê, rewşên ku ew wê jîyankirina wê weke dîyardeyna fenomenîkî ên nava wê, wê ew hebin. Mirov wê karibê wan werênê li ser ziman. Tiştekî ku ew pêkhatîya û ankû jîyanbûya mirov wê, nikaribê wê înkar bikê. Dema ku ew ez bêjim ´dîlanê, dibistana xwe li kurdistanê qadandîya´ wê, hingî wê bahse wê dibistana ku dîlanê li kurdistanê qadandîya wê were kirin bê. Yanî wê, bahse tiştekî ku ew pêkhatîya wê were kirin bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, dema ku dîlanê, dibistan li kurdistanê nexwendîbê, mirov wê nikaribê bêjê ku wê dibistan li kurdistanê û ankû dibistan qadandîya. Têgîna bi gotina ´..dibistana qadandî´ re wê, di hundurê wê de wê, weke kirdeyek wê ya vêşarê û ankû weke wateyeka di wê de sernûxûmandinî wê têgîna ´xwendinê´ wê, hebê. Li ser têgîna wê kirinîyê re wê ev wê, were li ser ziman. Yanî wê, li ser rewşa *demabûhûrî a bûyî* re wê, ev were li ser ziman û bê gotin. Yanî wê, li vir wê lêkere gotinê a wateyê wê li ser rewşa xwandînê a li kurdistanê a ji aliyê dîlanê ve ku ew hatîyakirin wê, were hanîn li ser ziman bê.Dema ku dîlanê dibistan qadandibê mirov wê, hingî wê bêjê ku wê ´dîlanê, dibistan xwandîya.´ Li vir wê, lêkerên demabûhûrî wê were bikarhanîn di hanîna li ser ziman û gotinên wê de ku em wê, werênina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa pêkhatî û ankû bûyî wê were li ser ziman. Ev rewşa weke bi gotina ´dîlanê, dibistan li kurdistanê qadandîya´ wê, weke lêkera gotinê wê di demabûhûrî de bê. Mirov wê, nikaribê bahse dema li pêş bikê a pêşarojê bikê û bêjê ku wê di wê de dibistan qadandîya. Li vir wê ev wê, ji aliyê mantiqî ve wê xalat bê. Em bi vê rewşê re wê jî wê kifş dikin ku wê mantiq wê, weke rewşa kirdeya rewşê a dîyarker bê bi têgîna hebûnê a dîyardeyî re. Di vê çerçoveyê de wê, di çerçoveya rewşekbûhûrî de wê ew wê, were li ser ziman. Wê ew wê, were dîtin. Di vê çerçoveyê de wê demê wê rewşa dema bûhûrî wê weke rewşek jînbûyî wê were li ser ziman. Wê, hingî wê ew rewş wê weke rewşeka ku mirov wê dikarê wê weke mejû jî wê, werênê li ser ziman bê.

Di rewşa fahmkirinê de wê, li vir wê, ev bigiringî wê hebê ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman ku wê rewşa bûyî wê di rewşa demî a dema bûhûrî de bê. Em vê, bi vê rewşê re wê, salix dikin di mejiyê xwe de. Em, dema ku bahse wê rewşa bûyî dikin wê, li ser têgîn û rewşa tiştekî ku ew bûya re wê, ew bahsa wê êdî wê were kirin.

Rewşa têgîna demê wê, li vir wê, her wusa wê bi têgîna dîrokê re wê bi têgîna dîyardeyê re wê, bime wê bide dîyarkirin ku ew tişta ku bûya ew di demekê de ew bûya. Her tişta ku ew bûya wê, di demekê de wê, ew bibê. Her tişta ku ew heya wê, di demekê de jî wê hebê. Lê li vir em vê jî wê, li vir wê kifş dikin ku ew lêkerîya ku ew li wê têgîna di demekê de ew hatîya kirin de wê têgîneka demabûhûrî bê. Her wusa mirov dikarê wê bi vê yekê û rengê wê, werênê li ser ziman.

Di rewşa dema bûhûrî de wê, ev yek wê bi awayekî vekirî wê were dîtin ku wê têgîna demê wê li vir wê, li ser rewşa bûyî a bûhûrî re wê, xwediyê salixkirineka bi xwe re bê. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê dem wê, weke aliyekî giring wê, hebê. Li vir em vê yekê jî wê, kifş dikin ku wê têgîna demê û ya rewşa bûhûrî wê, di çerçoveye li hevdû hoyandî wê xwediyê awa û rengekî bi rewşa *rûdanê* re bin. Rûdanîtî wê, li ser têgîna bûyî û bûhûrî re wê, were li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê têgîna rûdanê wê, di xwe de wê têgîneka pêkhatî, bûyî û a dema bûhûrî wê di xwe de wê bihawênê. Di vê çerçoveyê de wê, bi gotineka din wê, têgîn û wateya mejûyê jî wê di xwe de wê werênê li ser ziman. Ya ku wê rûda wê ew wê weke ku ew hebê. Yanî wê, aliyekî wê rewşa ya rûdayî wê bi awayekî hebûnê re wê, xwe bi awayekî wê bide dîyarkirin. Di rewşa têgîna hebûnê de wê, hebûn wê di giştîya wê de wê, bi dû awayan wê were li ser ziman. Hebûna ku ew heya lê ew deng a û hwd a, ku mirov wê nikaribê bidest bigirê, destlêdê, wê zantbikê, ne hacm û cism û hwd bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, têgîna dîyardetîyê wê, bi têgîna wê re wê, li ser rewşa bûyînê û rûdayînê re wê were li ser ziman. Bi gotineka din wê, serborî, nivîsandin, hanîna li ser ziman, vegotin, hizirkirin û kirina wê, û hwd wê, weke aliyna wê bin. Em nikarin vê aliyê dîyardeyî ê hebûnî wê, weke tiştekî bi gîranî, hacm û cism wê werênina li ser ziman.

Ev aliyê têgîna dîyardeyê ê bihebûnî em dema ku wê bi dîrokê re wê dihênina li ser ziman em wê, bi wê re dibêjin ku wê, dema ku ew dîrok hat li ser ziman ew weke tiştekî jîyaya û bûya bê. Di vê çerçoveyê de wê, ew hebê. Ev tişt wê, di demekê de wê bûbê. Ew piştî ku ew bû û pê de wê, ew mirov wê nikaribê wê red û înkar bikê. Her wusa dema mirov bêjê ku ´ew, nebûya´ ku ew bûbê jî wê ew ne weke ew nebûbê bê. Wê ew weke bûbe

bê. Yanî wê, ew hebê. Wê bi hebûnî wê weke dîyardeyekê wê xwediyê wate û hebûnê bê. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê wê werênê li ser ziman.

Aliyê din ê duyem jî ê hebûnî û ankû ontolojîkî ê bi dîyardeyî wê weke hebûna bi cism û hacm bê. Minaq, malek, darek, mirovekî, tayrikek, sawalek, kevirek û hwd, tiştên weke wan ku ew bi hebûnî li berçav hena, mirov dikarê wan bidest zant bikê, destlêdê û hwd bê. Di vê çerçoveyê de wê, ev aliyê rengê têgîna hebûnê ê dîyardeyî ê bi hebûnî bê. Ew tiştên ku ew bi vê rengê ew hena jî wê, her yekê wê destpêkeka bûyîna wan hebê. Wê ew piştre wê, pêvajoyeka jîyankirina wan bi zindîyî û ne bi zindîyî ku ew bijîn û ankû hebin wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, tiştên bi hebûnî ên weke bi zindiyî wê bibin, bijîn, pîr bibin û wê piştre wê bimirin. Tiştên nezindîyî jî wê, bibin pêvajoyek bûyînê wê derbas bibin, wê birizin û wê piştre wê ji hevdû wê bifelişihin û wê darêjka xwe wê bigûharênin. Minaq wê av wê bê dûkel di hewayê de. Dar wê, hişkbibê û piştre wê birizê û wê bibê ax. Bi vê rengê wê, ev weke pêvajoyeka ku wê bo hemû tiştên ku ew bi vê rengê ew bi hebûnî ew hena wê, bo wan wê bûhûrîner bê. Di vê çerçoveyê de wê gûharênê wê bi demê re wê bi xwe re wê bidina çêkirin. Ev jî wê, bide nîşandin ku wê gûharîn wê weke rewşek heyînî a li ser hebûna bi fîzîkî re a bi şenberî bi demê re wê hebê. Wê dîroka wê hebûna bi fîzîkî wê, weke dîroka wê pêvajoya wê têgîna gûharînê bê.

Têgîna dîyardeyî a hebûnî a ontolojikî ku mirov wê bike ku wê fahm bike wê, ew pêşî wê weke dîyardeyek serbixwe a xwe bixwe wê were fahmkirin. Di vê çerçoveyê de wê, ji aliyê fenomolojikî ve wê, bihebûnî wê were fahmkirin û têgîhiştin. Her wusa mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê hebûna wê ya heyî a bi hacm û cism wê, weke hebûneka ku ew di demê de ew heya û ew wê bihebûnî wê xwedî wûcan bê. Di rewşa wê de wê, wê hebûna wê, wê bide dîyarkirin ku wê ew di demê de ew hebê. Hebûn wê, di serî de wê, bi hebûnî wê hebê û piştre jî wê di dema ku ew di wê de heya wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê dema wê, wê weke *dema hebûna wê* ew wê were li ser ziman.

.

**Dîrok û dîyardeyîtî**

Em dema ku wê(hebûnê), bi demê re wê dikin ku wê fahm bikin wê di vê çerçoveyê de wê bi demê re jî wê weke ku wê xwediyê rewşek hebûnî bê. Her wusa mirov divê çerçoveyê de wê, dikarê wê werênê li ser ziman.

Li vir em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman hebûna ontolojikî weke têgîneka objeyî wê xwediyê rewşek heyînî a ku ew bi wê hebê bê.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Di çerçoveya têgîna dîrokê de mirov dema ku têgîna objeyê û ya şûbjeyê wê dikê ku wê hilde li dest wê, di vê çerçoveyê de wê di çerçoveya dûalîteyekê de wê were hanîn li ser ziman. Di dema ku ev aliyên objeyî û şûbjeyî bi demê re wê weke bi felsefeyê re ku wê di çerçoveya têgînên weke ´mengîwerî´ û ´pêzawerî´ û hwd de ku ew dihên ji hevdû cudakirin weke têgînna ku ew *´hatina têgihiştin kirin´* wê, wê hingî ew ahenge rastîtîya têgîna dûalîteya wan ya bihevdû re weke bi hebûn û aqil re wê xira bibê. Di vê çerçoveyê de mirov li vir vê yekê wê, werênê li ser ziman wê, pêşketina aliyê mengîwerî weke aliyê şûbjeyî wê, nîşanaka pêşketina aqilê razber bê. Di vê çerçoveyê de wê, di serî de wê pêşî divê ku mirov wê kifş bikê. Her wusa wê bi demê re wê aqilê şûbjeyî wê weke aqilê ku ew diafirênê wê werênê li ser ziman. Li gorî xosletên wê jî wê, bi demê re wê hizirkirin wê pêşbikevê. Minaq têgînên weke yên afsûnê ku ew bi wan re wê weke têgînna ku mirov wê dema ku mirov bihizirê ku wê bi wê hizirkirinê re wê biafirênê û hwd wê, werênina li ser ziman. Ev têgîn wê weke pêvajoya destpêkê a vê rengê pêşketina aqil şûbjeyî bê. Di vê çerçoveyê de têgînên ku wê bi aqilê afsûnê re wê, werê li ser ziman û wê bi wê re wê bê gotin ku ”mirov, bêjê bibe! wê bibê” û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê aliyekî aqil ku mirov di farqe de bê û ne farqê de bê wê, wê aliyekî kifşkirina aqilê mirov ê bi gotina *afirandinê* re wê werênê li ser ziman.

Her wusa mirov divê çerçoveyê de wê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê aqilê mirov wê weke aliyekî giring wê xwe bide dîyarkirin. Aqilê mirov wê di vê çerçoveyê de wê afrînerîya wê, derkeve li pêş. Her wusa mirov dikarê wê yekê wê werênê li ser ziman ku wê, aqilê mirov wê, di pêvajoya afirandinê bê. Her tiştên ku ew di jîyanê de ew bihebûnî ew hena wê, weke hebûnna wê ji aliyê aqil ve wê werina têgihiştin. Her wusa wê, dema ku aqil ew bi têgînkirin û hildana nava xwe wê, êdî wê, bi wê re wê li ser têgîna metafîzîka hebûnê wê, bidest hizirkirinê wê bikê. Bi wê re wê, hizra pêşî a ku wê were û derkeve li pêş wê, ew bê ku ´ev hebûn, ew çawa bûya´ û ankû ´ev hebûn, ji kûve hatîya û bûya´ û hwd bê. Ev jî wê, di v çerçoveyê de wê hizra *pêşhebûnê* wê bi xwe re wê biafirênê. Tabî hizra pêşhebûnê wê, weke hizreka ku wê mirov wê li ser wê re wê bihizirê û wê bike ku ew temenê hebûnê û ji kûve hatina wê fahmbikê bê. Hewldana fahmkirina ji kûvehatina hebûnê wê, weke pirseka ku ew wê, di her demê de wê di mejiyê mirov de wê, temenê lêpirsînên ku ew werina kirin bê. Di vê çerçoveyê de wê aqilê mirov wê li ser hebûnê û pêşhebûnê wê bihizirê. Wê bike ku wan bi hevdû re wan fahmbikê û wan werênê li ser ziman. Di

vê çerçoveyê de wê, hizrên weke yên li ser ´kokê´ û hwd wê, xwe bidina dîyarkirin. Kok wê weke ya ku wê ji wê hebûn di afirê bê. Di vê çerçoveyê de wê li ser hebûnê û demê re wê, ev li wê were hizirandin. Minaq hizirkirina li fezeyê wê, weke bi *´destpêka wê´* re wê, li ser wê were hizirkirin. Destpêka bûyîna fezeyê wê, weke ku ew di roja me de wê were hizirkirin ku wê, bi têgînî wê bê hizirkirin ku wê hebûna fezeyê wê xwediyê destpêkekê bê. Bi demê re fireh, kûr, dirêj û bilind dibê. Bi wê re wê çendî ku ew bû jî wê, di wê de wê tişt wê biafirin. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê ew werê hanîn li ser ziman. Ji destpêka wê û heta roja me ew hebûna wê, wê bi mejûya ku ew derbasbûya re wê dîroka wê, werênê li holê.

Di çerçoveya têgîna şûbjeyî de wê hizirkirina li fezeyê wê, weke aliyekî ku ew hebûna wê ya objeyî ku ew diafirê wê were fahmkirin bê. Bi wê re wê, were hanîn li ser ziman. Aqilê şûbjeyî wê temenê kirina gûman û hwd bê ku mirov karibê li ser wê re bihizirê û bi wê re pêde herê bê.

Li vir mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, dîroka hebûnê a bi hebûna wê re wê weke aliyê wê yê têgînî ê objeyî wê werênê li ser ziman. Her wusa, dema ku mirov wê hebûna ku ew heya ku mirov li wê dihizirê mirov wê, hingî wê têgîna têrkerî a bûjenî mirov wê kifş bikê. Her wusa bi wê re jî wê, ev têgîna wê, wê weke têgîneka ku ew ji wê hebûna wê, diafirê bê. Yanî wê, ew tişt wê hebûna wê, wê temenê wê hizirkirina bi darêjkî bê. Darêjk wê, bi reng û xosletên xwe re wê, ji wê rewşa hebûnî a ku ew heya, tê dîtin û mirov dikarê wê têbigihê bê. Bi wê re wê, ew were li ser ziman bê. Li vir, ev wê weke aliyekî hesanî ê fahmkirina bi hebûnê re bê. Yanî li vir mirov bo ku wê hebûnê wê, bi aqil fahmbikê wê, zêde tahbek wê zêde pêwîst nebê. Tenê ew hebûna wê tiştê a ku mirov wê bi çavê xwe dibînê wê ew temenê wê afirandina aqilê mirov bê. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, hebûn û aqilê hebûnê ku ew ji wê dihê derhanîn wê, weke aliyekî giring ê ku mirov wê di serî de wê fahm bikê bê.

Me hinekî li jor jî hanîbû li ser ziman ku wê hebûn wê bi dû aliyan wê were li ser ziman. Aliyê pêşî wê aliyê hebûnî ê bi hacm û cism bê. Wê bi fîzîkî û rewşî wê hebê bê. Ev alî wê weke aliyê hebûnî ê ku mirov dikarê destlêbide, hilde li dest, û hwd bê. Di vê çerçoveyê de ev hebûn wê weke hebûna ku ew dervî me ew heya bê. Ew hebûn ku ew qadehek bê ku ew bikeve ardê de wê bişikihê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa wê hebê. Lê aliyê din ê duyem ê hebûnî wê weke bi hebûnî hebê û mirov wê nikaribê destlêbide û wê bidest bigirê bê. Wê ne bi hacm û cism bê. Wê rewşa wê

ya fîzîkî wê nebê. Lê wê bi destûrên fîzîkî wê weke rewşekê wê hebê. Minaq, derxistina dengekî, çûnûhatinek û ew hebûna wê çûnûhatinê û hwd mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Reng, hacm û cismê dengê bi fîzîkî wê nebê. Mirov wê nikaribê wê di vê çerçoveyê de wê hilde li dest û bidest wê zant bikê. Lê ew piştî ku ew hat derxistin wê, ew hebê. Minaq ew qadeha avê ku ew heya ku ew ket ardê û zingênî ji wê hat û ew şikeşt, wê bi hebûna fîzîkî a qadehê re wê dengê wê jî wê bi weke dengekî bihebûnî wê were me. Mirov wê deng bike. Wê dengkirinê mirov wê dibihîzê. Mirov wê, nikaribê wê red bikê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa hebûna ku mirov li wê dihizirê wê, bi awayekî wê xwe bide dîyarkirin ku wê aliyekî fîzîkî ê weke bi hebûna qadehê re wê xwediyê destûrên fîzîkî bê. Lê aliyê din ê weke deng wê li gorî destûrên fîzîkî bê. Wê herdû alî wê bihebûnî wê hebin. Weke dîyardeyna wê hebin. Mirov di vê çerçoveyê de wê, dikarê wê werênê li ser ziman. Di rewşa gihiştina wê rewşa fahmkirina wê, wê weke aliyekî wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa mirov vê yekê jî wê, divê ku wê werênê li ser ziman ku wê, hebûna ku ew bi fîzîkî heya wê, weke hebûneka ku ew aqilê wê weke aqilê şenber bê. Wê di wê renge de wê, rengê hebûnê ê heyî û hwd wê xwe weke rengê wê aqilê wê jî wê bide dîyarkirin. Bi gotineka din wê, aqilê hebûnê wê xwe li ser wê rengê wê re wê bide dîyarkirin. Hebûn wê, ji wê wê aqilê wê were dîtin. Têkilîya nava hebûna hebûnî a bûjenî û aqil de wê, di vê çerçoveyê de wê xwedîyê şêwa û awayekî bê. Minaq ku mirov mirovekî dibînê mirov, wê bihizirê ku ew mirov heya. Mirov wê wî mirovî wê nas bikê. Wê bi awayê ku mirov ew dîtîya wê ew hebûna wî wê, were li berçav û wê were dîtin. Di vê çerçoveyê de ew hebûn wê, weke hebûneka şenber bê. Ev hebûnên ku ew bi vê rengê weke hebên têrkerî(objeyî) ku ew hena wê, xwediyê awayekî hebûnî ê bi rewşa fîzîkî bin.Minaq gotinên weke ´xalk´,´civak´, ´şariştanî´, ´mirovatîyê´, ´vîn´, ´bawerî´, ´pîrozî´ û hwd, wê weke gotinna aqilê şûbjeyî bin. Ew hebûna wê, salixkirina wê û dîtina wê, wê dîsa li ser wê rewşa hebûna mirov a bi hevdû re jîyankirinê bê. Dervî wê, wê, ti darêjkên wê, nebin.

Em ku wê, bahse dîrokê û navaroka dîrokê û ankû demên wê yên bûhûrî dikin em, pirr zêde bahse gotinên weke ´mirovatîyê´, ´civakê´, ´xalkê´ û hwd dikin. Em li vir wê jî di dewama mijarê de wê, divê ku wê hildina li dest û wê fahm bikin.

Têgîna dîyardeyî a dîrokê a şûbjeyî û objeyî wê, weke aliyna ku mirov wê bi teybetî wê hilde li dest bê. Li vir wê, di çerçoveya têgîna dîrokê de wê têkiliya rewşa şûbje û objeyê wê çawa wê were danîn wê, ev wê weke

aliyekî giring bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku mirov, di çerçoveya têgîna dîrokê de wê hilde li dest mirov divê ku van herdû aliyên weke şûbje û objeyê bi hevdû re wan hilde li dest. Li vir mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, çawa wê, weke aliyekî ku mirov wê karibê wê hilde li dest bê. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna şûnjeyî wê, weke aliyekî afrînerî ê dîrokê wê, were dîtin. Em nikarin wê tenê weke aliyekî ´îdealsmî´ bi tenê wê hildina li dest. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê hilde li dest. Di vê pêvajoyên pêşketina jîyane de wê, bi demê re wê bi mirov re wê keseyet wê biafirê. Wê li ser bihevdûrebûna mirovan re wê xalkîtî, civaketî û piştre wê têgînên weke yên ´şariştanîyê´ wê pêşbikevin. Her wusa ev têgîn wê di çerçoveya pêşketina jîyanî de wê weke aliyna şûbjeyî jî wê karibin xwe bidina dîyarkirin. Lê li vir mirov divê ku wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, di çerçoveya heyîna bûyî û heyî de wê weke dîyardeyna ku mirov ew hena jî wê xwe bidina dîyarkirin.

Di salixkirina têgînên weke têgîn xalkî, civakî, şariştanî û hwd de wê, li vir wê pêvajoyna jîyanî ên bi aqil wê werina derbas kirin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, di rewşa bi têgînê de wê, xwe bi awayekî wê, bide dîyarkirin. Têgînên weke yên ´şariştanîyê´ wê ji yên weke yên civakî û hwd, wê zêdetirî wê şûbjektîvîya wan li pêş bê. Ew wê, weke têgînna ku ew pêş dikevin û li dora wan jîyanek ava dibê bi rengê wê re wê, xwe bide dîyarkirin. Pêvajoyên jîyane civakî wê, weke aliyna ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, têgîna şariştanî wê, weke aliyekî giring ê ku mirov dikarê wê hilde li dest bê.

Lê li vir wê, pirr giring bê ku mirov rewşa têgînên weke şûbjeyê û objeyê, têkiliya wan ya bi hevdû re wê bi awayekî rast wê hilde li dest. Li vir wê, di temenê fahmkirinê de wê, aliyekî giring û temenê nêzîkatîyeka rast wê biafirênê jî wê ev bixwe bê. ber vê yekê mirov, divê ku li vir wê, zêdetirî balê bikişênê li ser wê.

Di rewşa fahmkirina têgîna şûbjeyê û objeyê de wê, ya ku wê were dîtin ku wê ew bê ku wê, dema ku mirov bi têgîn û felsefeya dîrokê re wê şîrove dikê, wê were dîtin ku wê weke hebûnên objeyî tişt û hebûnên ku ew hena bin. Minaq, mirov, dar, bi zayendî jin, sawal, ajal, av, kevir û hwd bê. Tiştên ku mirov wan di jîyanê de wan di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî giring ê objeyî ê heyînî û hebûnî bin. Her wusa bi wê re jî wê, di vê çerçoveyê de wê têgîna objeyî wê li ser rewş, tişt û hebûnan re wê hebê. Lê bi têgîna objeyê re wê, dema ku mirov wê dihizirê wê, weke ´tişta ku ew bi hebûnî heya û mirov dikarê destlêbide û wê hilgirê´ û hwd bê. Yanî

wê, weke tişta ku ew heya û şenbera bê. Di vê çerçoveyê de wê weke rewşeka têgînî bê. Di têgîna objeyî a dîyardeyî de wê, rewşa ku ew bi hebûnî wê hebê wê bi hacm û cism bê. Wê bi fîzîkî wê hebê. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê, bi wê re wê, werênê li ser ziman wê, tiştên ku em weke têgînên objeyî ên ´destpêkê´ wan werênina li ser ziman wê, weke tiştên ku ew dervî me afirîna û hena bin. Ev jî wê, weke dîyardeyna ku mirov dikarê wan di vê çerçoveyê de wan werênê li ser ziman bê. Em li vir dikarin dîyardeyên objeyî weke dû beşan wan werênina li ser ziman. Tişt û hebûnên ku ew bi xwe bûna weke dar, av, hewa, ax û hwd bê. Ev wê, weke tiştna ku mirov wan dikarê weke tiştna ku ew hena wan werênê li ser ziman. Aliyê din ê dîyardeyîya objeyî wê weke tişt û hebûnên ku mirov wan bi mejiyê xwe re wan tefkîr dike û dîzayn dike û derdixe li holê bê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê li vir ew dîyardeyên objeyî ku wê weke rewşna ku wê pêşketina têgîna me ya şûbjeyî wê di wê de wê kifşkar bê wê, xwe bidina dîyarkirin bê. Minaq wê dema ku mirov wê ardekî wê biçênê wê ji wê genim bidest bixê. Wê dema ku mirov, xanîyek û ankû malek çêkir wê di wê de bijî. Lê ev têgînên ku wê, dîzayneke şûbjeyî wê li wan bê, wê li ser rewşên gûharînên bi darêjkê re bin. Minaq, berê hebûna malê wê mirov wê, di şikeftan de wê bijîyan. Ev têgîna jîyankirina li şikeftê wê bi aqil wê weke biriqîna wê, wê pêşxistina malan weke ku mirov dixwezê wê bibê bê. Yanî wê, weke aliyê wê wê yê afrîner wê, li ser têgîna şûbjeyê re wê xwe bide dîyarkirin. Mirov dema ku wê kirinekê bikê wê, ew wê kirinê wê bi hiş wê bikê. Minaq wê li rex hevdû wê malên xwe ava  bikin. Wê bi hevdû re kar û xabatê wê bikin. Wê bi hevdû re wê gelek kirinan wê dem bi dem wê bikin. Di vê rewşê de wê ya ku wê weke aqilê me yê wê, weke encama wê dikê bê.

Di rewşa fahmkirina rewşa gihiştina têgîna vînê de wê, her wusa wê mirov wê di vê çerçoveyê de bê. Tiştên weke vînê, xwestekê û hwd wê, ne tiştna bihebûnî ên ku mirov wan ne bi fîzîkî wan werênê li ser ziman bin. Wê *weke têgînna bi hiş* wê hebin. Ev têgînên bi hiş wê, weke rewşna ku mirov wê bi wê re û di çerçoveya wê de dihizirê bê. Bi wê re jî wê mirov wê, bi wê hişê re wê, xwediyê wê rewşê bê. Her wusa vîna xwestina kirinê. Vîna têkilîdanîna bi hevdû re û hwd, wê hebin.

Rewşên weke yên şûbjeyî ên ku em weke dîyardeyna têgînî ên bihiş wan werênina li ser ziman wê, di vê çerçoveyê de wê weke rewşna ku mirov wan dijî bê. Her wusa wê, dema ku mirov ew vîn da nîşandin wê, ev têgîna vînê wê piştre wê hebê. Wê di vê çerçoveyê de wê, ev wê weke rewşna afrîner ên li ser rengê aqilê şûbjeyî bê. Her wusa têgînên weke yên xalkî,

civakî û şariştanî û hwd wê, weke têgînna ku mirov bi şûbjeyî û têgîna vînê a bi hiş re wê, werênê li ser ziman. Ji aliyê têgîna objeyî a dîyardeyî ve wê, tenê wê weke li holê ku ew heya wê mirov wê hebê. Mirov wê, dema ku mirov wî şîrove bikê wê çawa wê bi komî wê têgîneka xalkî, civakî û hwd wê werênina li ser ziman. Wê çawa wê şariştanîyekê wê pêşbixê? Ev rewş wê, weke rewşna ku mirov wan dikarê wan werênê li ser ziman bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, ev têgînên şûbjeyî wê, xwe wê weke rewşna wê bidina dîyarkirin. Mirov wê, tişta ku wê dikê wê dema ku weke xalkî bi hevdû re dijî, weke civakî xwe pêşdixê, weke bi şariştanî pêşve diçê û hwd wê, ev kirin û çalakîyna mirovî ên bihiş jî bin. Mirov dikarê wan di vê çerçoveyê de jî wan werênê li ser ziman. Her wusa mirov wan di vê çerçoveyê de jî wan werênê li ser ziman. Têgînên weke têgînên şariştanî û hwd wê, têgînên bi hişmendî bin. Hişmendî wê bi hiş wê, di wê çerçoveyê de wê xwe bi afirandina xwe re wê di jîyane mirov e wê weke vînekê wê xwe bide dîyarkirin bê. Minaq wê, dema ku mirov wê aqilê bihiş di dema şariştanîyê de wê hilde li dest wê ev wê weke aliyekî ku wê ew aqil wê bi vîn bibê wê bê. Bi sazûmanbûna wê, di vê çerçoveyê de mirov, dikarê weke rengekî bi vînî a bi aqilê şariştanîyê re wê werênê li ser ziman. Ev rengê wê vînê jî wê bi şêwayê rêxistiniyê wê xwe bide dîyarkirin.

Mirov wê, weke dîyardeyeka objeyî wê, temenê wê hebûna bi hevdû re bûnê re bê. Ji aliyê hebûna mirovî ve mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Yanî wê, temenê têgînên xalkî û civakî wê, bi hebûna mirov a bi hevdû re bê. Lê têgîna civakî wê, aliyekî wê yê têgînî ê weke bi hişmendî wê hebê. Her wusa wê hinekî jî bi rengê aqilê şariştanîyê re mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Aqilê bi hiş ê şariştanî wê, weke rengekî hizirkirinê ê ku mirov wê çawa wê bi hiş wê xwesteka xwe wê bide nîşandin û wê bijî bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna şariştanîyê wê dema ku wê ew pêş dikeve wê têgînên olî wê pêşbikevin. Di vê çerçoveyê de wê, têkilîyeka têgîna şariştanîyê wê ji aliyekî ve wê pêşketina olî ve wê hebê. Her wusa wê, têgîna olî wê, weke têgîne a bi bawerî wê li ser bawerîyên xwe re wê bê malê girseyan. Wê di vê çerçoveyê de wê, bi hevdû re wê bihizirin. Ev bi hevdû re hizirkirin wê, weke aliyekî giring bê. Di vê çerçoveyê de wê mirov wê çawa wê di çerçoveya jîyane xwe de wê, weke aliyekî giring wê, karibê wê bijî. Di vê çerçoveyê de wê, çawa mirov wê bijî wê, li ser keseyetîyê û pêşketina wê re wê xwe bide dîyarkirin. Keseyet wê, rengekî pêşketina rengê jîyane civakî û şariştanî jî bê. Her wusa mirov dikarê wê

di vê çerçoveyê de jî wê werênê li ser ziman. Keseyet wê weke aliyê têgîna şûbjeyî ê civakî a afrîner a di jîyanê de bê.

Di dîrokê de wê, dema ku wê bahse keseyetîyan wê werê kirin wê, keseyet wê bi pêşketina xwe re wê weke fektorek giring wê derkeve li pêş. Her wusa wê weke fektorek kifşkar jî bê. Di vê çerçoveyê de wê, di dîrokê de wê têkilîya di nava mirov û civakê û hwd re wê, hertimî wê li ser wê pêşketina keseyetîyê re wê were lêpirsîn. Em dema ku wê, dihildina li dest wê, weke aliyekî di civakî wê li vir dihildina li dest. Lê ev alîyê ku em weke aliyê civakî wê dihildina li dest wê weke aliyekî temen, hîm û bingeh bê. Di vê çerçoveyê de wê keseyet wê bo civakê wê hebê.

Têkiliya keseyetîyê û ya civakê û ankû xwezayê wê, li ser kirin, xûy û çalakiyên wê re wê werina li ser ziman. Xûy, kirin û çalakiyên keseyetîyê wê hertimî wê di rewşeka ku ew diafirênê de bê. Ew çûnûhatin, kirin, dananîşandin û hwd wê, weke rewşna pêkhatî wê di vê çerçoveyê de wê, xwediyê alî û rewşek giring bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê keseyet wê, weke aliyekî bi hişmendî bê. Li ser aqil, hiş û zanînê re wê xwe biafirênê. Çendî ku xwe afirand jî wê, xwe bigihijê wê ast û sîyane afirandinê jî.

Em dema ku ji aliyê keseyetîyê ve li civakê dinerin em dibînin ku wê were dîtin ku weke ku civak ji keseyetan pêktê. Her wusa wê, di nava civakê de wê çend mirov bijîn bi komî wê ew wê hebûna civakî wê werênina li holê. Li vir wê, dema ku mirov wê hebûna civakê û wê keseyetîyê wê dihildina li dest wê, demê miov divê ku wê keseyetîyê û têgîna mirov ji hevdû cuda wê hilde li dest. Mirov wê weke kesekî ew bi hebûnî heya û li jîyanê dijî bê. Her wusa kes û ankû mirov wê, bi hebûnî wê civakê wê bihebûna xwe re wê biafirênin. Di vê çerçoveyê de wê, bihevdû re jîyankirina wan wê, weke kom wê werê bi navkirin. Di vê çerçoveyê de wê komîtî ku ew pêş dikeve û bi ber civaketîyê ve diçê wê ew kes û mirovtî jî wê bi pêşketinên bi xwe re wê *keseyetîya xwe* wê pêşbixê. Li vir wê, temenê keseyetîyê wê kes û ankû mirov wê biafirênê. Her wusa wê keseyet jî wê, temenê pêşketina civaketîyê û hebûna wê biafirênê. Keseyet wê, dema ku mirov wê bi teybetî wê weke mijareka serbixwe wê hilde li dest wê, di serî de wê, weke aliyekî wê yê giring wê aqil, hiş û zanîn wê di hîm de wê derkeve li pêş. Di vê çerçoveyê de wê, keseyet wê, tişta ku ew jîya wê di xwe de wê weke ezmûn û fêrbûnekê wê bi hawênê û ankû wê biparêzê. Wê li ser wê re wê pêvajoyên pêşketinê ên keseyetîyê wê bi xwe re wê bijî. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê keseyet wê, weke aliyekî giring wê, xwe bide

dîyarkirin. Keseyet wê, hertimî wê, weke aliyekî giring ê ku mirov wê, di vê çerçoveyê de di çerçoveya pêşketin û pêşveçûnên ku ew dibin ên weke aqil re wê jî wê ji aliyekî temen ve wê hilde li dest. Aqil, hiş û zanîn û hwd wê, bi demê re wê pêşketina wan wê, çendî ku wê xwe bi keseyetîyê re wê bike ku ew werênê li holê û bide dîyarkirin jî lê wê, keseyet jî wê ji pêşketina aqil, hiş û zanînê û pêşxistina wan jî re wê, weke hîmekî bi fenomenî bê. Yanî wê, ew jî wê temenê wê pêşketina aqil bê. Li vir, têkiliya aqil û keseyetîyê wê di vê çerçoveyê de wê di awayekê de wê bi giringî wê bihevdû re wê hebê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, rewşa aqilê mirov wê, di vê çerçoveyê de wê, xwe bi wê re wê werênê li ser ziman. Keseyet wê bi hebûna mirov a mirovî re wê weke rewşek zindiyî wê hebê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, weke rewşek hebûnî wê hebê. Rewşa keseyetîyê wê, di vê çerçoveyê de wê bi giringî wê xwe bide dîyarkirin. Keseyet û aqil wê, di vê çerçoveyê de wê, bi rewşên pêşketinê û hwd re wê, li hevdû hûnandî wê hebê. Wê pêşbikevin. Di vê çerçoveyê de têkiliya mirov û aqil wê, di rewşa civakê de wê bi têkiliya civak û keseyetîyê wê, xwe bi awayekî ve wê bide dîyarkirin. Mirov û aqil wê, di vê çerçoveyê de wê hevdû bi hevdû re wê di pêvajoyek pêşketinê de wê bidin derbaskirin. Di vê çerçoveyê de ev pêvajoyên pêşketinê wê, di nava civakê de jî wê, weke aliyna ku wê temenê pêşveçûnên keseyetê û civakê ên bi hevdû re ku ew jî bi awayekî li hevdû hûnandî wê bijîn bin. Tabî li vir wê keseyet wê di rewşa pêşketina mirov a bi aqil re de wê, were li ser ziman bê. Yanî mirovê ku ew bi aqil pêş dikeve wê bigihijê keseyetîyê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê rewşekê wê bi xwe re wê bijî. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê mirov wê bi aqil re wê keseyetîya xwe biafirênê. Lê çendî ku mirov keseyetîya xwe bi aqil afirand jî wê, weke aliyekî giring wê, temenê pêşketina mirov a bi aqil jî wê di jîyanê de wê bi wê re were li holê û biafirê bê.

Di rewşa têkiliya mirov a bi aqil re, ya keseyetîyê a bi civakê re wê, her wusa wê di vê çerçoveyê de wê temenê têkiliya pêşketina civakê û aqil û têkiliya wan ya bi hevdû re jî wê bi xwe re wê biafirênê. Her wusa li vir wê civak û aqil wê temenê wê, di dîrokê de wê, weke ku mirov wê kifş dike wê, bi keseyetîyê bê. Temen û hîmê keseyetîyê jî wê mirov û yê pêşketina mirov jî wê aqil wê biafirênê.

Pêvajoyên ku mirov di jîyane xwe de wê, ji destpêka pêşketina xwe re wê bijî û wê wan derbas bikê wê, ji wî re wê weke pêvajoyna aqil û pêşketina aqil jî bin. Her wusa wê, dema ku wê ji demekê û pê de wê aqil

pêşbikeve û pê de wê mirov wê, van pêvajoyên xwe yên ku wî derbaskirina wê wan bi xwe re wê, bikê ku wan fahm bikê. Her tişta ku mirov wê jîyankiriya wê weke fêr û ezmûnekê bê. Ev jî wê, weke aliyekî biaqil re wê xwe wê bi demê re wê bi hîmî wê werênê li ser ziman.

.

**Dîrok û aqil**

Piştî ku aqil pêşket û pê de wê, mirov wê pêvajoyên xwe yên u wî jîyankirina wê, wan bi hiş wê bidest dîtinê wê bikê. Wê çi bikê û ankû kiribê wê, wan bi aqil wê bibînê. Ev dîtina mirov wê, wê di mejiyê mirov de wê, temenê pêşketinên nû bê. Lê li vir wê jî mirov divê ku wê werênê li ser ziman ku wê mirov wê di xwe de wê, bixwe wê xwediyê temenekî giring ê bi girtin û ankû derkkirina tiştê ku ew dibînê bihiş bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê demê wê, weke aliyekî giring wê xwe bide dîyarkirin. Ev jî wê weke aliyê giring ê mirovî wê xêv û giritna wê ya di mejiyê mirov de bê. Xêva mirov wê, temenê girtina mirov û ankû pêşketina mirov a di jîyanê de jî bê. Di aslê xwe de wê, weke nivîsandina jîyanê a bi dîtinî, bihîstinî, bêhnkirinê û hwd bê. Mirov wê bi wê re wê, li ser rêyên sehên xwe ên weke çav, gûh, bêhvil, ziman û hwd re wê bidest girtinên di xwe de wê bikê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê pêşî wê naskirin wê pêşbikeve.

Naskirin wê, weke aliyekî têkiliya wê rewşa fîzyolojikî a xêva mirov a bi hebûna fîzîkî a derve re bê. Hebûna fîzîkî wê, karibê xwe weke temenna têgînî ên xêvî jî ew xwe bi demê re ew bidina nîşandin bin. Di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî giring wê xêva me wê, xwe bi awayekî kirin wê bide dîyarkirin. Wê temenê pêvajoyên destpêkê ên ku wê di wan de wê nivîsandin wê pêşbikeve jî wê, ev rewşên bi pêşketina hebûna xêvê re bin. Em li vir nikarin xêvê red û înkar bikin. Wê di wê çerçoveyê de wê girtina xêvî ku wê mirov wê piştre wê bi dageran wê bidest hanîna li ser ziman bikê bê. Di destpêka pêvajoyên civaketîyê de ku wê, hê mirov wê di şikeftan de wê bijî û ankû hinekî berî wê jî wê, were dîtin ku wê mirov wê, bi xwe re wê, di vê çerçoveyê de wê, tiştên ku ew dibînê weke sawalan wê xîzbikê. Ew xîzkirin û ew sawala ku ew bi wê hatîya xizkirin ew hatîya dîtin. Mirov wê dema ku wê xîz dikê wê di mejiyê xwe de wê têkiliyê di nava wê dîtina xwe ya wê sawalê û wê kirinê de wê dênê. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku ew wê xîz dikê wê ew weke rengek, awayek û ankû dagereka wê sawalê bê. Wê dema ku wî mirov wî li wê xîzkirinê nerî wê ew sawal wê were bîra wî. Ew sawal ew ji xwe di jîyanê de ew heya. Wê li wê binerê. Wê têkiliyê di mejiyê xwe de wê, di nava wê xêzkirin û sawalê

de wê dênê. Di vê çerçoveyê de wê weke aliyekî giring wê, vê yekê wê bi xwe re wê bikê. Mejiyê mirov wê, di vê çerçoveyê de wê wê di awayekî şenber de wê bidest tiştên ku ew dibînê wan di xwe de ew biwênê bikê. Ew bi wênêkirin wê weke dagera wan bê. Ew xîzkirin jî wê, ji xwe wê weke aliyna ku wê bi wê armancê ku ew hatina kirin bin. Mirov, dema ku ew nêçîrekê dikê ku wî, çi nêçîrkiriya wê, ew wê xîz bikê. Wê wêneyê wê, weke ku ew bi kevir û li ser kevir ew çê bikê. Di vê çerçoveyê de wê, ev wêne wê weke navekî ku ew hê bi deng nayê derxistin jî bê. Piştre wê, nav li wê were kirin û wê ew were bidengkirin û wê piştre jî wê, ew deng wê bi wê xîzkirinê re wê were derxistin. Di vê çerçoveyê de wê, rewşek afirandinê wê bi pêvajoyên wê re wê di mejiyê mirov de wê li ser kirin û tevgerên mirov re wê xwe bide nîşandin. Wê di nava kirin, tişt û rewşên ku mirov wan dijî de wê di mejiyê xwe de wê têkiliyekê wê bi vê rengê wê bidest danînê wê bikê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, têkiliyan wê bidest danînê wê bikê.

Ev jî wê, weke temen û aliyekî pêşketina mirov a hîmî bê. Bi demê re wê were li wê zêdekirin. Mirov wê, tişta ku ew xîzkirîya wê piştre wê, gelek tiştan wê bi dîtina xwe re wê li wê zêde bikê. Ev jî wê weke pêvajoyeka dîrokî a bi pêşketina mirov re bê.

Di pêvajoyên pêşketina aqil de wê mirov wê pêşbikeve. Aqil û mirov wê, weke ku wê hevdû wê biafirênin. Mirov wê biaqil wê bi xwe re wê qarakter û keseyetîyê wê biafirênê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê pêvajoyekê wê bijî. Bi wê re jî wê aqil wê bi demê re wê, li jîyanê wê pêşbikeve û wê serdest bibê. Di vê çerçoveyê de wê, pêvajoyekê wê bi xwe re wê bijî. Pêvajoyên ku wê aqil wê bi xwe re wê bijî wê, weke pêvajoyna serûwane jîyane mirov jî bin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê aqil wê, xwe  bide dîyarkirin.

Li vir, em divê ku vê yekê wê werênina li ser ziman ku wê bi demê re wê bi aqil re wê qarakter û keseyet wê biafirê û pê de wê, ev rewş wê di rewşên pêşketina dîrokê û nivîsandina wê de wê bi demê re wê, hin bi hin wê bandûr û kifşkarîya wê, xwe hin bi hin wê bide dîyarkirin. Her wusa têgîna ku wê piştre wê di demên şariştanîyê û pêvajoyên pêşketina xwe de ku wê were li ser ziman  ku ”mirovên ku ew di dîrokê de weyn(rol) leyistin” ku ew dihê li ser ziman wê, hinekî wê, di çerçoveya pêşketina vê rewşê de wê têgînekê wê bide me. Mirovên ku ew bi dîrokê re wê weyn bileyizin. Wê di vê çerçoveyê de mirovên ku wan xwe bizanekirîya û bi wê re wan serdest kirîya bê. Hebûna xwe li civakê û navaroka wê, dabibina herêkirin bin. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê wê werênê li ser ziman.

Di vê çerçoveyê de wê, bi mirov û pêşketina qarakter re bi zanînê re wê, bi demê re wê keseyetê wê pêşbixê û bide dîyarkirin. Keseyet wê weyna ku ew di nava civakê de ew dileyizê, wê her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, derkeve li pêş. *Kesên ku ew dîrokê dinivîsênin* wê derkevina li pêş. Yan jî wê, bi gotina ku em di dema bûhûrî de wê li gorî rêzimanîyê wê werênina li ser ziman wê bê gotin ku *´kesên ku wan dîrok nivîsandina´* wê werê hanîn li ser ziman. Kesên ku wan dîrok nivîsandina wê, weke kesna ku ew bûna xwedî keseyet. Keseyetên wan wê, weke keseyetên ku ew bi xosletên civakî re ew dijîn bin. Di xwe û hizrên xwe hanîna li ser ziman de wê, xwe bikina malê civakê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê pêvajoyekê wê bijîn. Di vê çerçoveyê de wê, di dîroka civake kurd de wê kesên ”pîr” û ankû ”kapîr” ku ew hê ji pêvajoyên destpêka civakê ve ew hena û bi bandûr in di nava civakê de wê, derkevina li pêş. Mirovên pîr û ankû kal wê, bi gotina xwe ya ´zane´ û ankû ´bi zane´ wê, ew wê rewşê bi weyna xwe re wê bileyizin. Wê navê xwe û bandûra xwe xwe di nava civate li dora xwe de wê, bidina hiştin. Wê di vê çerçoveyê de wê, xwediyê weynekê bin. Mirovên pîr, wê bi zanebûnî wê di demên destpêka civakê de wê weke mirovna ku ew dikarin afsûnê bikin û ankû pêbixin bin, wê karibin ji derdên mirovên li dora xwe re ew çareserîyê bibînin bin. Wê karibin ji bîrîn û êşên mirovên li dora xwe re wê ji şînahîyan ku ew dikarin dermanan bidina çêkirin bin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, gelek xoslet û teybetîyên wan wê, hebin. Mirovên li dora wan jî wê wan bi vê rengê wê herê bikê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê ew jî wê xwe bidina herê kirin. Dîroka wan wê, di vê çerçoveyê de wê weke dîrokek nivîsandî bi jîyankirina wan re wê bê malê civake li dora wan. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê ew werina bibîrhanîn. Di rewşa jîyane mîrovên pîr de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê heta roja me jî wê ew bi vê rengê wê di nava civake kurd de wê li herêmê wê, weke çîneka serdest wê hebin û xwedî rewş û bandûr bin. Hebûna wan wê, di vê çerçoveyê de wê derkeve li pêş. Wê weke keseyetna ku wan mirovên li dora wan li dora xwe girtina bin. Bi xwe ve bi kirin, gotin û rewşên weke yên bi ´afsûnî´ ku wan weke ku pêşxistîya ku wan bi wê mirov bi xwe ve girêdana û hwd. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wan bi teybetî b bandûra wan re wan werênê li ser ziman. Di rewşa wan de wê, di vê çerçoveyê de wê ev mirov, wê ew keseyetîya wan ya ku ew pêşketîya wê di mejiyê pirranîya mirovn li dora wan ku ew hena de wê bicih bibê. Wê bi wê re wê ew jî wê weke keseyetna ku ew ji aliyê herkesekî ve dihêna naskirin wê hebin û wê werina pêşwazî kirin.

Wê ew wê weke keseyetna ku ew hertimî wê bi vê rengê wê li pêşbin.Wê bi keseyetîya xwe re wê civaketîyekê wê bi xwe re wê pêşbixin.

Li vir mirov divê ku wê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê bi demê re wê, di vê çerçoveyê de wê di mejî de wê bi mirovan re wê têgînên hevbeş weke yên hevdû naskirinê û hwd wê pêşbikevin. Ev têgîn wê, weke têgînna ku ew li ser aqil re ew bi hevbeşî pêş dikevin bin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê, rewşna ku wê pêşbikevin wê xwe bidina dîyarkirin. Li vir di rewşa têgîna pêşketina civaketîyê de wê, hin bi hin wê di vê çerçoveyê de wê ev rewşên bi vê rengê wê bina weke rewşna ku wê temenê wê bi xwe re wê biafirênin bin.

Civaketî wê, hê di serdemên destpêkên mezolotîkê û di dema neolîtîkê de wê pêşketina wê li ser rewşên bi jîyane komî a ku ew di pêvajoyên peleolîtîkê de ku ew hin bi hin bidest pêşketina xwe dikê re ku ew dibê wê, li ser wê re wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de mirov wê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê rewşên hevbeş wê di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê pêşbikevin. Civaketî wê, di aslê xwe de wê, ew jîyane bikomî a di demên peleolitîkê û hwd de ku ew heya wê, tenê bi zanebûna bûna wê bê. Di vê çerçoveyê de jî mirov, wê dikarê wê werênê li ser ziman.

Pêvajoyên piştre ên demên mezolîtîkê wê weke pêvajoyna ku wê di vê çerçoveyê de wê aqil wê hin bi hin wê bidest kifşkirina tevger, kirin û xûyên bikê bê. Di vê rewşê de jî wê aqil wê weke fektorek jîyanî a dîyarker ku ew hin bi hin bidest kifşkirinê dikê bê. Serdemên mezolîtîkê wê, di vê çerçoveyê de wê weke ew xwediyê demna bûhûrîner bê. Wê her wusa wê di vê çerçoveyê de wê qûtbûn û qatîna ji dema rewşên peleolîtîkê wê di aslê xwe de wê di vê demê de wê bibê. Piştre jî wê, dema neolîtîkê ku wê di dewama wê de wê werê wê, weke dem û serdemeka ku wê di wê de wê aqil wê hin bi hin wê serdestbê bê. Di vê çerçoveyê de wê, di demên neolîtîkê de wê, rewşên bizanebûnî ên weke bi nêçîrkirinê, cotyarî û pêşketina wê û hin bi hin pêşketina berhevkirina zad di dest de û hwd wê weke rewşna ku wê pêşbikevin bin. Wê malbatîtî wê pêşbikeve. Malbatên ku ew pêş dikevin jî wê bina xwediyê kerîyên sawalên ku ew ji xwe re digirin û wan kedî û ankû ahl dikin bin. Di vê çerçoveyê de wê rewşekê wê, pêşbixin. Malbat wê, di cihê xwe de wê bijîn. Ber vê yekê wê dabara xwe wê bi çi wê bikin wê, li ser wê re wê ew wê wan rewşên weke kedîkirina kerîyên sawalan û hwd wê pêşbixin.

Rewşên bi vî rengî wê di dema neolîtîkêli de wê zêde bibin. Kesên ku ew weke kurd dibêjin ew ´pîr´ in û ankû ´kapîr´ in wê di wê demê ku ew

jin bin û ankû mêr bin wê derkevina li pêş. Ji wan demên neolîtîkê dîtina bermehîyan weke hêkelên ku ew hatina çêkirin ji kevir û ankû ji harîyê û ku piştre ew hatina qamirandin di êgir de ku ew dihên dîtin û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê rengekî pêşketina wan deman wê bi xwe re wê bidina dîyarkirin. Em vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê di vê çerçoveyê de wê rewş û rengekî pêşketî ê bi aqil wê xwe bide dîyarkirin. Aqilê dema neolîtîkê ê ku ew heya wê, di vê çerçoveyê de wê, di rengekî civakî de wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa mirov divê ku vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, civaketî wê li ser bi hevdû re jîyankirinê û pêşketina hevbeşîyan û hwd re wê, xwe bide dîyarkirin. Minaq, wê rewşên weke yên têkiliyê û hwd ku ew wê piştre wê temenê pêşveçûnên bi zimanî wê pêşbixin jî wê pêşbikevin. Ziman wê, di vê demê( dema neolîtîkê) de wê, hin bi hin wê bi awayekî wê bi deng derxistinên ku ew ji aliyê yên ku ew wan nas dikin û fahm dikin ve wê pêşbikevê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê şêwayekî civakî wê di wê demê de wê bi xwezaye xwe re wê pêşbikeve û derkeve li pêş. Pêvajoyên jîyane vê demê wê, hin bi hin wê li ser aqil re wê, gav bi gav wê pêvajoyên pêşketinê wê bi xwe re wê bide çêkirin. Pêvajoyên pêşketina aqil wê, di vê çerçoveyê de wê hin bi hin wê pêşbikevê. Wê jîyane civakî wê, pêşbikeve. Li vir ew jîyane civakî ku ew pêş dikeve mirov divê ku wê têkilîya wê bi keseyetîyên ku ew pêş dikevin re wê dênê û wê hilde li dest. Her wusa keseyet û civak wê, di vê çerçoveyê de wê mirov wê çawa wê hilde li dest? Wê di vê çerçoveyê de wê mijare fahmkirina hebûna civakê wê, çawa wê weke dîyardeyekê wê were hildan li dest? Wê, weke mijareka bi têgînî a hemû demên bûhûrî bê ku wê mirov wê bi aqilê xwe re wê li ser wê wê bisekinê bê. Civaketî û keseyet mirov wê divê ku wê bi teybet wê weke mijarekê li vir bi têgîna dîrokê re jî wê hilde li dest bê. Wê têgîna civakê wê çawa wê hebê? Wê di çi rengê de wê hebê? Weke van mirov dikarê gelek pirsên din wan bikê. Ev hemû wê di çerçoveya fahmkirina têkiliya keseyet û civakê de wê fahmkirinekê wê ji me wê bixwezin bin.

Di rewşa fahmkirina têkilîya keseyet û rewşa civakê a ku ew pêş dikeve wê, bi demê re wê bi aqil re wê, xwe bide dîyarkirin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa keseyetîyê wê, bi civakê re ku ew were hanîn li ser ziman wê, çawa wê were hanîn li ser ziman? Ev jî wê, weke aliyekî giring ê ku mirov wê hilde li dest bê. Di pêvajoyên ku wê, piştre wê pêşbikevin de wê, civaketî wê pêşbikeve. Demên neolîtîkê wê, weke demna ku ew bi civakî lê berî demên pêşketina şariştanîyê ku ew dihên şîrovekirin û hanîn li ser ziman bin. Her wusa di

vê rewşê de wê, ev weke dîyardeyekê wê derkeve li holê ku wê, civaketî wê, weke hebûnaka ku ew berî rewşa şariştanîyê ku ew pêşdikeve û hebê bê. Demên civakê ên ku wê di destpêkê de wê pêşbikevin bin wê, weke demna ku wê di wan de wê, aqil wê hin bi hin wê pêşbikeve û serdest bibê bê. Wê bi aqil wê tişt wê pêşbikevin. Bên çêkirin. Mirov wê, tiştan karibê naqş bikê û bi çerçova bikê. Di vê rengê û awayê de wê, weke aliyekî giring wê, xwe bide dîyarkirin bê.

Li vir em vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê, dema ku ew civaketî wê, weke aliyekî bi têgînî ku wê pêşbikevê bê. Lê ji aliyê dîyardeyî ve wê, aliyên wê yên dîyardeyî wê hebin ku em wan bi wê re di çerçoveya wê de wan werênina li ser ziman. Civaketî wê, di serî de wê, di çerçoveyekê de wê xwediyê hevbeşîyekê bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê weke aliyekî giring wê, xwe bide dîyarkirin bê. Pêvajoyên pêşketina bi aqilê mirov wê, di rewşa civaketîyê de wê, rewşên nû wê pêşbixin. Minaq, di rewşên têkilîyê de wê bi hişmendî danîna têkilîyan, pêşketina ziman û gotinên wê û hwd wê pêşbikevin. Ev wê, weke rewşna teybet bin. Ziman wê, weke hebûneka bi hişmendî ku wê mirov wê li ser wê re wê xwe werênê li ser ziman bê. Ziman wê weke fektorek giring a têkiliyê bê. Di rengê vê têkiliyê de wê, ya giring û ku ew divê ku ew li vir were fahmkirin jî wê, ew bê ku ew bi aqil pêş dikeve bê. Wê çendî ku wê, aqil wê pêşbikeve wê, ew jî wê bi demê re wê pêşbikeve bê. Ziman wê, bi awayekî wê rengekî pêşketina demkî a civakî bê. Lê aliyê din jî yê weke ku mirov wê, werênê li ser ziman ku wê ew bê ku wê, di nava civakê de wê gelek mirov wê bi hevdû re wê bijîn û wê dayimî wê bi hevdû re wê têkiliyê wê dênin. Bi wê re wê, hevbeşîyek giştî weke bi ziman û hwd re wê pêşbikevê. Têgihek ku ew dihê zanîn wê ji aliyê pirr kesan ve wê were zanîn. Di vê çerçoveyê de wê ev wê, weke aliyekî giring bê. Lê bi wê re mirov divê ku vê yekê wê, werênê li ser ziman ku wê, bi demê re wê mirov wê keseyetîya xwe jî wê di nava wê rewşa civakî û hevbeşîya wê de wê pêşbixê. Wê heman zimanê ku hewirdora wî bikardihênê wê, ew jî wê fêr bibê û wê bikarbênê. Li ser wê re wê, xwe wê werênê li ser ziman. Ziman wê, weke dîyardeyeka bingihînî wê hebê. Li ser wê re wê, têgihiştin wê pêşbikeve. Mirov çawa dijî û di çi rengê de pêvajoyên pêşketinê ew di nava xwe de ew derbas dikê de wê, ew weke rengekî hişmendî jî wê xwe li ser gotinên zimanî ku ew dizanê re wê xwe bide hanîn li ser ziman. Çendî ku wê mirov wê heman gotinan di mejiyê xwe de wê bicih bikê wê, wateyên cûda wê li wê bikê. Li vir wê, dema ku mirov wê rewşê fahm bikê wê, rewşeka weke di çerçoveya fahmkirina têkiliya gotin û wateyê de wê

şîroveyek dirêj wê pêwîstî bi wê hebê ku mirov bi wê, vê rewşê baş fahm bikê û wê di vê çerçoveyê de wê karibê werênê li ser ziman. Rewşên zimanî wê, weke rewşna teybet bin. Her wusa rewşên zimanî wê weke rewşna ku wê, ji gelek aliyan ve wê xweediyê xosletên cûda bin. Li vir, ziman wê, weke têgîneka ku ew çendî ku mirov wê dikarê weke têgîneka şenber wê werênê li ser ziman jî lê wê, ziman wê di aslê xwe de wê weke rewşek û têgînek razber wê hebê. Ya ku wê, ew wê rewşa şenber wê bi wê re wê bide nîşandin jî wê rewşên weke serborî ên ku mirov wan dijî û ew bi mirov re dibina weke hinek hişna û ku mirov wan bi gotin dikê bê. Yanî li vir wê, were dîtin ku wê ya ku wê gotinê şenber bê wê ew wateya ku mirov li wê dinerê û bi wê dinerê bê. Her wusa wê rewşa gotinê a razber a bi rewşên xwe yên weke darêjkî, dengzanî û hwd re wê, şenber dikê jî wê rewşên weke têgînî ên ku ew hatina têgihiştin ên bi wateyî ên nû bin. Mirov wê dema ku wê rewşekê bi gotinekê re wê werênê li ser ziman wê, ew rewş wê bi şêwayekî şibandinê wê li ser gotinê re wê, were li ser ziman. Xoslet, teybetî, rewşên ahengî ên ku ew di nava gotin û wateyê de wê werina çêkirin wê, ew jî wê, di vê çerçoveyê de wê, weke rewşna teybet bin. Di aslê xwe de wê, li vir wê, têkiliyek teybet wê di nava rewşa razberîya gotinê û wateyê de wê, hebê. Dema ku ew wate bi hiş ew hat pêşxistin wê, piştre wê, weke aliyekî giring wê, xwe bide bide dîyarkirin. Ew wate wê, piştre wê weke têgîneka bihişî wê hebê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rewşek wateyî wê hebê.

Wate piştî ku ew weke hişa rewşê ku ew pêşket û pê de wê, bi xosletên razber ên gotinê re wê pêşbikeve. Herwusa wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek têgînî bê. Di vê çerçoveyê de ew wateya wê, wê weke aliyekî giring ê ku mirov wê, dikarê wê werênê li ser ziman û wê fahm bikê bê. Rewşa razberîya gotinê wê, di vê çerçoveyê de wê, her wate û hişê ku wê ji rewşê kir û wê bi xwe re wê hanî li ser ziman wê bi xosletên xwe yên razber wê werênê li ser ziman.Di vê çerçoveyê de têgîna şenberîyê a gotinê wê di aslê xwe de wê hinekî wê bi razberî bê. Lê ya ku wê weke ku wê şenber dikê jî wê, hinekî wê hişê li ser wateyê re bê.

Di rewşên bi vê rengê de wê ziman wê di nava rewşên têkiliya civakî de wê,biheman şêwayê wê pêşbixê. Her wusa wê, bi demê re wê ol û olzanî wê pêşbikevê. Ol û olzanî wê weke aliyekî giring ê ku mirov wê dikarê di vê çerçoveya têgîna gotinî a razber de wê hilde li dest bê. Ya ku wê, bi wê re wê weke şênberîyekê wê xwe bide nîşandin jî wê hişekî li ser wateya gotinê û ankû wateya ku ew bi lêkerî ku ew li gotinê ew hatîya kirin bê.

Di nava rewşa pêşketina rewşa olê û olzanîyê de wê ev rewşa wê bi awayekî vekirî wê xwe bidina dîyarkirin. Bi wê razberîya wê re wê, rewşa şenberkirinê wê xwe bi awayekî wê li ser hiş re wê bide dîyarkirin. Ev rewşên bi têgînî ên weke razberî û ji razberîyê bi hişkirina li ser wateyê re pêşxistina şêwayekî têgînî ê şenberî û hwd re wê, bê temenê pêşxistina têgînên weke olzanîyê, metafîzîkê, piştre felsefeyê û hwd jî. Di vê çerçoveyê de wê, pêvajoyek bi pêşketina aqil re wê, li ser pêvajoyên têgihiştinê ên bi zanînê ên li ser aqil re wê xwe bidina dîyarkirin. Di rewşa fahmkirina bi têgîhiştinê de wê, aqil weke rewşek hişmendî wê di vê çerçoveyê de wê xwe li ser rewşên şenberkirinê re wê bide pêşxistin. Di aslê xwe de wê, rewşên weke rewşên şenberkirinê wê, li ser têgîna aqil û razberîya gotinê re wê, bi demê re wê bi aqilekî felsefîkî wê vegerihina li awayekî ji razberîyê û gotinîya wê bi şênberîyê re derhanîna têgînên nû û bi wê re afirandina darêjkên nû ên bi têgihiştinî û hişmendî jî wê, bi xwe re wê bide pêşxistin. Ev jî wê, bi awayekî wê bi demê re wê, di rengê fahmkirinê û pêşxistina wê de wê bibê. Her wate, hiş û gotin wê, di vê çerçoveyê de wê, bi şêwayekê wê weke aliyekî têgînî wê pêşbikevê. Dema ku mirov wê ji vê aliyê ve wê li rewşê binerê wê weke ku mirov çendî ku wê ji hevdû derhanîna bi rengê pêşketinê ên li ser wateyê, ji rewşên razber bi ber şenberkirinê û hwd re wê, temenê fahmkirina rewşên jîyanî jî bê. Li vir wê, aqilekî ku wê, rewşan bi xwe re wê rewşan fahm bikê wê, bi pêşketina rewşên kirinê û ankû piretîkî re wê, weke aqilekî kifşkar ê li ser gotinê re jî bê. Li vir wê, demê mirov divê ku vê rewşê jî wê, bi wê re wê hilde li dest ku wê, aqilê kirinî ku ew pêş dikeve ji rewşên rûdayî wê, bi wê re wê weke di dîmenekî cûda de wê xwe wê bide dîyarkirin. Ji xwe wê dema ku mirov li rewşa wateyên bi lêkerî ku ew li gotinê hatina kirin ku em li wan dinerin wê, weke rewşna ji kirinîyê bin. Lê piştî ku ew weke hiş û ankû wateyekê pêşketin û pê de wê, weke aqilekî zêhnî ê serbixwe wê hebê û wê pêşbikeve bê. Di vê çerçoveyê de wê di reng û şêwayekê de wê xwe bide dîyarkirin û wê werênê hanîn li ser ziman. Yanî li vir wê, rewşa aqilê kirinî wê di rewşa pêkhanînê û ankû pêkhatinê de wê xwediyê pêvajoyekê bê. Aqilê ku ew ji kirinê pêş dikeve bi hişmendî wê, piştre wê çawa wê weke rewşeka ku ew bi çalakî ew kirinê pêşbixê wê, were dîtin. Weke aqil wê têgînên ji hev cûda wê, bi jîyanê, civakê, pêvajoyên pêşketina şariştanîyê, desthilatdarî û rengên serdestîyê re wê rengên pêşketinên cûda wê bi xwe re wê werênê li holê. Di vê çerçoveyê de ew rewşên weke xwestek, vîn û hwd jî wê, di vê çerçoveyê de wê li wê rengê aqil ku ew bi çalakî ku ew kirinê pêşdixê weke kirdeyna vêşarî ê di wê de

wê xwe bihişmendî wê bidina dîyarkirin. Rewşa pêkhanînê wê, weke çalakîyekê di têgîna dîrokê de jî wê xwe werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku wê ji aliyê têgîna felsefîkî a dîrokê ve jî wê di dewama wê de wê hilde li dest.

Her kirin wê, di dîrokê de wê weke çalakiyekê jî bê. Lê wê di temenê wê çalakiya dîrokî de wê aqil, vîn û xwestek wê bi hevdû re wê di wê de wê hebin. Vîn û xwestek wê ji aliyekî ve wê aliyê aqil ê bihiş jî wê, bi xwe re wê bênina li ser ziman. Kirina ku mirov ew kir ew kirineka weke encama vîn û xwesteka me bê. Di vê çerçoveyê de wê, were têgihiştin ku wê her tişt wê di çerçoveyeka ku bi vîn û xwestek ew pêş dikevê bê. Fahmkirina rewşa têgîna wê, wê her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê giring bê.

Di rewşa têgîna dîrokê de wê, kirin wê, bi aqil re wê hertimî wê, weke aliyekî giring wê xwe bide dîyarkirin. Di çerçoveya têgîna kirinê de mirov, wê dema ku wê bihizirê wê, bi wê re wê kifş bikê ku wê aqil wê, weke aliyekî giring ê ku mirov wê hilde li dest bê. Kirin wê, di çerçoveya aqilê me yê ku me ew pêşxisyî de wê, weke rewşeka wê yabûyî bê. Yanî wê mejûyî bê. Di dîrokê de wê têgîna mejûyî wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî bi têgînî ê ku mirov li wê bihizirê bê. Lê ku mirov di dîrokê de li rewşên weke mejûyî ku mirov wan dikarê bi dû aliyan wan werênê li ser ziman. Aliyê pêşî wê bi vîn û xwestek bê. Yanî mirov wê, bi aqilê re wê, pêşnûmaya wê ya bi aqilî wê pêşbixê û wê li ser wê re wê bihizirê û wê ew wê werênê li ser ziman. Hizirkirin, bi çerçoveyî hizirkirin û pêşxisin, pêşxistina pêşnûmeyên bi hizirkî û hwd wê, hinekî wê di wan de wê vîna hişmendî wê di xwe de wê bihawênênin. Di hişmendîyê de wê, dualîteyeka ku ew li ser rewş û têgîna kirinîyê re wê hebê. Û bi aliyê din ê duyem re jî wê, bi hişmendîya wê bi xwe re wê hebê. Hizirkirina li ser kirinê re wê, weke têgîneka ku wê, li vir wê ji gelek aliyan ve wê mirov karibê li ser wê bihizirê bê. Dema ku mirov hizirî ku mirov tiştekî bikê wê, ew hizirkirina me wê, temenê wê û hwd wê çi hebê. Çi wê xwestekê wê bide dîyarkirin? Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê weke aliyekî giring ê ku mirov dikarê li ser wê bisekinê bê.

D dîrokê de wê, her rewşên ku ew pêş dikevin wê dema ku mirov ji aliyê têgînên weke mengwerî ve li wan bihizirê wê, bi wê wê werênina li ser ziman ku ´wê, di temenê pêşketinê û kifşkirina wê pêşketinê de wê, vînek hebê.´ Ev vîn jî wê, weke ´vîna xwûdê´ wê werê hanîn li ser ziman. Yanî wê, weke vîneka ku ew dîrokê dide dîyarkirin bê. Têgîna vînê wê, dema ku mirov tiştekî wê bihişmendîya xwe re wê pêşbixê. Vîn wê, aliyekî

wê, li ser hişmendîya re wê bimeşê bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê were hanîn li ser ziman.

Ev aliyê dîrokê wê, dema ku mirov wê hinekî din bi wê re bimeşê wê, di vê çerçoveyê de wê, hertişta ku ew heya wê bi ´sedem´ û ´armancekê´ wê ku ew heya wê were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, di dîrokê de wê weke mijareka têgînî a felsefîkî û hwd ku wê hertimî wê li ser wê serî wê were wastandin jî bê wê, ev bê. Bi wê re wê, hewl bê dayîn ku ew ´sedem´ û ´armanc´ ew were fahmkirin. Di vê çerçoveyê de wê, rastîya afirandin û ankû pêşxistina dîrokê jî wê bi wê re wê were hanîn li ser ziman. Em dema ku wê, hizrên Zerdeşt wan dixwênin wê, ew di vê rewşê de wê, çendî ku wê ji destpêkê ve wê di vê çerçoveyê de wê bahse ´vînekê´ wê bikê jî lê wê, weke ku mirov wê bi têgîna wî ya metafîzîkî re wê kifş bikê wê li ser fêr û ezmûnê re wê, bahse fahmkirinekê û pêşketinekê jî wê bikê. Di nava kurdan de wê heta roja me wê gotineka pirr zêde giring ku ew di vê warê de ew dihê hanîn li ser ziman wê hebê. Ew jî wê ew bê ku ”kirin ji te û dayîn ji min.” Ev gotin wê, aliyê wê yê pêşî ê bi gotina ´kirinê´ re wê mirov wê hebê. Li aliyê wê yê din jî ê ´dayînê´ wê têgîna xwûdê wê were bicihkirin. Li ser wê re wê were hanîn li ser ziman. Mirov di jîyanê de wê çi bikê wê sedem û encamên wê, wê mirov wê *girêbidin*. Di vê çerçoveyê de wê bahse rewşa girêdanîya mirov a bi kirina mirov re wê bikin. Di vê rewşê de jî wê, di dewama wê de wê were hanîn li ser ziman ku wê, kirin wê weke kirineka mirovî bê. Wê di wê û kirina wê de wê sînor wê nebin. Lê mirov wê di çerçoveya kirinên baş û nebaş de ew divê ku wan sînorê xwe kifşbikê. Mirov jî wê, bi wê re wê weke ku wê di ezmûnekê de bê. Di vê çerçoveyê de wê bahsê wê werê kirin. Encamên kirinên mirov wê, hertimî wê weke aliyna giring ku mirov wê li ser wê bisekinê bê. Encamên kirinên mirov wê, piştî kirinê re wê hebûna xwe wê bidina domandin. Wê di vê çerçoveyê de wê bi awayekî kirin wê weke aliyekî ku wê, li ser wê re wê girêdanî wê pêşbikevê. Wê berpirsîyarîya wê, li ser mirov bê. Mirov wê dema ku wê kirinê wê, weke berpirsîyarîyê wê were hanîn li ser ziman wê, hingî wê weke ev di çerçoveya hişmendîyekê de jî wê were hanîn li ser ziman. Ber ku mirov ew kirin dema ku mirov ew kir wê, ew bi hiş û di farqêbûnê de ku ew hatîya kirin bê. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku wê, bahse çûyîna li dûnya din a axîretê were kirin jî wê, di vê çerçoveyê de wê, bi wê hişmendîyê wê mirov wê encamên wan kirinan bi başî û nebaşî wê bijî. Ku başî kiribê wê bi başî bijî. Ku nebaşî kirinê wê bi nebaşî wê bijî.

Di vê çerçoveyê de kirin û encamên wê, wê bi sedem û armancên wê re wê were lêpirsîn. Her kirinek wê, piştî ku ew bû wê weke rewşeka girêdanbar bê. Yanî wê ew mirov girêbide bi wê dema ku ew bûya û wê bixwe ve. Kirin wê, dema ku ew wê çawa wê were ´piştrastkirin ku ew bûya´ ku ew bahse wê dihê kirin wê, di nava civake kurd de wê di vê çerçoveyê de wê, ji vê rewşê re jî wê bersivek wan hebê. ´Ku mejiyê mirov wê înkar bikê wê laşê mirov wê herê bikê ku ew bûya.´ Mejî jî wê, beşek ji laş bê. Lê li vir bi wê qast dihê kirin ku mirov bi hişmendî wê red bikê wê ew nikaribê wê red bikê. Ber ku wê ew kirin wê winda nebê. Wê ji wê re wê şahid wê hebin. Heta ku wê weke ku wê di demên destpêkê ên êzdayîyê de wê werina hanîn li ser ziman ku "wê, ew kirin wê weke ku ew çawa bûya wê were berçav, xwe werênê li bîrê û wê mirov wê bibîr bikê, wê nikaribê ji wê biravê.´ Di vê çerçoveyê de wê li ser kirinê û têkiliya wê re wê ew werê hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, li ya mejûyî wê bi awayekî têgînî weke bi zindîyî wê li wê binerin.

Di rewşa têkilîya nava wê de wê, li vir wê ya ku ew bûya wê, hertimî wê ew weke rewşek wê hebê. Li vir mirov dikarê balê bikişênê li ser pêwîstînîya mejûyê û ankû pêwîstînîya ya bûyî. Ew wê, weke aliyekî ku wê, hebê. Dema ku mirov tiştek kir wê ew hebê. Çendî ku mirov bêjê ku ew nîn a jî ku ew hebê wê ew hebê. Wê ew bi gotina me ya ku ew ´nîn a´ re wê ew winda nebê û weke ku ew nebûya wê nebê. Di vê çerçoveyê wê ya ku ew bûya wê, hikmê xwe wê bi bûyînê wê bide dîyarkirin.

Li vir mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê weke aliyekî giring bê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî wê bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê rewşa mejûyê bi têgîna wê re wê, weke hebûna dîrokî wê xwe bide dîyarkirin. Dîrokê mirov dema ku wê dixwênê wê, weke rewşên ku ew bûna re wê dixwênê. Rewşên ku ew bûyîna û bûhûrîna wê weke mejûyî wê dîrok bin. Em di vê çerçoveyê de wê jî wê werênina li ser ziman. Lê her tişta ku ew bûya wê, ew weke rewşeka ku mirov wê bi teybetî ew bûya wê, xwediyê hebûnaka dîyardeyî bê. Di vê çerçoveyê de wê ew wê weke aliyekî giring wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, ya ku ew bûya wê, ew mirov wê nikaribê wê red û înkar bikê. Ew wê, hikmê wê, wê li ser domandina jîyane mirov wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, weke rastîyeka jîyanî ku ew ew jîyan heta ku ew hebê wê ew jî wê hebê bê. Mirov nikarê di demekê de bêjê ku ew heya û di dema din de bêjê ku ew nîn a. Her tişta ku mirov ew kir wê, weke aliyekî wê di vê çerçoveyê de wê di dîrokê de wê hebê. Lê her tişta ku ew di dîrokê de ew heya wê, weke dîyardeyna ku em bi mejûyî û di dema

bûhûrî de wê, li wê ku em dihizirin wê, di rewşek têgînî de wê hebê. Minaq ku ez rewşeka bûyî weke serborîyekê û ankû xiyalkirinekê wê hildima li dest wê, ew giranî, hacm û cismîtîya wê nebê. Lê wê ew hebê. Di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Her tişta ku ew mirov li wê hizirî ew çendî ku ew bi giranî, hacm û cism jî bê wê, ew destûrên wê yên fîzîkî wê di çerçoveya wê hebûna wê ya ku ew heyî de wê dervî me wê hebê. Mirov wê, heta ku wê kifşnekê jî wê ew weke ku têgînekê wê bi me re wê nebê. Lê piştî ku me ew kifşkir jî wê, ew bi ´rastîya wê´ re wê ew êdî wê hebê. Li vir wê hişkirin wê, aliyekî kifşî wê di wê de wê hebê. Dema ku ez hiş dikim û dihizirim ku wê darek ku ew qûrmê wê di ardê de çûya û pirr stûra wê mirov nikaribê wê hilkişênê ji ardê. Mirov di mejiyê xwe de wê hizirkirina bi hişmendîyê re ku ew dikê re ew bi wê re dibê ku xiyal bikê ku ew wê bikê. Lê wê, rastî û ya hizirkirinê wê, ji hevdû cûdabûneka wan wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê aqilê dervî destûrên fîzîkî ku ew dihizirê wê, her tişt bi kirinî wê ji wê re wê biderfet bikê ku ew xiyal bikê, hizir bikê û di xwe de weke ku ew ´pêkbênê.´ Wê bi fêr û ezmûnê re jî wê, hevyekîya wan wê di çerçoveya hebûnê de wê bibê. Tişt, ew dervî me heya. Lê em wê derk dikin. Wê fahm dikin. Ankû em wê bihiş dikin. Di vê çerçoveyê de ew bi me re wê rewşa xwe ya hiş re wê, ew hebê. Di rewşa fahmkirina têgîna dîrokê de jî wê, rastî wê bi vê rengê bê. Dîrok wê, bi hişmendî wê hebê. Her wusa wê, dema ku mirov tiştek di demek bûhûrî de wê dît û ankû jîyankir wê, ew di dema me ya bûhûrî de wê hebê weke serborîyek mejûyî. Mirov wê, bi hizirkirinê û ankû hişkirnê re wê, ew wê bibîrbikê. Di rewşekê de wê, dema ku mirov wê hişnekê wê ew weke ku ew nebê. Di vê çerçoveyê de wê, ev rengê hişkirinê wê weke rengekî hizirkirina li dîrokê a tenê li ser rewşa têgîna wê re bê. Ber vê yekê wê, dîrok wê, weke têgîneka şûbjeyî wê bi aqil re wê hebê. Lê aqil jî wê bi hebûnê re wê hebê. Ev jî wê, temen û çerçoveya dîyardeyî a dîrokê wê bi şêwa, awa û tehera wê re wê bide dîyarkirin. Bi gotineka din wê, têkilîya dîrokê û jîyanê ya ku wê bi hevdû re wê dênê bê.

.

**Dîrok, pêşketin û pêşvçûnên wê yên roja me**

Di rewşa hildana dîrokê li dest de wê, dîyarde, şert û merc û qatagorîyên ku ew hena wê bi şîroveya dîrokê re wê di nava hevdû de wê werê li ser ziman. Dîrok, dema ku ew dihê hanîn li ser ziman wê bi hevdû re wê, di çerçoveyek giştî de wê were hildan li dest û hanîn li ser ziman. Tişta ku wê ew hebê wê weke ya ku ew bi xwe re dîrokê de di hawênê û ankû diafirênê bê. Yanî bi gotineka din wê, barkerekî dîrokê bê. Wê di xwe de

wê bar bikê. Dîyarde wê, weke hebûneka ku ew heyî wê di vê çerçoveyê de wê, bi di temen de hebûna demê re wê xwediyê rewşa xwe ya hanîna li ser ziman. Di demê de wê her tişt wê bibê. Wê were hanîn li ser ziman. Li vir, di çerçoveya şîroveya dîrokê de wê, dîyarde, fektor, qatagorî û hwd wê, bi hemû aliyên wê re wê di nava hevdû de wê were hanîn li ser ziman. Bi gotineka din jî wê di ahengekê de weke ku ew di dîrokê de dijî wê, were li ser ziman.

Têgîna hebûna dîyardeyî a fenomenolojîkî wê, weke aliyekî dîrokê ê temenî ê giring bê. Her wusa dema ku mirov wê bikê ku wê werênê li ser ziman mirov, divê ku wê bi awayekî rast û baş wê hilde li dest. Aqil wê, weke têgîneka fenomenolojikî a afrîner wê xwe bi demê re di nava dîrokê de wê bide dîyarkirin. Her têgîn wê, aqilek jî bê. Ankû wê, rengekî aqil bê. Wê encamên wê, bi dîrokê û pêşveçûnên dîrokê re wê cûda bin. Aliyê têgîna aqil ê şûbjeyî wê di vê çerçoveyê de wê li ser jîyanê re wê temenê afirandina dîyardeyên fenomenolojikî ên objeyî jî wê bi xwe re wê biafirênê. Ev jî wê, bi demê re wê çendî ku wê aqil wê pêşbikeve û wê di ast û awayekî afrîner de wê xwediyê rastiyekê bê û di wê çerçoveyê de wê pêşbikeve re wê, ev bibê. Di rewşa fahmkirina têgîna dîrokê wê, di demên pêşarojê de wê, di vê çerçoveyê de wê bi zêdeyî wê li ser aqil re wê, xwediyê pêvajoyên pêşketinê bê. Em li vir divê ku vê jî wê, werênina li ser ziman ku em, di çerçoveya şîroveyek giştî a dîrokî de wê, dûalîteya wê ya şûbjeyî û objeyî ku em bi awayekî li hevdû hûnandî bi hevdû re wê, di temen de wê weke bingehekê wê hildina li dest û wê werênina li ser ziman re em, dîrokê li ser wê re biawayekî real´ û ankû bi awayekî rastîtî wê hildina li dest. Di vê çerçoveyê de wê, di rewşa fahmkirina dîrokê de wê, aqil wê, weke aliyekî giring wê, hertimî wê bi pêşketina wê re wê zêdetirî wê derkeve li pêş. Wê her tişt wê biaqil wê were li ser ziman. Bi awayekî dîyardeyî û ankû fenomenîkî wê, her tişt wê di nava aqil de weke li ser têgîna qatagorîyan, fektoran û hwd re wê xwe bide hanîn li ser ziman. Dîrok wê, di vê çerçoveyê de wê, têkilîya wê ya bi aqil re wê, ne tenê di çerçoveya fahmkirinê de lê wê di rewşa hanîna wê ya li ser ziman û fahmkirina dîyardeyan de jî wê, bi heman rengî wê giring bê. Li vir wê, di rewşa pirsgirêka hanîna li ser ziman de wê, hertimî wê, aqil wê, weyn bileyizê. Li vir wê demê wê şêwa wê weke aliyekî giring bê. Her tişt wê, di dîrokê de wê di awayekî de ku ew ji destpêka xwe ve ew bidest hanîna li ser ziman bû û pê de wê, di pêvajoyên ku ew di jîyanê de ew bi wê pêş dikevê re wê, xwediyê rewşek were li ser ziman. Bi demê re wê bi pêşketina ku ew dibê re wê, li wê zêdebûn, geşbûn, berfirehbûn û kûrbûn

wê bi wê re wê bibê.Di vê çerçoveyê de wê, ev jî wê bi aqil re wê li ser wateyê û ankû têgîna wateyê re wê, ev bibê. Wate û ankû watezanî wê, li vir wê, di çerçoveya fahmkirinê û hanîna li ser ziman de wê, weke aliyekî giring ê bingihînî bê. Wê li ser wê re wê salixkirin wê were kirin. Wê bi hiş wê, naskirin wê pêşbikevê. Wê temenê bi aqil dîtinê bê wate. Ber vê yekê wê, weke aliyekî hîmî û bingihînî bê. Dîrok wê, li ser wê re wê bi serborîyên ku ew bûhûrîna re wê were li ser ziman.

Şêwayên dîrokê ên ku wê, ew bi wan were hanîn li ser ziman wê li ser wateyê re wê bi demê re wê pêşbikevin. Di nivîsandinê de wê, şêwayên nivîsandinê ên weke bi çavkanî hanîna li ser ziman, li ser şîroveyê de bi vegotinî hanîna li ser ziman, li ser watekirinê re bi hişmendîyê bi şêwayna şîroveyî hanîna li ser ziman, bi şêwayê şibandinê hanîna li ser ziman, bi şêwayê danaberhevdû hanîna li ser ziman, bi şêwayê bi serê xwe hanîna li ser ziman, bi şêwayê nîşegirtinê hanîna li ser ziman û hwd re wê, weke van wê gelek reng û şêwayên nivîsandina dîrokê wê pêşbikevin.

Di roja me de wê,weke ku mirov wê kifşdike wê, şêwayên dîrokzanîyê û ankû dîroknivîsîyê ên weke bi çavkanî, jêdêrî û hwd re wê, derkeve li pêş. Her wusa serî li çavkanîyan dayîn û bi wê re hanîna li ser ziman wê, di çerçoveya têgîna ´piştrastkirinê´ de bê. Yanî wê li vir wê bi armanc û sedemekê wê ew wê were kirin. Bi wê re jî wê, ev rengê nivîsandina dîrokê wê, weke dîroka ´tekane rast´ wê were hanîn li ser ziman. Lê di aslê xwe de wê, dema ku mirov wê rewşa dîrokê wê, hilde li dest wê, di vê çerçoveyê de wê, dîsa wê xwe ji tevlîkirina darazên mirovî di nivîsandina wê de li nava wê, xwe xilasnekê. Tevlî nivîsandinê kirina darazan wê, weke aliyekî vêşarî û ankû vekirî ê şêwayê nivîsandina roja me a ku ew weke bi *´aqadamikî´* jî ew dihê hanîn li ser ziman bê.

Li vir ez vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, wateya ku wê li gotina ´aqadamîkî´ û ankû bi ´aqadamîkî hanîna li ser ziman´ wê were kirin wê, ew bê ku ew *´tekane rast´* bê. Di vê çerçoveyê de ew ku piştî ku ew dîrok bi wê rengê û di bin wê navê de ew hat nivîsandin ew cihê ´gûmanê´ di wê de nebê. Yanî herkesek bi wê bawer bikê ku ew ´rast´ a. Li vir îdîaya têgîna aqadamîkî a ´rast´ werênê li ser ziman wê, bi hewldana dana bawerkirinê û ji holê rakirina ´gûmanê´ û hwd re wê, ji rewşa bawerîyê weke ya di nava olan de ku ew heya wê, zêdetirî wê pêşde neçê. Ber vê yekê wê, ev jî wê, weke nêzîkatîyeka ku wê di vê çerçoveyê de wê xwe ji pirsgirêkên temenî û hîmî wê xilas nekê. Têgîna ´xistina zanistê li xizmetê´ jî wê, bi heman rengî wê, weke têgîneka bawerîbar bê. Wê nîşanaka wê jî bê ku wê çendî wê di bin navên ´zanist´ û ankû ´aqadamîkî´yê´ û hwd de

wê çawa bi darazî û bialî û hwd wê were nivîsandin. Ji xwe, heta roja me, bi sedan, ziman, çand, hebûna xalkan û hwd, çûyina ji dîrokê wê nîşanak û birhana vê rastîyê jî bê. Ev pirsgirêkên ku me di herdû paragrafên xwe yên li jor ên li ser vê de ku me ew hanîna li ser ziman de wê, di destpêkê de wê weke pirsgirêkên rast û li gorî rastîya wê nivîsandina mejûya dema bûhûrî û dîrokê bin. Lê di aslê xwe de wê, ev di vê çerçoveyê de wê, weke pirsgirêkna mirovatîyê bixwe jî bin. Wê di vê çerçoveyê de wê, dîroka bûhûrî û çûyînên ji dîrokê çûyînê û ankû hatina birin wê, karibê hemû şêwayên bi navê ´zanistî´ û ankû ´aqadamîkî´ û hwd, ên hemû demên bûhûrî û ên roja me bikê berlêpirsînê de jî. Di vê çerçoveyêde mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, nivîsandina dîrokê wê, di roja me de jî wê, bi pirsgirêka xwe ya rast nivîsandinê re wê rû bi rû bê. Ev pirsgirêk wê, bi awayekî bizanînî û ankû bi awayekî ne bi zanînî wê bi zanistî û aqadamîkî jî wê were domandin û ankû wê bê xwestin ku ew were dayîn domandin. Bêgûman wê, encamên wê jî wê, bo jîyane mirov û mirovatîyê wê pirr zêde wê giran bin. Em dema ku em tenê ku em li şûn xwe dinerin em wan encaman bi awayekî baş û vekirî wê dibînin. Di serî de wê, nivîsandina dîrokê wê weke aliyekî ku em li wê hizirin wê zêdetirî wê giringtir û biwate bê. Em dema ku wê rastîya dîrokê wê, bi rastîya wê re wê fahm bikin û wê werênina li ser ziman wê, hingî wê, pêşketineka rast wê bibê. Di vê çerçoveyê de têgîna dîrokê wê, ew wê hizrê û derfetê jî ew wê, bide me ku em karibin hinekî li pêşîya xwe li ser encaman û hwd re bihizirin jî. Wê, ´encama ku mirov dixwezê ku ew pêşbikeve´ wê, li ser wê, bihizirê. Di vê çerçoveyê de wê, di wê çerçoveyê de sazûmana civakî ku wê di çerçoveyek awadanîyî de wê li wê were hizirkirin û wê hewl bê dayîn ku ew were pêşxistin û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê xwe li ser jîyanê, civakê, pêşketina wê, dîrokê û têgîna wê re wê bide dîyarkirin û nîşandin. Wê weke encama wê têgînê wê rejim û ankû pergalên ku ew ´dikin ku ew civakên xwê ew pêşbixin wê, derkevina li holê. Bi wê re jî wê têgînên weke yên dîrokê û hwd wê, bi awayekî wê li ser şêwayên nivîsandinê û nêzîkatîyê û hwd re wê, bikarbênin. Di nivîsandinê de wê sekn jî wê, cihê ku mirov ji wê dinerê bê. Nivîsandina dîrokê wê, di roja me de wê, ji nivîsandinekê zêdetirî wê rengekî danakifşkirina rengê pêşketinê û sînorê pêşketinê û hwd re wê pêşbikevê bê. Di vê çerçoveyê de wê dîyarde, fektor û hwd wê, werina bi watekirina, salixkirin û dîyarkirin. Rengê biwatekirin û salixkirinê wê, di vê çerçoveyê de wê giring bê. Wê, ew wê temenê têgîn û hişmendîyên nava civakê bin. Di vê

çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê li ser wê rengê wê re wê, ev were pêşxistin.

Di roja me de wê, pirsgirêka fahmkirina dîrokê, li ser rengê hişmendîyê re ku wê, çawa wê were bi watekirin û salixkirin, rengê di wê çerçoveyê de hanîna dîyardeyan li ser ziman, danîna têkilîya wan a bi hevdû re û hwd, wê bi wê re wê xwe bide dîyarkirin. Pirsgirêkên dîrokîya roja me wê, di vê çerçoveyên de wê li ser têgînên bi watekirinê, salixkirinê, hişmendîyên ên bi zane ku ew hatina pêşxistin re bin. Di vê çerçoveyê de ev jî wê, weke aliyekî ´zanstî´ û ´aqadamîkîtî´ ê ku mirov divê ku mirov li ser wan bisekinê bê.

Pirsgirêkên bi nivîsandina dîrokê re wê, bi demê re wê li ser têgînê û rengên têgînê re wê xwe bi awayekî wê bidina dîyarkirin. Em di vê rewşê de wê jî wê, werênina li ser ziman ku wê, rengên têgînên dîrokê û ankû têgînên zanistî ên dîrokî ku wê pêşbikevin wê, bi wê re wê were hanîn li ser ziman. Di rewşa fahmkirina têgîna dîrokê de wê li ser têgînên wê yên zanistî û xwezayî ên dîrokî de wê têgîna ´dîrok, çawa bi derfet a´ wê, weke têgîneka ku ew were fahmkirin bê. Lê wê, bi têgîna dîrokê re wê, dema ku mirov ew pirsî jî wê, bi wê re wê bitêgînên dîrokê re wê, were hildan li dest. Têgînên zanistî ên weke yên dîrokê weke têgîna dîyardetîyê, têgîna şîroveyê, têgîna watezanîyê, têgîna objeyî, têgîna fahmkirina ´rastîyê´ û hwd wê, bi wê re wê werina li ser ziman. Bi demê re wê, gelek serekên nû wê weke beş û qatagorîyên nû wê li wan wê zêde bibin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî wê, xwe bide dîyarkirin. Di rewşa fahmkirina rastîya hizrên dîrokî de wê, li vir di rewşa hizirkirina dîrokê de wê, weke aliyekî giring wê têgîna dîrokê û fahmkirina wê bê. Dîrok wê, bi hemû fektor, dîyarde, fenomen, obje û têgînên xwe yên şûbjeyî re wê, weke zanîneka şûbjeyî a bi navarok wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê rastîya têgîna dîrokê wê weke aliyekî wê xwe bide dîyarkirin. Di rewşa fahmkirina dîrokê û têgîna wê de wê, li ser wê têgîna şûbjeyî re wê hizirkirina bi darêjkî û şûbjeyî wê, weke aliyekî wê yê giring bê. Di vê çerçoveyê de wê, rewşên rûdayî wê, di vê çerçoveyê de wê weke rewşna dîrokî wê xwe bidina dîyarkirin.

Têgîna dîrokê wê, dema ku mirov wê dihizirê wê, her wusa wê, têgîna metafîzîkî a dîrokê ku mirov wê bi wê hizirkirina wê re wê li pêşîya wê bihizirê wê, bi wê re wê, bi awayekî şûbjeyî û têgînî wê bale mirov wê bi wê re wê herê li ser pêşzanînîya wê. Li vir, wê gelek caran di şîrovekirinê de wê dîroka metafîzîkê wê bi têgîna metafîzîka dîrokê re wê were

tevlîhevkirin û wê hewl bê dayîn ku ew were fahmkirin. Li vir, li ser dîyardeyê re wê, dema ku mirov wê dihizirê wê ew dîyaerde weke fenomenekê wê, xwediyê hebûneka ku mirov wê bibînê û fahm bikê bê. Li vir wê, li pêşîya wê hizirkiirin wê, weke aliyekî giring wê xwe bide dîyarkirin. Lê dem ku em, di vê çerçoveyê de wê hizirkirinê dikin wê, bi şêwayekê weke ku mirov ji destpêka mirov wê di dewama wê de bi nifşên wê re dem bi dem û nifş bi nifş wê hildê li dest wê, bi awayekê rakendî ku wê ew wê xwe bide domandin wê, di awayekê de wê dîmenek wê weke wê werênê li berçav. Ev jî wê, wê têgîna weke di xatekê de û di dewama hevdû de herikîna wê bi demê re wê weke rastîya têgîna dîrokê a di jîyanê de re wê, werênê li holê û wê bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî giring wê ev jî wê, xwe bide dîyarkirin ku wê têgîna dîrokê wê li vir wê di wê rewşa wê de wê, bi hebûna dîyardeya jîyanî a ku ew heyî re wê, xwediyê re hebûna domandina ahengî a bi demê re bê. Ev jî wê, weke aliyekî giring ê bi rewşa rastîya têgîna mejûyî a dîrokê re bê.

Di rewşa fahmkirina dîyardeyên fenomenîkî ên dîrokî wê, dîrok wê bi awayekî wê xwediyê dûalîteyekê bê. Aliyekî wê, di nava rewşa dem bi dem û ankû rewş bi rewş û hwd wê di nava dîrokê de wê hebê. Her tişt wê, di dîrokê de wê bi dîyarde, fenomen, fektor û hebûna objeyî re wê hem bi serê xwe wê hebê û hem jî wê bi giştîya rewşa ku ew di nava wê de ew afirîya û bûya re wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, weke rewşeka têgînî a ku mirov wê, rewşa giştî a dîrokê a giştî de wê, di dîmenekî dîrokî de wê her tişt û ankû re wê, bi serborî û bûyînên xwe re wê bi hevdû re wê hebê. Lê ew her tiştên ku ew weke bi hevdû re wê bi ´giştî´ û bi temamî ku ew heya wê, di nava xwe de wê weke bi beş, qat, qatagorî û hwd re wê, xwediyê rewşek navaxweyî bê. Mirov, nikarê tiştê wê tenê weke ´yekê´ û ankû ´giştî´ wê bi tenê wê werênê li ser ziman. Her tişta ku ew yek, tam û giştîya wê, bi çerçoveyekê wê hebê. Yanî wê, ew weke çerçoveyekê wê hebê. Ew çerçova wê, ew hebûna wê tambûnê, yekbûnê û giştîbûnê bê.

Lê yekbûn wê, weke ku em di kurdî de jî wê ji hebûna gotinê wê fahm dikin wê, weke aliyekî giring ê bi çerçoveyî bê. Yanî wê, yekbûn wê, di wateya çêkirin û ankû hebûna ahenge navarokî û ankû xwezayî a li ser li hevdûkirin û bi hevdû re weke hevdû hanîna li ser ziman de. Ev jî wê, weke aliyekî ku mirov wê dikarê wê di vê çerçoveyê de wê, weke hilde li dest bê. Lê ew hebûna bi giştî ku ew bi gotina ´yekbûnê´ re ew dihê li ser ziman wê di navaroka wê de wê gelek beş, qat, qatagorî û hwd wê hebin. Di vê çerçoveyê de em dikarin hebûna malbatekê wê li berçav bigirin. Malbat

´yek a.´ Di yekbûnekê de ew dijî. Ji derve ku mirov li wê dinerê wê, weke ku ew ´yekeke´ ku ew di yekbûnekê de bê. Lê di nava wê de wê, weke beş, qat, qatagorî û hwd wê, dê, bav, keç, kûr, dapîr, bapîr û hwd wê bi gelek beş, qat û qatagorîyên din ên nava wê de re wê ew hebê. Di vê çerçoveyê de wê ew hemû wê, werina cem hevdû û wê ew wê yekbûnê wê bi rengê malbatî wê bi xwe re wê çê bikin. Malbat, wê weke çerçoveyekê pêşnûmayî bê. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê wê werênê li ser ziman.

Di rewşa têgîna malbatê de wê, weke ku wê ew were dîtin wê, ew ji gelek beşên nava xwe wê biafirê. Lê ew yek bê. Ew yek jî wê, weke yekeka ku ew bi yekbûnî dijî bê. Di vê çerçoveyê de mirov, wê dema ku wê hebûna malbatê wê bikê ku wê fahm bikê wê bi hemû beşên wê yên navxweyî re wê, hilde li dest û wê fahm bikê. Di vê çerçoveyê de wê, ew wê were dîtin. Dîrok jî wê, di wê de wê gelek rewş, bûyar, rabirdû, serborî û hwd wê bibin. Ew gelek rewş, bûyar, rabirdû, serborî û hwd, wê weke rastiyeka giştî a ahengî a dîrokî bê. Lê mirov, dema ku wê bi awayekî hûrgilî wê hilde li dest wê, hingî wê ew bi awayekî wê, bi gelek beş, qat, qatagorî û hwd re wê were li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku mirov wê têgîna giştî ji berçav a dîrokê wê winda bikê wê, rewşa dîrokê wê bi hemû rewş, bûyar, rabirdû, serborî û hwd re wê weke rewşek tevlîhev a ku ew bi hevdû re ne di ahengekê de jî wê were li berçav. Di vê çerçoveyê de wê dîmenekî bi rewşa herîkîna dîrokê re wê bide dîyarkirin. Di vê rewşê de mirov divê ku wê rewşa dûalîteya dîrokî a teybet û giştî wê baş fahm bikê. Rewşa teybet a dîrokê wê bi rewşên weke rewş, bûyar, rabirdû, serborî û hwd ên navaroka wê re wê werina li ser ziman. Wê bi wê re wê xwediyê rewşeka teybet a ku ew di nava xwe de wê bi awayekî pirr têgînî, dîyardeyî, fenomenîkî, qatagorîkî û hwd re wê dîtin. Ev jî wê, di çerçoveya rewşa giştî a dîrokê re ku wê di çerçoveyekê de ku ew bi hevdû re di ahengekê de ew werina li ser ziman bin. Wê her rewş wê, di asta giştî de wê xwediyê têkiliyeka wan ya bi hevdû re bê. Wê ya ku wê ew wê ahenge rewşa giştî a dîrokê ku wê çê bikê jî wê ew rewşa têkiliya wê ya ku ew bi wê ahenge wê ya bi herikînî ku ew dihê çêkirin bê. Li vir em, vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, rewşa giştî a dîrokê û rewşa teybet a dîrokê wê, di awayekî ve wê hertimî wê bi hevdû re wê bijîn. Ne bêî rewşa teybet mirov dikarê rewşa giştî a dîrokê wê biafirênê û wê werênê li ser ziman. Her wusa wê ahenge dîrokê jî wê, hem wê ji aliyê aliyê teybet û giştî ve wê hebê. Hem jî wê hem ji aliyê rewşa teybet a dîrokê ve wê li ser wê re wê hebê û hem jî wê ji aliyê rewşa giştî û ahengîya wê ve wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa dîrokê wê di rewşa xwe ya têgînî de wê xwediyê rengê hanîna

li ser ziman bê. Dîrok wê, di vê çerçoveyê de wê, weke têgîneka bi çerçoveyî a bi rewş, bûyar, rabirdû, serborî û hwd re wê hebê. Ev jî wê, bi beş, qat, qatagorî, dîyarde û hwd re wê, weke beşna zanistî ên dîrokê wê xwe bidina pêşxistin. Dîrok wê, di vê çerçoveyê de wê xwe bide hanîn li ser ziman û were li ser ziman.

Têgîna dîrokê wê, weke ku me hinekî li ser w sekinî wê, ji aliyê têgîna şûbjeyî û ya objeyî ve jî wê, di vê çerçoveyê de bi rewşa kirinî û ankû piretîkî û teorîkî mirov divê ku wê li ser wê bisekinê. Di aslê xwe de wê, di roja me de wê, weke aliyekî afrîner ku wê li ser wê re wê were nivîsandin bê. Li vir, pêşketina xiyal û sawêrîya mirov wê, weke aliyekî giring ê ku mirov wê li vir li ser wê bisekinê bê. Di roja me de wê, dîrok wê, were nivîsandin û wê piştre jî wê, bi wê re wê xate wê, were kifşkirin. Lê bi wê re jî wê, dîrok wê, were nivîsandin û wê bi wê re wê, pêşketin wê were çêkirin. Ev têgîn û hizra ku wê, weke dîrok wê were nivîsandin û wê piştre wê pêşketin wê li ser wê re wê were çêkirin wê, weke aliyekî giring ê ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman.

Çerçoveyên têgînî ên rojane ku ew dihêna pêşxistin wê weke beşa têgîna dîrokê a roja me ku ew dihên pêşxistin bin. Di awayekî klasîk de wê, di demên berê de wê, weke ya ku ew hatîya jîyankirin wê, bi hanîna wê ya li ser ziman re wê, dîrok wê were hanîn li ser ziman. Lê î ro wê, bi vê rengê di çerçoveya afrînerîya wê ya bi têgînî de wê, nivîsandinî wê derkeve li pêş. Di vê çerçoveyê de em, divê ku nivîsandinê wê weke aliyekî giring wê, hildina li dest. Di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî giring ê têgînî û dîyardeyî mirov divê ku wê, aliyê dîrokê ê têgînî yê kirinî wê werênê li ser ziman. Li ser rewşa jîyankirinê re wê, têgînê wê bide me. Aliyê dîrokê ê teorîkî ku ew pêşdikeve wê, weke aliyekî giring ê ku wê di çerçoveya têkilîya kirinê û ankû piretîkê û teorîyê de wê, bi pêxistinê re wê were dîtin û li ser ziman. Di roja me de gotin û ankû têgînên weke ´ku mirov wê pêşketinê bide çêkirin´ û hwd wê, weke têgîneka ku wê bi nivîsandina dîrokê re ew dihê li ser ziman bê. Ev jî wê, bi wê re wê, weke aliyekî nivîsandinî ê dîrokê bê. Bi teorîkî ku mirov wê dihizirê wê, aliyê têgînî yê razber wê derkeve li pêş. Têgîna razberîyê wê bi awayê xwe yê teorîkî re wê weke têgîneka hizirkî ku mirov wê di çerçoveyekê de wê bihizirê û wê werênê li holê bê. Ev jî wê, weke aliyekî afirandinê ê ku wê, bi wê re wê were pêşxistin bê. Têgîna teorîkî a razber a ku em li vir wê dihênina li ser ziman em di wateya ku ew têgîn û ankû aqil ew ne ji rewşek jîyankirî û hwd ku ew hatîya girtin wê, di wê wateyê de dihênina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de ev rewşa têgîna razberî a teorîkî wê bi demê re wê, weke

aliyekî hizirkî wê bi demê re wê pêşbikevê. Wê, afirandinê wê bi xwe re wê pêşbixê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê, aqilekî ku ew li ser levhanîna xosletan re ku ew hatîya pêşxistin bê. Her aqil bi xosletî wê weke ji ezmûn û fêrekê bê. Ber vê yekê wê, di wê de wê, xwediyê dîmen û rewşeka şenber a ku ew bi wê re ew were dîtin bê. Di vê çerçoveyê de wê bi teorîkî wê li ser wê dîmen û şenberîyê re wê, ahengek bi dîtinî û wêneyî wê li berçav wê di mejî de wê ew were pêşxistin. Li ser wê re wê ew weke aliyekî giring wê were li holê. Ev wê weke rewşeka ku ew hatî li ser ziman lê ku ew ne hatîya jîyankirin wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê li ser wê re bahse kirina wê ya li kirinê(piretîkê) wê, were kirin. Ev jî wê, weke bi gotinaka din wê, were li ser ziman ku ew teorîya ku ew hatî pêşxistin ku ew were xistin li kirinê û ankû were piretîze kirin.

Di vê rewşê û çerçoveyê de wê têkilîya rewşa kirinê û teorîya razber wê were û pêşbikeve. Wê bi hevdû pêşxistinê re wê xwe wê bide dîyarkirin û pêşxistin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, têkilîya nava kirinê û têgîna razber de wê, weke aliyekî hevdû afrîner bê. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa teorîkî ku mirov wê li gorî wê rewşek kirinî di jîyanê de wê pêşbixê û ankû pêkwerênê û hwd wê, weke aliyekî ku wê bi têgîna xistina kirinê a wê têgîna razber bê.

Di nava rewşa aqilê razber û kirinê de wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî giring wê xwe wê bide dîyarkirin. Lê em vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê ti rewş wê, dema ku ew hatina jîyankirin wê newina dûbarekirin. Yanî wê, di jîyanê de wê dûbarekirin wê nebê. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê vê têgîna ´nebûna dûbarekirinê´ li rewşa têgîna kirina jîyanê a wê teorîya razber wê, bi wê fahm bikê? Em yan jî wê, bi vê rengê wê werênina li ser ziman ku em, dikarin wê, rewşa ku em dibêjin ku em wê bikirinî di jîyanê de wê li gorî wê teorîya razber wê pêşdixin wê bi temamî wê weke wê bê? Ev jî wê, weke aliyekî din ê ku mirov wê dikarê wê fahm bikê bê.

Di rewşa fahmkirina wê de wê, di vê çerçoveyê de ew têgîna teorîkî a razber ku ew weke teorîyeka xiyalî ku ew dimejî de ew hatîya pêşxistin wê, bi kirina li jîyanê de ku ew kirinîya wê, were pêxistin. Wê dema ku ew hatkirin wê, hingî wê were gotin ku ´ew teorî, hatîya kirin li jîyanê´ de. Lê bi wê re ew kirinîya ku ew di jîyanê de ew pêş dikevê wê bi xwe re wê rewşên hûrgilî û hwd wê yên cûda jî wê bi xwe re wê pêşbixê. Şibandina li hevdû wê rewşa teorîkî a ku ew heya û ya wê kirinîya ku ew pêş dikevê wê, weke şibandinê wê li holê wê bimênê. Lê ew weke hevdû ya û ankû

ne weke hevdû ya jî wê, weke mijareka din wê li holê wê bimênê ku mirov wê fahmbikê bê.

Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna teorîkî wê, weke têgîneka xiyalî ku ew hatîya pêşxistin bê. Teorî wê, weke rastîya hizirkirinê a ku mirov wê di mejiyê xwe de wê di afirênê bê. Her wusa wê ne ji rewşek jîyanî bê. Lê wê di temenê pêşxistina wê de wê, weke ezmûn û fêr wê, gelek qatkên rewş û kirinînîyên jîyanî ên ku ew berê bûna wê û darêjkên wan wê di wê de wê di wê ahenge wê ya têgîna razber a teorîkî de wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, sazûmana teorîkî ku ew hatîya pêşxistin wê, li ser xosletan re bê. Wê ne wê hiştin ku ew di nava wan xosletan de nakokî hebê. Wê li ahengîyê were lêgerîn û wê were pêşxistin. Bi wê re jî wê li rastîtîyê wê di jîyanê de wê, were lêgerîn.  Di vê çerçoveyê de wê têgîna teorîkî wê weke rewşeka sazûmanî a bi aqilî wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê, di wê de wê rewşên ku ew hatina jîyankirin, hizirkirin, tefkîrkirin, dîtin û hwd wê, bi hevdû re wê di wê de wê hebin. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa têgîna razberîyê û wateya wê, wê ji rewşa nebûna di jîyankirinê de wê weke rewşek weke ya wê sazûmana a bi hanîna wan ya li cem hevdû bê. Di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî giring bê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê, ji aliyê jîyane ve bê ku ew ne şenber bê. Neşenberîya wê, wê nebûnîya wê ya ji aliyê jîyanî ve bê. Yanî wê bi gotineka din wê, bi nebûna wê ya wê ya weke wê rewşek di jîyanê de bê. Di vê çerçoveyê de wê weke aliyekî wê ew hebê. Lê wê ew wê di xwe de wê wê bi rewşa heyîna xwe re wê, ew *teorîya razber* wê, di rewşa xwe de wê weke ku ew xwediyê şenberîyekê bê. Rewşa şenberîya razberî a gotinî, wateya wê ya ku ew li wê hatîya kirin û têkilîya ku ew di çerçoveya wê ahenge sazûmanî a teorîkî de ku ew bi hevdû re ew dihên danîn de wê, ew hebê. Di vê rewşê û çerçoveyê de wê rewşa têgîna razber wê, di xwe de wê, ji aliyekî ve wê, li ser rewş û sedemên ku me li jor hanîna li ser ziman re wê di xwe de wê hem razber bê weke ku ew ji aliyê jîyanê ve nexwediyê rewşeka weke wê ku ew bûya bê û hem jî wê şenber bê ku ew ji ber ku ew ji fêr û ezûmên jîyanî ên ku ew di kirinîyê re ew bûyîna ku ew bi wan û têgîna wan afirîya ya bê. Darêjkên rewşî ên li ser rewşên kirinîyên jîyanî re ku ew dibin wê, di vê çerçoveyê de wê, temenê afrînerîya teorîkî a ku ew dihên pêşxistin bin. Rewşên kirinî wê weke rewşna ku ew bi tevger, kirin û xûyan re ku ew dihên pêşxistin bin. Wê weke rewşna fîzîkî ku ew bêî hacm, cism û hwd bê. Lê ew hena. Minaq weke bi derxistina dengekî weke bi gotinî û hwd.

Ji aliyê têgîna teorîkî a dîrokê ve fahmkirina wê, wê bi aliyê têgîna şûbjeyî wê temenê afrînerîyeka di jîyanê de jî bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, ew di roja me de wê were pêşxistin. Li ser têgînên pêşxistina ´netewan´ re wê, weke ku rêveberî ´di rewşek dîzaynkarê civakê´ de xwe weke bi erk û berpirsîyar dikin wê, di vê çerçoveyê de wê, temenekî wê hebê. Ji vê aliyê ve wê, bi teybetî wê, ji aliyê têgîna dîrokê a teorîkî ve wê dîrokîya roja me wê were kirin. Lê wê bi têgîna dîrokê a kirinî(piretîkî) wê were xwandin.

Têgînên weke bi teorîkî ên bi dîrokê re ku mirov wan li wan dihizirê wê, her wusa wê bi wan re wê, ev jî wê were dîtin ku wê çerçoveya wan wê bi aqil re wê, bibê. Li vir, rewşa têgîna dîrokê a afrîner ku ew bahse wê dihê kirin wê, her wusa wê li ser hizirkirina bi teorîkî û ankû bi wê re wê, rewşa kirinîya teorîkî a li jîyanê ku ew pêş dikeve re wê, xwe bide dîyarkirin. Di rewşa têkilîya nava kirin û hişmendîyê û ankû teorîyê de wê, di vê çerçoveyê de wê, şîroveya ku mirov wê bi têgîn û xistina kirinê re wê, ew wê were pêşxistin jî wê, di vê çerçoveyê de wê, ji aliyê têgîna dîrokî a afrîner ve jî wê wateyeka wê hebê. Di roja me de wê, fahmkirina dîrokê wê, tenê ji xwandinekê wê, di vê çerçoveyê de wê, derbas bibê. Wê ji wê bi bûhûrê. Li vir wê, dema ku mirov wê dîrokê dixwênê wê, weke ku mirov jîyanê bixwênê bê. Di vê çerçoveyê de wê di çerçoveya wê xwandinê de wê ya giring û rast wê bi nêzîkatîyeka rast û giştî re wê bê. Her wusa di vê çerçoveyê de wê reşa têgînîya kirinî wê xwe bi awayekî wê bide dîyarkirin.

Li vir, mirov dema ku wê jîyanê dixwênê wê, ew xwandina me wê, weke hişmendiyekê bê. Wê li ser rewşên bûyîna, rûdayîna û pêşketina û hwd re wê bibê. Di vê çerçoveyê de mirov dema ku wê, di jîyane xwe de asayî de wê bibêjê ku ´min dûhû ev kiribû´ wê, weke kirineka ku ew bûyî wê ew wê werê hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê ew kirin wê, weke kirineka ku ew bûya. Ew kirin çawa, di çi demê û rewşê de bûya û hwd wê, ev hemû wê bi wê re wê hebin. Di wê demê de wê, hemû rewşên wê, bi wê re wê di çerçoveya wê de wê hebin. Li vir wê, di vê rewşê de mirov dikarê vê jî bibêjê ku ´min hizirkiribû ku minê ew dûhû kiriba, lê min nekir´ wê, ev bibê weke kirineka ku ew hatîya hizirkirin û ew ne hatîya kirin. Li vir wê, dema ku ez wê dihizirim wê, weke ku ew kirina ku min hizirkiriya ku ez bikim wê, hişmendîya wê ya ku min bi wê re ew hizirkirîya wê di mejiyê min de wê hebê. Wê ew weke rewşek bûyî wê hebê. Ber ku min ew hizirkirîya û ew hişmendî bi wê re bi min re çêbûya êdî ez wê tefkirî dikim weke kirineka ku ewê hatiba kirin lê ew ne hatîya kirin. Di nava kirina ku ew hatî kirin û ya ku ew bi vê rengê weke ku ew

hatîya hizirkirin û ew ne hatîya kirin de wê, çi farq wê hebê. Li vir wê farqe bi ketina kirinê re wê hebê. Lê bi wê re mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê, ev rewş wê, weke aliyekî wê yê ku ew heya wê xwe bide dîyarkirin. Yanî ji destpêkê ve wê, herdû rewş hatibibina hizirkirin. Wê hetibibina bi sazûman kirin. Wê hatibibina hizirkirin ku ew bên kirin. Heta bê xalê û ankû nûqteyê wê, her tişt wê di dewama hevdû de wê di ahegenê de wê bibê û wê biqawimê. Wê pêkwerê. Li ser wê pêkhatinê re wê, weke rewşek ku ew bûyî û rûdayî wê hebê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Li vir wê, dema ku ew ez li wê kirinê dihizirim ku ez wê bikim wê weke kirineka ku ew di wê de hişmendî bi hişmendiyê re wê fektorên weke vîn, xwestek, hiş, pêşnûma û ankû çerçova û hwd wê hemû jî wê ew hebin. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku wê, werênê li ser ziman ku wê di vê çerçoveyê de wê, ew kirin wê heta ku ew were wê asta ku ew bê kirin  wê, weke pêvajoyên xwe yên afirandinê ên li ser hiş re wê derbas bikê û wê bi wê re wê pêşbikeve. Her wusa wê bi demê re wê ev jî wê weke aliyekî ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek bûyî û ankû weke rewşna ku ew bûyîna wan werênina li ser ziman bin. Piştî ku ew ket kirinê de wê, ew kirina wê di dewama wê de wê biafirê. Kirin wê, di temenê de wê de wê bihiş wê ji wê tefkirkirinê wê vîn, xwestek û hişmendî û hwd wê bi hevdû re wê hebin.Ew jî wê weke rewşna hizirkirî wê hebin.

Rewşên ku ew hatina hizirkirin wê di temenê xwe de wê, ne ji jîyanê qûtbin. Wê ew pêvajoyên derbasbûyî wê bi darêjk, çerçova û hwd re wê, di temenê de wê bi hişmendî, zanînî û aqilî wê hebin. Li ser wan re wê pêşbikevin. Ev jî wê, weke rewşna ku wê hiş weke zanînê wê bi aqilî wê pêşbixin bin. Wê bi wê re wê, ew werê pêşxistin.

Kirin wê, weke encama vîn û xwestekî wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wê rewşa ku ew bi wê re wê, karibê wê werênê li ser ziman bê. Di dema ku ev rewş bûn de wê, weke mejûyî bin. Yanî wê dîrok bin. Dîrok aqil wê, di vê çerçoveyê de wê, di pêvajoyên xwe yên xwe afirandinê de wê, di çerçoveya pêşketina jîyanê de wê, pêşketinê di jîyanê de û bi xwe re wê bide çêkirin. Em dema ku rewşên dîrokî wan tenê weke rewşna bi serê xwe bitenê wan werênina li ser ziman wê, tenê weke dîyardeyna fenomenîkî wê ew werina li ser ziman. Wê weke darêjkna têgînî wê werina li ser ziman. Lê her tişt wê, çendî ku wê bi serê xwe weke hişekî û ankû aqilekî bê wê, bi heman rengî wê di nava şert û mercên ku ew di wê de bûya de jî wê, weke çerçoveyeka bi hişmendî wê xwe bide dîyarkirin. Wê bi wê re wê, ew wê were dîtin û li ser ziman.

Pêvajoyên pêşketina bi kirinê re wê, weke aliyna ku mirov wan dikarê wê hilde li dest bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê, rewşa ku ew bûyî wê weke hişmendîyekê wê di destpêkê de wê weke aqilekî kirinî wê xwe bide dîyarkirin. Lê dema ku mirov ew li ser xosletan re ew hanîn li cem hevdû û ji wê darêjk û ankû çerçoveyên têgînî ên nû derxistin wê, ew weke têgîna teorîkî a razber jî wê xwe bide dîyarkirin. Têgîna teorîkî wê, di vê çerçoveyê de wê, weke aliyekî giring ku mirov wê bi çerçoveya aqil re wê hilde li dest bê. Di vê çerçoveyê de aqilê teorîkî ê dîrokî û aqilê kirinî ê dîrokî ku mirov wê dikê ku wê fahmbikê wê, di vê çerçoveyê de wê di çerçoveya têgîna felsefîkî a dîrokî de wê aqilekî zanînî ê dîrokê wê xwe bide dîyarkirin. Em li vir wê jî wê werênina li ser ziman ku wê, dema ku mirov gihişt zanînê di derbarê dîrokê de wê, ew weke têgîneka di derbarê dîrokê de wê hebê. Ew zanîn wê, bi wê re wê, çawa mirov wê hilde li dest, çawa fahm bikê û têkilî û rewşên ku ew hena wan çawa fahmbikê û hwd wê, bi wê re wê were dîtin. Di vê çerçoveyê de wê zanîna dîrokê wê dîrok wê, weke rewşek zindîyî wê werênê li holê û wê li berçavên me wê, bide dîyarkirin. Bêgûman ku mirov dîrokê wê hilde li dest wê, gelek alî û rewşên ku ew bi hevdû re ew werina hildan li dest wê hebin. Ew jî wê, rastîya têgîna dîrokê re wê, çerçoveya wê, bi xwe re wê bidina dîyarkirin û wê werênina li ser ziman.

Di rewşa hildana li dest a têgîna dîrokê de wê, rewşên ku ew bûyîna û hena wê çawa wê ew werina hildan li dest wê, ew were fahmkirin. Dîrok wê, weke têgîneka ku em wê bi jîyanê û ahenge herîkîna jîyanê re wê hildina li dest bê. Heta ku ew aheng û herîkîn hebê û ankû bigiştî ku ew jîyan hebê jî wê, ew dîrok wê pêşbikeve û wê were li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê di nava aqil û hebûnê de wê, rewşa dîrokê wê weke aqilê jîyanî wê bi dûalîteya xwe ya bi jîyanê re wê were li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê dema ku mirov li jîyanê nerî wê, ew bi hebûna wê û kirin û rewşên di wê de re wê, werê dîtin. Bi wê re mirov wê, salix dikê û wê werênê li ser ziman. Her tişt wê, di jîyanê de wê, di bin dîmenê ji holê windabûn û çûyînê de wê, hertimî wê darêjkê wê bigûharênê. Wê bi wê re wê ji rewşê rewş wê biafirê. Ev jî wê, di rewşa nivîsandina dîrokê de wê, weke aqilê wê yê jîyanî ê wê bûyînê bê. Mirov wê, bi wê re wê, çi bûbê wê, bi wê re wê fahm bikê. Bi hebûna jîyanê û zindîtîya wê re wê, ew aqilê me jî wê, di rewşek ku ew bi wê re di heman rengê de wê xwe bide dîyarkirin bê. Wê, hertimî wê ev bi pêşketinê re wê bibê. Ya ku mirov wê bi têgînî weke hişmendîyekê wê bi têgîna ´başîyê´ û hwd re wê dihênê li ser ziman wê, rewşeka têgînî a darazî û nirxî bê. Wê ew dîtbar bê. Di vê

çerçoveyê de wê ew wê, weke aliyekî têgînî ê bi hişmendî wê hebê. Mirov wê, ji jîyanê wê bi hişmendî wê hilde. Wê bi wê re jî wê, jîyanê wê bihiş bikê. Dîrok wê, di vê çerçoveyê de wê, bi hemû têgîn, zanîn, felsefe û zanistên wê yên xwezayî û nexwezayî re wê, di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rewşek afrîner a bi jîyanê re ya li ser aqil bê. Wê hemû afrînerîya bi hişmendî wê, di ahenge têgihiştina jîyanê de wê, xwe bide dîyarkirin. Bi wê re wê were li ser ziman.Ew hatina li ser ziman jî wê, dîrok bê.

**Abdusamet Yigit, Cizîra bota, kurdistan,**

,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,